



NÜDEM

No 39-40 2001



BI
XATIRÊ
WE!

Kovara Hunerî, Edebiî û Çandî



NÜDEM

Kovara huneri, edebî û çandî



Xwedî û berpirsiyare giştî

Chief Editor

Firat Ceweri



Hejmar: 39-40 sal 10

Payiz-zivistan: 2001



Şerdîn abonetiyê (salek)
Swed: 240 Sek

Skandinaviya: 280 Sek

Evrûpa: 100 DM

Amerika, Australia,

Kanada: 50 \$

Institution: 290 Sek



Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964



Wêneyê bergê: F. Ceweri

Foto: Anif Zêrevan



Çap:

Nina Tryckeri



Pergala bergê û rûpelan:

Nûdem



Adres:

NÜDEM, Box: 177
177 23 Järfälla-Sweden



E-mail: nudem@telia.com
firat.ceweri@chello.se



Tel û Fax: 8-580 131 62
8- 583 564 68

Malpera Nûdemê:
www.welcome.to/nudem

- 4 Çiroka min û Nûdemê ◆ FIRAT CEWERI
 29 Dehsallya Nûdemê ◆ ROJEN BARNAS
 31 NÜDEM malbatek e ◆ ENWER KARAHAN
 35 NÜDEM ji bo nişkaran bû pépelük û dergehek
 ◆ BERKEN BEREH
 38 Kovara NÜDEM bi awayeki xurt liemberi pêla asimilasyonê
 radiweste ◆ WEZIRÊ EŞO
 42 Ji bo kovara NÜDEM ◆ XELİL DUHOKİ
 43 Dehsalya NÜDEM piroz be ◆ ŞAHİNÊ BEKİRÊ SOREKLİ
 46 NÜDEM büye ekolek ◆ EVDILE KOÇER
 49 Ez bi xêra NÜDEM hîmî zimanê xwe bûm ◆ ABİDİN
 51 NÜDEM: kûlîkeke nûbîskî li ser riya Diyarbekirê
 ◆ İBRAHİM SEYDÎ AYDOĞAN
 55 Bi ditina min NÜDEM ◆ SIDQÎ HİROKİ
 57 Di dîroka edebiyata kurdi de NÜDEM xwedîyê ciheki bilind e
 ◆ CANKURD
 58 Kovara NÜDEM ya li dû şopa HAWARê li dû xewma Mirê nemir
 C. Bedir-Xan e ◆ S. UNUS
 61 Berdewamî, naverok û xeta NÜDEM di edebiyata kurdi de
 cihekî giirîng digire ◆ SIRACETTİN KIRIKI
 64 Mizginîya xérê: NÜDEM ◆ SALIHÊ KEVIRBİRİ
 66 Bi NÜDEM nûdermek ◆ ZEYNELABİDİN ZINAR
 69 Derîyekî zimanê kurdi: NÜDEM ◆ YAQOB TILERMENİ
 71 10 salia kovara NÜDEM piroz be ◆ NECİB BALAYİ
 73 Kelehen parastina zimanen ◆ ROŞAN LEZGİN
 77 NÜDEM di xizmeta ziman û çanda kurdi de ye
 ◆ YAKUB KARADEMİR
 78 Ziman û wêje nasnâma netewan e ◆ RUKİYE OZMEN
 80 NÜDEM herdem hat seredana me ◆ ŞERMİN BOZARSLAN
 82 NÜDEM zarokek deh salı ◆ MERVANË KELEŞ
 86 NÜDEM ji her aliyî ve kovareke nûjen e ◆ ZANA FARQİNİ
 88 Di dehsalya NÜDEM de em gurzek nêrgiz
 ji Firat Ceweri re pêşkê bikin ◆ KONÊ REŞ
 90 Kovara NÜDEMî sibeheke buharê ye
 ◆ EBDULBAQÎ HUSEYNİ
 92 NÜDEM bi dema nû re dimeşê ◆ ASLİKA QADIR
 94 NÜDEM wek mîqnatîsekî evîndarên ziman, edebiyat û hunera
 kurdi ber bi xwe ve kîşand ◆ SERHAD BAPİR
 97 NÜDEM siwareke serbixwe ye, dide pey siwarên revonek û
 kelehen parastinê ji zimanê kurdi re ava dike
 ◆ BEWAR İBRAHİM
 100 Mirkut ◆ ROJEN BARNAS
 101 Her ji deh rojan zimanek dimire ◆ SILÊMAN DEMİR
 106 Rojin ◆ ŞAHİNÊ BEKİRÊ SOREKLİ
 109 Îstiqbal ci ye, pêşeroy an paşeroj e? ◆ ROJEN BARNAS
 112 Li Nisêneşe Qeptan û li Cizîre heywan e ◆ MUSTAFA CİZİRİ
 114 Li ser çapa berhêmen edebî ◆ N. ZAXURANI
 119 Bavo televizyonê neşikîne, wê bide min ◆ SERKAN BİRÜSK
 125 Li ser nişkarîye ◆ FIRAT CEWERİ
 129 Şiroveya diwana Melayê Cizîri ◆ MELE EHMEDÊ ZİVINGİ
 Werger: EMİN NAROZ
 139 Mirina Baldassare Silvande... ◆ MARCEL PROUST
 Werger: HUSEIN MUHAMMED
 156 Edebiyata kurdi ya klasik ◆ İSMET KILIÇASLAN
 167 Çend nimûne ji nameyan ◆
 179 Çend nimûne ji çapemeniyê ◆
 194 Xebata deh salan û cil hejmarañ Nûdemê ◆

Çîroka min û Nûdemê



FIRAT CEWERÎ

dest bi nivîsandina kurdî kiriye. Gava ez dibêjîm min bi kitebeke Cegerxwîn dest bi nivîsandinê kiriye, bila welê neyê fêhmkirin ku bi sedan kitêbên kurdî li ber des-tê min hebûn û min ji nav wan bi taybetî ya Cegerxwîn hilbijartiye û di bin tesîra wê de mame. Rast e, li gora wê demê ez di bin tesîra şîrên Cegerxwîn de mam, lê wê demê, yanî salên 1977-78an min tu kitêbên bi kurdî nedîribûn û du rêzên bi kurdî nexwendibûn. Erê em li malê bi kurdî dipeyivîn, me bi heval û hogirên xwe te bi kurdî dida û distand, lê min nizanîbû ku mirov dikare bi kurdî binivîsîne.

Ew kitêba Cegerxwîn, ya ku ji binxetê gihîştibû min û bergê wê bi kaxzeke roj-

Dibe ku neyê bîra nivşê niha, lê salen hefteyî salen bi têkoşînê ve dagirtî bûn. Li seranseri welêt xort li ser lingan bûn û li dû guhertin û nûyîtiyan bûn. Min jî cihê xwe di nav xortan de girtibû û ez yek ji wa bûm. Em ji rewşa xwe ne razî bûn, me dixwest em qedera xwe biguherin û buhayê guhertina qederê ci diba bila biba em amade bûn ku bidin. Ji aliye kî ve gava me dixwest em rewşa xwe biguherin û nasnava xwe bi dest bixin, ji aliye din ve jî me gora nasnav û zimanê xwe dikola, me bendên neyartiyê di navbera xwe de ava dikirin û me di bin çavan re li hev dinerî. Wê helwest û nêrînê kir ku ez zû li xwe hayê bibim, nerazîbûna xwe ya jî rewşê bînim zimên û li nasnava xwe bigerim.

Min di gelek nivîs û hevpeyvînên xwe de gotiye ku min bi kitêbeke Cegerxwîn

nameyê ji nû ve hatibû pêçan, bi min da nîşandan ku bi kurdî tê nivîsandin. Gava min ew şîr dixwendin û jê fêhm dikir, dilşahiyevê di hundurê min de pêl dida û hêzeke veşartî ez dajotim ser xwendin û nivîsandina bi wî zarî. Edî siyaseta partîtiyê zêde bala min nedikîşand, ez bi tenê li dû bidestxistina wî zimanî digeriyam. Ez digeriyam û min dixwest ez ji xwe te heval û hogiran jî çebikim. Lî di hin deman de parastin û mijûlbûna bi hin tiştan re ne hêsan e. Mirov li derve dimîne, bi tenê dimîne û dikare bibe mijara pêkenîn û qerf û henekan. Hevalên min bi devkî piştgiriya xwe ji bo min tanîn zimên û hinan ji wan jî ez teşwîq dikirim, pesnê min didan û bawer dikirin ku ez ê bikaribim tiştekî bi ser bixim. Loma, yê min jî qelem û kaxez ji min xalî nedibûn, ez bi ku de biçûma, ez li ku bûma, min dînîvîsand. Bêî ku ez alfabeşa kurdî baş nas bikim, min zor dabû nivîsandinê û min meraq dikir bê çîma kurd bi zimanê xwe nanivîsinin û kovar û rojnameyên xwe bi zimanê xwe dernaxin. Sal çûn û hatin û di salêن heyştê de sekînî. Şer û pevçûnên grûbêñ kurdan, xirecir û tevliheviya nedîyar, pêjna lingêñ leşkeran kir ku ez li derketina derveyî welêt bifikirim. Mayîna li welêt roj bi roj ez dixwarim, hevalên min yên xortaniyê roj bi roj li kuçe û kolanan ji aliyê heval û bajariyên xwe de dihatin kuştin û bajîr bûbû kabûsek û destê xwe dixist qirika min.

Erê, min dixwest ez derkevîm, ez ji welêt herim, lî dîsa zû lê vegerim. Hezkirêñ min li welêt bûn, malbata min li welêt bû, cihêñ bîranîn û evînêñ min li welêt bûn. Destê min jê nedibû, lê ew li min bûbû agir û ketibû pêxila min. Rojekê min got bes e, min bi hevalekî xwe yê bi navê Elî re amadekariya xwe kir û di rojekê guylanê ya xweş de em daketin binxetê. Pişti mayîna çendakî li Sûriyê û Almanyayê, me xwe di ser Norvecê re gîhand Swêdê. Me xwe gîhand welatê ku ez ji bo nivîsandinê hatibûmê. Min ê li Swêdê binivîsanda, kurdiya xwe bi pêş bixista û dû re gava pişti çend salan ez vege riyama welêt, ez ê bi serbilindî vege riyama, min ê li welêt alîkariya hevalên xwe bikira, alfabe û rêzimana kurdî nîşanî wan bida û bi wê riyê me ê dest bi tevgereke kulturi bikira. Fikir ew bû, armanc ew bû, lê nebû. Tiştê bû ew bû ku sala ez hatim Swêdê, yanî di sala 1980ê de min kitêbeke xwe ya şîiran bi kurdî weşand. Hingî yên ku bi kurdî dînîvîsandin gelekî kêm bûn, bi awa-yekî gişî, jiyan û tevgereke edebî tunebû. Li gelek cihan mijûlbûna bi kurdî, nivîsandina bi kurdî ji aliyê kurdan ve biçûk dihat dîtin, dihat gotin ku ma em ê bi çîrok û şîiran xelas bibin. Lî min li her kesî guhdañ dikir û bi a xwe dikir. Min carinan dev li dilê xwe dikir û tiştê tê de dida der. Hîn wilo di 12ê ilona 1980ê de eskeran dest danîn ser hukum û ewrekî reş bi ser welêt ve girt. Bi hatina wî ewrê reş re ji aliyekî egoya min zora wijdanê min dibir û ez li derketina xwe ya ji welêt këfx-weş dibûm, ji aliyê din ve jî gava ez li rewşa welêt difikirîm û min zilma wê demê

bi bîr tanî, agir bi dilê min diket, lê min dîsa dixwest agirê dilê xwe bi edebiyatê ve-mirînim.

Dibe ku min di derin din de jî gotibe ku hatina cûntayê ji bo geşkirina zimanê kurdî baş bûye. Ji encama hatina cûntayê bi hezaran xwendayên kurd derketin deriveyî welêt. Ew li derveyî welêt bêtir bi nasnav û girîngiya zimanê xwe hesyan û li Ewrûpayê dest bi derxistin û weşandina weşanen kirin. Li Ewrûpayê ci weşana ku bi kurdî derket ez nêzîkî wê bûm, min xwe ji weşanen bi zimanê kurdî dûr negirt û li gora hêza xwe ji wan re bûm piştgir û alîkar. Lê belê, mîna ku di cihekî de valahiyek hebû, ew weşana ku ez lê digeriyam, ew weşana ku min dida ber kovarêñ xelkê yên edebî min nedidît. Carinan jê mirov ne di nav tiştinan de ye, wan naecibîne û rexnan lê digire, ev mafe mirov e. Gava mirov tiştekî necibîne, ji mirov bê mirov ê tiştekî jê baştir bike. Digel ku haya min ji hemû zehmetî, berberî û nelîhevki-rinên kurdan hebû jî, min dixwest ez kovarekê derxim, ew kovar edebî be, edebiyatvanan bigihîne û bibe neynika edebiyata kurdî, bibe berdewamiya Hawar û Ronahiyan. Béguman, derxistina kovareke weha, di dema ku kurd xwedî partî û rîk-xistin bûn, di demeke ku ramana kolektivîzmê îndîvîd û îndîvîdualîzm helandibû û nehiştibû de, ne hêsan bû. Derxistina kovaran, derxistina rojnameyan, avakirina weşanxaneyan ne karê şexsan bûn, ew karê partiyên siyasi bûn û diviyabû kolektîv bûna. Li gora wan, ya çûna serî hey nedîcû serî, lê belê ew ê bibûna hedefa rexneyan û cihê şik û supheyan.

Sal 1983 ye. Min sê kitêbêñ amator, bi dehan çîrok nivîsandine û ew di kovar û rojnameyan de weşandine. Ji aliye din ve, ez hogîri kovara Hawarê bûme û di nav rûpelên wê de derketime rîwîtiyeke dîrokî. Ji berdêla ku ez bi mîjîyê xwe yê ter serê xwe bi firansî û îngîlîzî re biwestînim ez ketime cîhana kurdîyê û bûme şabaşvanê her rîzeke Hawarê. Tiştê ku ez lê digeriyam Hawar bû, fikra ku min ji bo me maqûl didît fikra xwedîyê Hawarê bû, riya ku em ê pê bibûna xwedîyê nasnav û şexsiyeta xwe naverok û çarçoveya Hawarê bû. Ramana ku me ê xwe bispartayê ramana dûrbîn ya Celader Alî Bedir-Xan bû. Min hingî ji xwe pîrsî bû gelo çîma me ev kovara ha li welêt nedît, çîma em li derveyî welêt li vê kovarê xwedî dernakevin, an jî kovarêñ bi vê babetê dernaxin.

Min hingî jiyan Celader û kesayetiyêñ ku di Hawarê de nivîsandibûn pir meraq kir û min xwest ez tavilê xwe bigihînim kesen ku hê sax mane. Ez bi riya nameyan bi Dr. Nûredîn Zaza re ketim têkiliyê, ez çûm Sûriyê seredana Rewşen Bedir-Xan û Osman Sebrî û min li Swêdê xwe gihand Cegerxwîn. Min li wan guhdarî kir, min guh da şîretên wan û ez pir li ber ked û taba Celader Bedir-Xan diketim, min hêşirên ji xwînê li ser têkoşîn û keftelefta wî ya avakirina zimanekî rijandin. Min

hêşir rijandin, lê min xwest ez bidim ser şopa wî, cihê ku ew lê maye dewam bikim û ramana wî ya dûrbîn ji xwe re bikim rêber. Ji bo bicihanîna projeyeke welê mesrefek lazim bû. Mesrefekî mezin lazim bû. Di demeke ku min hem dixwend hem kat dikir û alîkariya malbata xwe ya madî dikir, destpêkirina projeyeke welê ne mimkin bû û pit zehmet bû. Gava min ji hin kesan re behsa derxistina kovareke kurdî ya edebî dikir, an ew di bin simbêlan re dikenîyan an jî ji bo ku dilê min ne-hêlin, piştgiriya gotinên min dikirin. Piştgiriya gotinên min dikirin lê bi xwe tu entrese nîşan nedidan. Demekê min xwe bi xwe got ku heta projeya min nestewe û ez bingehê her tişti navêjim, ez li ba kesî û ji kesî re behs nakim.

Hingî mala min li Stockholmê, li taxeke bi navê Upplands Väsby bû. Min xwendina xwe ya pedagojiya zarokan nuh qedandibû, hebekî jî bi zarokan re xebitibûm. Lê piştî hemû mesrefan tişte ku di destê min de dima, tiştekî bêqîmet bû û bi wî pereyî jî mirov nikaribû tu kovar derxista. Rojekê ez li Uppsalayê li mala dostê xwe Sulhedîn, (Sulhedînê Bêrtî) bûm mîvan. Wî jî ji rewşa xwe gazin kir û me fikra xwe kir yek ku em bi hev re restorankekê vekin. Sulhedîn nuh ehliyet stendibû û ajotina otomobilê hê pê şêrîn bû. Em ketin riyan û li restorantan geriyan. Em herdu jî di wî warî de bêtêcrube bûn, lê me dîsa jî, bi wî awayê xwe yê amator, li herêma Värmlandê, li derveyî bajarê Karlstadê nîvrestorat û nîvmarketek dît. Me û xwediyê wê tavilê li hev kir, me vîlaya wî ya li hemberî dikanê jî kirê kir û me bar kir Karlstadê. Lê bala min qet ne li ser kar bû, min her dîniyîsand û Sulhedîn jî kaxezêni li dû min didan hev. Paşê ez têgîhîstim ku ez ê nikaribim karekî welê bikim û min bi dostanî cihê kar dewri Sulhedîn kir.

Min hingî li wê herêmê dest bi karê tercumanî û mamosetiya zimanê kurdî kir. Lê gava bi tesadufî pizzaxaneyek bi dest min ket, min negot, na, min kirî û hemû wextê xwe da pizzaxaneyê. Pizzaxana min baş çû û piştî xebitandina çend salan min perayekî baş jê bi dest xist. Min di wê navê de kitêbeke çirokan ya bi navê *Girî* dabû çapê, lê kar pir dema min digirt û wextê min ji edebiyatê re bi sînor dikir. Ez bi nexweşîya peran neketibûm, lê peran gelek derî li ber min vedikirin û jiyan bi min hêsan dikir. Ez biçâma kijan welatî ez karîbûm bi hêsanî biçûmayê, min alîkariya kê bikira min dikir û min ji xwe re otomobileke BMW ya nû kiribû. Temenê min hê nebûbû sih, pereyên min bi têra min çêbûbûn, an min ê bi wan pereyan projeya armanca xwe ya jiyanê, yanî derxistina kovareke edebî bi cih bianiya, an jî min ê bida dû dewlemendiyê û dev ji fikir û ramanên berê, dev ji projeya derxistina kovar û kitêban berda. Ne ku ez li wê nefikirîm, lê wê fikrê ez eşandim, min tavilê dev ji wê fikrê berda û ez bi dû projeya xwe ketim. Ez bi dû ketim û min xwest ez li welêt dest pê bikim. Rewşa welêt ya hingî ne ewqas baş bû, lê gava

di dema hilbijartinan de serokên partîyan sozêñ demokrasî û aştiyê didan, ez jî bi sozêñ wan dixapiyam û min digot heger ew bi ser bikevin, wê derxistina kovareke bi kurdî jî mimkin bibe.

Min dixwest ez Nûdemê li Diyarbekirê derxim

Min ê kovar ne li Stembolê, lê li Diyarbekirê derxista. Min dixwest ez bi derxistina kovarê ya li Diyarbekirê tradisyonekê bisikînim û berê çapemeniya kurdî ya ku her dem li derveyî welêt bûye, bi welêt ve bikim û Diyarbekirê bikim navenda kultur û edebiyata kurdî.

Lê, li dora deh salan bû ku riya min bi welêt neketibû. Herçiqas nas û dostan ji min re behsa guhertinêñ welêt dikirin jî, min bi xwe cesaret nedikir û ez nedîçûm. Ji nivşê min hema bêje kes neçûbûn. Gava di sala 1990î de min bi hevalekî xwe re bi otomobilê berê xwe da İzmîrê, dilê min ji kelecanan bûbû mîna mirîşkeke serjêkirî. Min paşê bi balafirê xwe ji İzmîrê gihand welêt jî û ez li Diyarbekirê li cihekî ku ez bikaribim Cafeyekê kulturî lê vekim geriyam. Ez li Cafeyekê digeriyam lê min yekî ku bi kurdî binivîsanda nedît. Hin şârî û nivîskar ji berê de li Diyarbekirê hebûn, lê wan bi tirkî dîniyîsandin û loma jî qet bala min nedîkişandin. Haya min ji nebûna nivîskaran hebû û min baş zanîbû ku xwendevan jî peyda nabin, lê baweriya min ya xurt di guhê min de dikir pistînî ku wê bi derketina kovareke xwerû bi kurdî hem nivîskar û hem jî xwendevan bigihîjin. Ya din jî min dixwest ez bi riya kovara edebî weşanxane û kitêbsiroşekê jî vekim, bi riya wergerandina berhemên ji edebiyata dînyayê û bi riya ezimandina nivîskarêñ biyanî bo Diyarbekirê, edebiyatê li welêt aktuel bikim, keç û xortan ber bi cîhana edebî ve bikişînim û Diyarbekirê bikim navenda ziman û edebiyata kurdî. Ez li ser vê yekê bi hin navêñ ku berê nêzîkî huner û edebiyatê bûn re peyivîm û min ji wan re behsa vê fîkrê kir. Wan wek fîkir baş dîtin, lê baweriya xwe bi Tirkîyeyê neanîn û bi min jî dan zanîn ku siyaseta Tirkîyeyê li ser derewan hariye avakirin û divê mirov baweriya xwe bi derewenê siyasetvanan neyne. Bi rastî sozêñ siyasetvanan li gora tecrubeyêñ hevalan derket û piştî hatîna Demirel ya ser hukum planêñ min bi tenê wek fantazî man. Lê qet nebe, min digot çawa be wê Tirkîye were guhertin, loma min xwest ez hêdî hêdî rehê xwe bera welêt bîdim û li rê û imkanêñ vejerê bigerim. Ji bo ku mirov xwe şirîkê welatekî bibîne û dilê mirov bi wî welatî re be, divê an perçak erd an jî xaniyekî mirov lê hebe. Heger xanîma mirov jî ji wî welatî be û zarokêñ mirov bi zimanê wî welatî bipeyivin ew welar êdî cihê xwe di dilê mirov de çêdike. Min li Diyarbekirê cihek ji bo Cafê û kovarê nedît, lê ez ji welêt zewicîm û min xaniyek

kirî. Welatê ku ez demekê lê hatibûm dinyayê, lê bi firê ketibûm û jê reviyabûm û niha jê bi dûr ketibûm, min êdî lingekî xwe davêtiyê û dixwest dîsa lê vejerim, zarokên xwe li cih û deverên ku zaroktî û xortaniya min lê bîhûrîne, mezin bikim û bi wê erdê ve bibim yek. Lê gava ez ji sedî sed bawer bûm ku ez ê nikaribim kovarê li wir derxim, nikaribim ji zarokên xwe re bi zimanê xwe binihurînim, min dilê xwe li welêt hişt û êdî bîryar da ku kovarê li Swêdê derxim.

Min di vê navê de pizzaxaneya xwe jî firotiye û pereyekî baş jê bi dest xistiye. Min ji wî pereyî li dor 500 000 kronî ji bo kovarê veqetandiye û bi qasî sermayekî jî di destê min de maye. Min dixwest ez bi wî sermayeyî jî marketekê vekim û her ku pere li min kêm bikeve, ez ji fêda marketê peran bixim ser û bi vê riyê kovarê bikim kovareke temendirêj.

Min ji bo temendirêjiya Nûdemê marketek vekir

Min di sala 1991ê de nêzîkî bajarê Uppsalayê markerek digel xaniyekî duqatî û bi hewseke mezin dît. Ji marketê bêtir dilê min ket xêñî û min tavilê bîryara kirînê da. Min bi pereyên di destên xwe de jî pê market dagirt. Karê marketê pir baş çû, ji ber têkiliyên min yên germ roj bi roj mişterî zêdetir bûn û wilo bû ku êdî em hewcedarî karkeran bûn. Lê di wê navê de, ji derxistina kovareke edebî pê ve tiştekî balâ min nedikîsand, min dixwest ez rojekê berî rojekê dest bi derxistina kovara xwe bikim û ji bin barê ku ez bi salan lê fikirîme derkevîm. Ez di wê navê de hazırlîya nivîsan dikim, werdigerînim û loma min li ser qasê û li der û dora qasê bi dehan kitêb li xwe vehewandibûn. Rojekê mişteriyekî min ji min pîrsî, got xuyaye ji bili dikandariyê tu bi tiştekî din re mijûl î. Min jê re behs kir, lê min kêm behs kir. Mêrik ez ezimandim malê. Mala wî nêzîkî marketa min bû û ez êvarî çûm mala wî. Odeya ku em lê rûniştin mirov nikarîbû ji kitêban gava xwe biavêta. Ew Eric Fylkesson bû. Wî di dema xwe de sê kovarên edebî derxistibûn, bi dehan kitêbên xwe yên şîran dabûn weşandin û weşanxaneyeke piçûk bi rê ve biribû. Lê niha, bi teqawîtiya ku ji Yekîtiya Nivîskaran distrand, digel jin û zarokên xwe li vê devera xalî bi cih bûbû. Ew xwedî tecrube bû, serê wî li gelek keviran ketibû, bi raman û fantaziyên xwe nuhîtiyek xistibû şîrra swêdî û mina futurîstên rûsan li seranserê Swêdê û li hin welatên Skandinavyayê turneyên şîrxwendina bi muzîk kiribû. Min fikra xwe û mijûliya xwe ji Eric re got. Ji ber ku ew jî di eynî riyê re derbas bûbû wî kelecana min fêhm dikir, lê bi fikir û tecrûbeyên xwe dixwest rê nîşanî min bide û bike ku ez bi ser bikevîm. Carinan jê mirov bi armanca biserketinê dest bi karekîdike, lê ji ber astengî û kelemên ne di hesêb de dihulkume û miradê mirov di qiri-

ka mirov de dimîne. Haya min ji destpêkê ve ji astengî û keleman hebû. Lê min dixwest berî destpêkirina kovarê ez an wan astengî û keleman bi carekê ve ji navê rakim, an jî qet nebe ew astengî û kelemên ku wê derkevin pêşîya min hebekî sivik bikim. Yek jê problema aborî bû, min ew çareser kiribû, qet nebe min aboriya kovarê ya pênc salan garantî kiribû. Ew pereyên ku min ji bo derxistina kovarê danîbûn aliyeķî, ci biba, ci biqewimiya jî ez ê têkîlî wan pereyan nebûma, min ê destên xwe neda wan. Ya din nivîs û nivîskar bûn. Ji ber ku min hebekî zû dest bi nivîsandinê kiribû û ez di salêن heyşîyan de bi kitêb û di kovaran de aktiv bûm, ci bigire dostaniya min bi hemû nivîskarên kurd yên seranserî dinyayê re çêbûbû û min têkiliyeke baş û dostane bi wan re ava kiribû. Ji aliyê din ve jî min bi navên cihê hem nivîsên di mijarên cihê de dinivîsandin, hem jî ji edebiyata dinyayê werger dikirin. Ji ber ku hingî, heger nivîskarên dost hemûyan binivîsandina jî, dîsa bi zorê têra kovarekê dikirin. Loma, min dixwest ez bi riya kovarê di hundurê çend salan de navên nû jî bigîhînim û bi nivîskarên kurd yên navdar re nivîsên wan jî biweşînim.

Dem hatibû û stewiyabû, min navê derxistina kovarekê bi dû xwe xistibû û diviyabû min êdî dest pê bikira.

Navê kovarê

Ji kovarê re navek lazim bû. Ez bi rojan, bi mehan li navan fikirîm, min gelek nav nivîsandin, min di hin navan de biryar digirt, lê paşê min dîsa dev jê berdida û bi dû navên nû diketim. Min dixwest ez ji kovarê re navekî wilo bibînim ku ew bi tenê ya kovarê be û keşîfa min be. Navekî wilo ku berê tunebe, lê ez têxim ferhenga kurdi û ew nav her û her bîmîne. Hin navê naylonî hatin bîra min, lê ez ji wan geriyam û dawiya dawî min biryar di navê NÜDEMê de girt.

Wê kovar di adara 1992an de derketa. Gava di dawiya 1991ê de ez bi ser navê NÜDEMê vebûm, hingî jina min Şaneşîn jî bi zaro bû û em ji bo zikê wê jî li navekî digeriyan. Me wilo biryar dabû ku heger zaroka me keçik be wê navê wê jî Nûdem be. Karê kovarê û zarokê bi hev re dimeşîyan, herdu jî berhemâ fîkrîn eynî demê bûn. Lê ez niha zanim ku min bi vê helwestê tade li jina xwe dikir û hezkirina ji zikê wê re bi kaxezan ve parve dikir. Min ew gelek caran bi tenê dihişt û ez diketim riya Stockholmê. Min dixwest ez bi gelek kesan bişêwirim. Heger min zanîba wê hinekî din jî xwe bidin ber, min biryara kovarê ya derxistina bi serê xwe nedida. Ji ber ku min berê jî mijar ji gelek kesan re vekiribû, lê wan zêde guh nedabûnê, karekî weha pir mezîn didîtin û ji bo kirina karekî weha behsa rola partî û organizasyonê mezîn dikirin. Yêن ku min piştî biryara derxistina kovarê jî dîtin

hinan biryarek baş û di cih de dîtin, hinan jî rasterast gotin, te bi zorê ji xwe re çend quruş gihadine ser hev, li mala xwe rûne, tu guneh ê.

Rast e, ez guneh bûm, min ew pere bi ked û xwêdana xwe bi dest xistibûn, lê bi tenê rûniştina li malê jî di jiyanâ min de valahiyek çêdikir û wê valahiyê jiyanâ li sîrgunê jî min re pir bêmane dikir. Ez di wê navê re çi bigire bi hemû nivîskarên kurd re ketim têkiliyê û min jî wan li ser mijar û babetên cihê nivîs xwestin. Nivîsên gelek kesan zû gihaştin destên min, lê hemû nivîs bi destan û bi deqtilo bûn. Hingî bi giştî komputer kêm bûn, lê komputera min bi xwe jî tunebû. Min hemû nivîs li derive bi peran dan nivîsandin û hejmara pêşî di destpêka meha nîsanê de derket. Zaroka me berî kovarê, di nî adarê de çêbû. Ez bi yê me pir kêfîxweş bûm, jî ber ku min lawikek dixwest û Xwedê lawik da me, me navê wî kir Yezdan û gava ya min jî derket, ez ketim hundurê dilşahiyeke bêhawê. Zaroka mirov li ber çavên mirov şêrîn e, lawikê me jî li ber çav û dilê me bêhawê şêrîn bû. Keçika min Nûdem jî spehî bû. Kovareke zêdeyî sed rûpelî, tengîn, bi nivîs û babetên cihê ve xemilandî û bi rêk û pêk bû. Berî derketinê jî min ji du rojnameyên kurdi re, rojnameya *Welat* ku nû li Stembolê dest bi weşanê kiribû û rojnameya *Armançê* ku ji mêj ve li Stockholmê derdiket îlaneke çend rêzî şandibû. Min bi zanebûn ev herdu rojname hilbijartibûn. Herdu rojname ji aliye siyasi ve dûrî hev bûn û xetên wan cihê bûn. Hingî derketina weşaneke ji derveyî xetên siyasi zêde ne mimkin bû. Min bi wê ûlanê xwest nîşan bidim ku ev tişteki cihê ye, ne bi tu xetan re ye û ne jî li dijî tu xetan e. Ûlana herdu rojnameyan jî derket. Armançê jî bo wan çend rêzan faturek şand û rojnameya *Welat* jî ûlanake xwe şand. Min hingî ji *Armançê* jî ûlan xwest lê wan neşand, perên xwe xwestin. Min perê wan ji wan re şand û ûlana rojnameya *Welat* jî bi çend ûlanen din re di rûpelên dawiyê de belav kir.

Hejmara yekê

Heta niha jî, ez bi kelecan li benda derketina Nûdemê radiwestim û her hejmareke wê ya nû dilşahiyeke dide min. Lê kelecan û dilşahî nagihîjin ya hejmara yekê. Tam di wê navê de, civîna Enstituya Kurdi ya Parisê li Swêdê hebû. Civîn li dereke bi navê Biskops Arnö bû. Biskops Arnö bi qederê 40 kilometreyî dûrî Stockholmê ye. Hingî li dor panzdeh rewşenbir û zimanzanên kurd besdar bûn û min xwest ez dilşahiya xwe bi wan re jî par ve bikim. Min êvanî, Şaneşîn digel zaroka nûçebûyi bi tenê hişt, kartonek kovarên ku hê bêhna çapxanê jê dihat xist bagaja otomobîla xwe, libek jî danî ser qoltixa pêşî, ji bo ku ez car caran lê binerim û ez ketim riya Biskops Arnöyê. Ez çûmî lê min kes ji wan nedît. Min ji jinika berpirsiyar pirsa



Beşdarêن civinê li mala R. Zilan (Foto: Z. Zinar)

wan kir, jinikê got ku ew çûne bajarê Uppsalayê mala Reşo Zîlan. Min berê xwe da Uppsalayê û piştî nîvsâetê ez gîhîstîm mala Reşo Zîlan. Mala Reşo Zîlan hebekî li derveyî Uppsalayê di vîlâyekê de bû. Ez berê jî çûbûm mala Reşo û vê carê jî min zû derxist. Reşo Zîlan ji bo beşdarêن civinê ziyafetek dabû. Ew hemû li qatê jêr, li erdê rûniştibûn. Ez jî tevlî kartona kovaran di derenceyan de daketim jêr û min silav da wan. Ji ber ku nivîsên hinekan ji wan di kovarê de hebûn wan jî meraq kîrin, lê Mehmed Uzun xwe negirt û kovarek xwest. Di hejmara yekê de ez bi Xelîl Duhokî, Mehmed Uzun û Mahmûd Lewendî re li ser edebiyatê bi giştî û bi taybetî jî li ser romanên Mehmed Uzun peyivîbûm û min ew bi resim weşandibû. Min kartona di destê xwe de danî erdê, kovarek jê derxist û dirêjî Mehmed Uzun kir. Dû re min her yekî kovarek danî ber yên din jî. Demekê bêdengiyek çêbû, dû re rehmetiyê Mahmûd Baksî tiliya xwe danî ser reklama rojnameya *Welat* û got: "Ev



Mehmed Uzun, Fırat Cewerî û Mahmûd Baksî (Foto: Z. Zinar)

çî ye? Yê min ez vê kovarê naxwînim. Apocî vê kovarê derdixin û her kes zane ku rişma apociyan di destê kê de ye.” Wek tu satilek ava cemidi bi ser min de birijînî, ez di cihê xwe de sar mam. Ez li bende wan û reaksiyoneke pozitîf bûm. Min digot wê bi derketina kovareke weha pir kêfa wan were û ew ê jî kêfa min bînin.

Herçiqas min ji Mahmûd Baksî re behsa reklam çî ye ne çî ye kir jî, lê wî guh nedida min û her ya xwe digot. Di navbera min û wî de minaqaşeyeke hebekî sert derbas bû û ez hinekî bi ser de rabûm. Herçiqas min digot tu têkiliya kovarê bi partiyên kurdan re nîne jî, wî dîsa dajot ser min û digot heye. Wek yekî bi perê xwe ji xwe re otomibilekê, xaniyekî an jî qatek kinc bikire, lê mirov li hember raweste û bibêje, na, te ev ne kirî ne, hinin din ji te re kirî ne. An jî wek yek bibêje navê min Azad e, tu bibêjî na, navê te ne Azad e. Ev nimûneya rehmetiyê Baksî jî bi min wilo hatibû. Min jê re got xwezî apocî an jî partiyeyeke kurd a din kovareke

weha finanse bikira. Lê piştî kêliyekê hewa hebekî nerm bû û çend camêrên li civate jî bo abonetiyê navên xwe nivîsandin.

Bi rastî min nedixwest ez van çend rêzan li ser Mahmûd Baksî binivîsim. Mahmûd Baksî dostekî min û salan bû, lê digel ku wî bi fikra min a azad û serbixwe zanîbû jî, bêhawî dilê min şikandibû, kêfa min di qirika min de hiştibû. Ez wê êvarê derengê şevê gîhiştim malê. Lawikê me razabû, lê Şaneşîn li benda min mabû. Ez bi hêrs û acizî derbasî hundur bûm û min xwe teva solan da ser qoltixan.

Ez qederekî nepeyivîm, min çavêن xwe bera nixteyeke nediyar dan û wilo bê-deng rûniştîm. Şaneşîn jî li hemberî min rûnişt û tişt negot. Wê ez nas dikirim, wê zanîbû ez aciz bûme, lê nizanîbû mesele ci ye. Paşê, gava dît ku hêdî hêdî bêhna min fireh dibe, meraq kir bê ci bûye û çîma ez wilo aciz bûme. Min jê re behs kir û min got ez ê dev ji vî karf berdim. Min got ji berdêla dijiminan wê kurd min biêşînin û ez ê bi êşandina kurdan pir li ber xwe bikevim. Wê hebekî bêhna min fireh kir, di ber dilê min da û got ku divê ez ne wek her kesî bim, zû teslîm nebim û di riya xwe de berdewam bim.

Rast e, diviyabû ez di riya xwe de berdewam bûma, min barekî mezin dabû ser milên xwe û ji kurdan re sozeke giran dabû. Min gotibû wê Nûdem pênc salan derkeve û diviyabû Nûdem pênc salan û bêî navbir derketa. Lê ji bo wê yekê jî bâweriyeke xurt û înyadeke mezin lazim bû.

Min hejmara yekê belav kir, vir de û wê de şand û pir tê re neçû nameyên pesintijî bi ser min de rîjiyan. Min ew bûyera li mala Reşo Zilan ji bîra kir û êdî diviyabû ez li gora wan pesinan bûma û min kurd bê Nûdem nehişa. Lê ji aliyekî ve jî min nedixwest keda min ji hinin din te bibe mal, karê ku ez şev û rojên xwe didimê bibe malê hinekî din. Loma, min bang Mahmûd Baksî kir, ew û Mehmed Uzun hatin mîvandariya min û min ji bo hejmara zan bi Baksî re sohbetek kir. Vêca piştî derketina hejmara dudan hin xwendevanên bi ser PKKê ve jî gotin; "Nûdem kovareke baş e lê mirovên wek Baksî tê de tunebin wê baştır be".

Min fêhm kir ku ez bi dewla hinek kurdan herim avê, ez ê tiştekî bi ser nexim û projeya ku ez ribek ji jiyanâ xwe lê fikirî me, divê ez nîvcî bîhêlim û li mala xwe rûnim. Piştî hejmara dudan, êdî di warê siyasi de kê ci bigota min guh nedidayê, min tenê bi ya xwe dikir. Ji ber ku armanceke min a ku ez li dijî partiyên siyasi an jî li dijî weşanên wan rawestim qet tunebû, min dixwest dostaniya min bi hemûyan re hebe û kovarê jî bikim platformeke azad ku hemû nivîskar û hunermendêن kurdan xwe tê de bibînin. Îdeolojiya kê ci bûya, bi ser kîjan parti û rêkxistinê bûya, fikra wî/wê ya dînyayî ci bûya ji bo ku nivîsên wan di Nûdemê de biweşiyana tu astengî tunebû. Ji xwe kovar, bi fikir û nêrînên cihê dibin kovar, kovarêن ku bixwazin

dengê pirdengiyê bilind bikin, divê ew tengîn bin, ji fîkrêni cihê re vekirî bin, platforma ramana azad bin. Platformeke weha encamê dide, ruhê toleransê firehtir di-ke, ji guhertina civatê ya ber bi pêş ve dibe bingehêkî qewîn.

Min dixwest kovar li ser wî bingehê qewîn weşana xwe bidomîne. Min dixwest, lê derketina wê ya li derveyî welêt jî ez diêşandim. Loma, min hejmara dudan li Enquerê derxist. Min hingî dît ku heger ez ne li ser karê xwe bim wê kar nemeşe û dibe ku hinek kovarê ji bo armacîn din bi kar bînin. Min hejmara sisiyan dîsa li Swêdê, li bajarê Uppsalayê derxist. Hê kovar di çapê de bû, min kuştina Musa Anterbihîst. Ez pir pê êşiyam û min tavilê berê xwe da çapxanê da ku ez nûçeya kuştina wî di kovarê de biwesînim. Min apê Musa nas dikir, gava ez zewicibûm em çendakî li Stembolê li mala wî mabûn, wî di hejmara Nûdemê ya yekê de li ser Ni-sêbînê nivîsek nivîsandibû û ji min re soz dabû ku ew ê di her hejinarê de binivîsîne. Gava ez bi xar di deriyê çapxanê re ketibûm hundur, ez pêrgî Mehmed Emîn Bozarslan hatibûm. Min û Bozarslan li eynî çapxanê berhemên xwe çap dikirin û gava em li çapxanê pêrgî hev dihatin, me li ser lingan sohbet dikir. Ez, yê ku herdem devbiken bûm û bi Seyda re xweş dikir, vê carê bêkêf bûm û min bi sarî silav dayê. Bozarslan tavilê bêkêfiya min di bîra min de anî û min jî nûçeya kuştina Musa Anter gihadê. Gava Bozarslan ew nûçe bîhîst, hejiya û heger ez neketima bin milê wî ew ê ji kerban biketa. Rewşa Bozarslan agir berda dilê min û careke din bêxwedîti û trajediya rewşenbîrên kurdan bi bîr anî.

Xwendevan ji ber berdewamiya kovarê bi şik bûn

Hejmara sisiyan jî di dema xwe de û paqîj derketibû. Lê hê jî xwendevanan cesaret nedikirin ku bibin abone. Nizanîbûn wê ci bête serê kovarê. Nizanîbûn ka gelo wê kovar derkeve an na. An jî bawer nedikirin ku wê kovar di jiyanâ xwe ya weşanê de berdewam be. Gava hejmara yekê derker, digotin wê ya dudan dernekeve, gava ya dudan derker, digotin wê ya sisiyan dernekeve û niha gava ya sisiyan di destê me de bû, digotin, wê ya çaran dernekeve. Lê ez qet ji ber vê helwesta wan aciz nedibûm, min di ser re heq jî dida wan. Wê çîma bawer bikiranâ? Gelek kovar û rojnameyêñ kurdan bi niyeta temendirêjiyê derdiketin lê paşê ji nişka ve dawî li jiyanâ wan dihat. An politîkaya serdestên kurdan dibû sebeba nederketina wan, an ew diketin krîza aborî, an jî mîna rêkxistin ji hev diqetîyan û weşan jî di wê navê de radiwestiya. Talûkeyeke welê ji bo Nûdemê ne aktuel bû. Yek jê Nûdem li Swêdê derdiket, ew ê nekerta krîza aborî û ew ne ya tu partî û rêxistinan bû ku rêxistin ji hev biqetiya kovar jî rawestiya. Gelek caran ez bi xwe bûme aboneyêñ hin kovaran,



Dîmenek ji şahiya yeksaliya Nûdemê.

min perê xwe daye, hejmarek ji min re hatiye û kovara ku ez abone me ji nişka ve rawestiyaye û xwediyê wê ne ez di derbarê rawestandina kovarê de agahdar kirime, ne jî perên min li min vegerandine. Loma, gava min dibihîst ku hin xwendevan ji ber pêşeroja kovarê bi şik in, min heq dida wan û min qet dilê xwe nedigirt. Lê pişti hejmara çaran bawerî xurt bû, yên ku bi rexne nêzîk dibûn fikra xwe guhertin û êdî bi dilsozî nêzîkî kovarê bûn.

Yeksaliya Nûdemê

Min ji bo hejmara çaran, an jî yeksaliya Nûdemê, di meha donzdehan de, nêzîkî cejna Noelê, êvareke şahiyê li malê li dar xist û hinek nivîskarên Nûdemê ezîman-din malê. Nivîskarên ku hingî hatibûn pîrozbahîya yeksaliya Nûdemê ev bûn; Naçî Kutlay, Zeynelabidîn Zinar, Hesenê Metê, Fewaz Husêن, Rohat Alakom, Xelîl Duhokî, Mehmed Uzun, M. Alî Kut... Şaneşîn digel ku zarok li dest bû û bi tenê



Dîmenek ji şahiya yekşaliya Nûdemê.

bû, ji mîvanan re gelek xwarinên cihê çêkiribûn, ji ber ku ji dil û bi evîn çêkiribûn, pir xweş çêkiribûn û pir bi dilê mîvanan bû. Me wê êvarê xwar, vexwar, em li ser edebiyat û siyasetê peyivîn, me ji paşerojê gazin kir û bi xweşbinî li pêşerojê nerî. Ji ber ku hingî mala me dûrî Stockholmê bû û piraniya mîvanan jî ji Stockholmê hatibûn, gelek ji wan li malê razan û adînî rojê sibehê zû çûn malên xwe.


Êdî Nûdem dibû kovarek û cihê xwe digirt. Berpirsiyariya min jî zêdetir dibû, min bêhna xwe firehtir dikir, pêwendiyêñ xwe firehtir digirtin û bûbûm evîndarekî kovarê. Ci bigire westandin li min tunebû, ez heta saet sisê-çarê sibehê rûdiniştîm û dixebitim û sibehan zû, saet di heftê sibehê de radibûm.

Carinan du kar û sê kar jî baş bi hev re dimeşin û carinan jî qet nameşin. Yê min jî welê bû. Karê kovarê baş dimeşiya, ji ber ku min hemû wextê xwe didayê, lê ji ber ku min kêm wextê xwe dida marketê, vêca kêmaniyê di marketê de xwe nîşan

dida. Şîr û rûnê ku dema wan dibihurî, me nedidan alî, me sebze û fêkiyên çîlmisî nedineqandin û li gora mişteriyên Swêdê ji heftê carekê erzaniya tiştekî nedikir û carinan jê hin tiş xelas dibûn, lê me ji bîr dikir û ew tiş nedixwastin. Vêca hêdî hêdî me gazinên mişteriyan dibihîst, lê ji ber ku hemû mişteriyên dewamî bûn û em bûbûn mîna malbatekê, zêde bi ser me de nedihatîn, bi fikir û şîretên xwe alî-kariya me dikirin.

Ez hin şevan qet ranedizam

Min got ku ez heta saet çaran şiyar dimam û saet di heftê sibehê de jî radibûm, lê şevin hebûn ku ez qet ranedizam û rast dihatim kar. Ew jî şevêne nêzîkhûna derketina Nûdemê bûn. Ji ber kembûna komputeran, nebûna hin tîpêñ alfabeşa kurdi gelek caran ji me re serêsiyên mezin derdiketin. Min hin êvaran lê dixist ez diçûm Stockholmê mala Zeynelabidîn Zinar. Zeynelabidîn Zinar berî gelek kesan bûbû xwediyê komputerê û li gora hin kesan jî wî ji komputerê fêhm dikir. Camêr ji alî-kariya bi min re texsîr nedikir, bi min re heta sibehê rûdinişt, me bi hev re Nûdem mîzanpaj dikir, derdixist ser kaxezê û dû re jî şorbeyek nîskê dida ser, me bi hev re şorba xwe digel seriyeğ pîvaz dixwar û ez li otomobîla xwe siwar dibûm û min berê xwe dida malê. Mesafeya di navbera mala min û Zeynelabidîn Zinar de li dora 120 kilometreyan hebû. Pişî ajotina nîvê rê, êdî xewekê xwe davêt ser çavê min û ji bo ku ez di xew re neçim, geh min radiyo vedikir, geh min camêr otomobilê dadixistin û bilind dikirin, geh min distira, bi kurtî ji bo şiyarmayînê min her rê û metod diceribandin. Ji bo her sê-çar hejmarêñ pêşî min gelek şev wilo kirin sibeh û ew sibeh bi giranî bi ser min de dihatin. Wê giraniyê tesîr li marketê ji dikir, êdî ez bi tu awayî li marketê ne miqate bûm û min piraniya caran market teslimî karkeran dikir û dispart wijdanê wan. Rojekê ez têgihîstim ku nema dimeşe, an divê ez marketê bifiroşim an jî bi riyekê xwe jê rizgar bikim. Lê di wê navê de karê wê kêm bûbû, herçiqas me xwest em bifiroşin jî, mişterî lê derneket û me nikaribû bifirota. Ji bo ku market neçe iflasê me mişteriyek dît, alavê marketê bi bihayekî mirî firotinê û bi wî awayî xwe jê xelas kir. Pişî ku me market ji destê xwe derxist, min çavêñ xwe li Stockholmê li xaniyeğî gerand. Xaniyê ku em niha tê de ne me peyda kir û tavilê mal bar kiriye. Herçiqas ez niha bêkar bûm jî, lê rizgarbûna ji berpirsiyariya marketê hêsanî û aramiyek dida min, stresa min kêmtir kiribû, fîrsenda ku ez nas û dostan bibînim zêdetir kiribû, imkanê ku ez bi Nûdemê dakevîm firehtir bûbû. Di vê navê de ji bili Nûdemê min du kitêb; *Misk ñ Mirov* a John Steinbeck û *Şevêne Spî* a Dostoyevskî wergerandibûn, kitêba Celadet Bedir-Xan *Bingeheñ gra-*



Her pênc kitêbên Nûdemê yên pêşî.

mera kurdmancî ya ku min ji Baniasê ji ba kevaniya wî Rewşen Bedir-Xan anîbû, kitêbeke Mehmed Uzun ya bi navê *Hêz ú bedewiya pênûsê* û kitêba Rohat Alakom ya bi navê *Dî folklora Kurdî de serdestiyeke jinan*, wek kitêbên ji bo çapê amade kîribûn û min hem ji xwe te hem jî ji herdu nivîskarên xwe re soza dabû ku ez ê wan kitêban biwêşînim. Lê heger min mesrefê çapa kitêban ji sermayeyê Nûdemê bi kar bianiya, wê hingî pereyên Nûdemê kêm biketa û dibû ku min nikarîbûya pênc salan Nûdem derxista. Lê min dîsa jî kitêb dane çapê. Her pênc kitêb jî pir spehî derketin û herkesî çap û estetîka wan ecibandin û pesinandin. Çapxanê xwe mehekê li min ragirtibû û diviyabû min di hundurê mehekê de pereyên wan bidaya wan. Adeteke min heye ku ez qet peran ji şexsan deyn nakim, an jî ez heta niha hewcedar nebûme, loma, min xwest ez otomobîla xwe bifiroşim û pê pereyên kitêban yên ku kêm ketine bidim. Min otobomîla xwe ya bi markeya BMW ku berî bi çend salan nû kirîbû, firot û bi wî awayî ji deynê çapxanê pak bûm. Tê bîra min, gava min otomobil firotibû û xwedîyên nû hatibûn ew ji parka ba mala me biribûn, kurê min Yezdan ku hingî nû bi ser lingan ketibû, bi dû wan de nerîbû, girî ketibû qırıkê, tiliya xwe ber bi otomobilê ve dirêj kiribû û gotibû; "ereba me, ereba me."

Ereba me çû, em êdî bêî erebe mabûn û me zû xwe hînî bêîerebetiyê kir. Em êdî bi tirêن û otobusan diçûn û dihatin û me xwe welê konsantre dikir ku mirov bi otomobilan tiral dibe, bêrevger dimîne û diweste. Me bi rastî erebe ji bîr kir, bi tenê di demêñ ku Nûdem derdiket de dihat bîra me. Bi tenê hingî erebe ji me te lazim dibû.

Carinan tê gotin ku filankes derwêşê filan tiştî ye. Yanî wî hemû jîjana xwe daye tiştê ku jê bawer dike. Gava ew bi wî tiştî re mijûl dibe, guh nadî tiştêñ din, dix-

waze ji tiştê ku bawer dike re xizmetê bike. Xizmet an jî helwestên weha dikarin dînî, siyâsî an jî evînî bin. Malê dînyayê zêde bala mirov nakişîne, tiştê ji bo mirov balkêş e ew e ku mirov baweriya xwe pê anîye û mirov pê mijûl dibe. Ji bo min jî welê bûbû. Ez bi karekî weha re mijûl dibûm ku ez bi salan lê fikiribûm, ez bi salan li riyêñ destpêkirina wî karî geriyabûm û niha jî min dest bi wî karî kiribû û ew karê min ketibû destêñ piraniya şair û nivîskarêñ kurd. Ya din jî wî karî baweriyeñ dabû xwendevanêñ zimanê kurdî, hêviyêñ cilmisî hêdî hêdî geş dikirin, dikit ku keç û xort dest bavêjin pêñûsê û ew meydana ku vala mabû dihat dagirtin. Ew valahî jî bi Nûdemê dihat dagirtin. Piştî Hawarê, di kurmancî de, ev cara yekê bû ku kovareke ne bi tu partî û rêkxistinêñ siyâsî, dînî, kulturî an jî civakî ve girêdayî bû. Kovareke edebî, xwerû bi kurdî û serbixwe bû. Ü ew kovar jî min derdixist. Ji pêwendiyêñ bi nivîskar û xwendevanêñ re bigire, heta hilbijartina nivîsan, pergala bergê û rûpelan, birin û anîna çapxanê, şandina ji aboneyan re, hemû min dikirin. Min dikirin, lê ez qet jî pê nedîwestiyam, min kêt û zewqek jê distand, min pê xwe serbilind û dilşa hîs dikir. Roj hebûn bîst name dihatin û min her bîst name jî di eyñî rojê de dibersivandin. Min pir qîmet dida xwendevanêñ û ew cidî digirtin. Min xwe wilo dabû bawerkirin ku Nûdem bi wan heye û wê bi wan bijî. Heger ew jê hez bikin, wê bixwînin û lê bi xwedî derkevin, ew ê roj bi roj berfirehtir belav bibe û bibe malê bi sedan û bi hezaran. Bi qasî ku min guh dida xwendevanêñ min ewqasî jî qîmet dida nivîskarêñ Nûdemê jî. Ji kê dera dînyayê şîrek, çîrokek, an jî gotarek bihata, min ew biweşanda neweşanda min ji xwediyê wan re bersivek dîni-vîsand. Lê mixabin ji ber ku piraniya name û nivîsêñ kurdêñ binxetê bêî adres dihatin, min nikarîbû xwe bigihanda wan. Gelek nivîsêñ ku wan dişandin jî nedigîhîstîn me, di sînor de winda dibûn û gava nivîsêñ ku şandine di Nûdemê de nedîhatin weşandin, dilê xwe digirtin, wilô bawer dikirin ku nivîs gîhîstîne me û em bi zanebûn naweşînîn. Lê bi vê hincetê ez dixwazim careke din bala wan bikişînim ku gelek nivîsêñ ku wan şandine negîhîstîne me. Gelek canik û camêrên din nivîsêñ xwe bi destan dişandin. Çawa ku nivîsêñ wan nedigîhîstîn me, wilô jî Nûdem nedigîhîst wan. Me jî ji wan re Nûdem bi destan dişand û paşê me dibihîst ku ew Nûdemê li wir ji nû ve kopî dikin û difiroşin. Wan ev ji ber welatheziya xwe dikirin, heger wan bi dizî bikirana, wan xwe eşkere nedikirin. Heta carekê yek ji wan bi telefonê li min geriya û got ku ew hejmareke Nûdemê dixwazin û mikur hat ku ew Nûdemê jî nû ve kopî dikin û difiroşin. Gava min ew yek bihîst, min nizanîbû ez ê çi bikim, kêt bikim an aciz bibim. Min li Swêdê ewqas zehmetî dida xwe ku ez Nûdemê rengîn û estetîk derxim, wan jî ew Nûdema rengîn kopî dikirin û dikirin mîna her kovarê. Ji aliyê din ve jî ew dibûn sebeba belavkirina Nûdemê. Dibe ku jî



Dimenek ji buroya Nûdemê. Nûdemê gelek kitêb li xwe civandibûn. (Foto: Arif Zêrevan)




bi xêra Nûdemên kopîkirî be ku Nûdem di nav kurdên Binxetê de baş belav bû.

Nûdemê ez sewesî kiribûm

Nûdemê ez sewesî kiribûm, min dev ji her tiştên din berdabû û bi tenê ew ji min re mihiûm bû. Wê yekê hêzek jî dida min, min xwe xurt hîs dikir û min wilo bawer dikir ku ez ê Nûdemê bi rastî jî bikim kovareke Kurdistanî, wê an li hemû perçeyan çap bikim an jî bi riyekê bigihînim hemû perçeyan û bikim dengê nivîskarê hemû perçeyên welêt.

Di vê navê de kovar û rojnameyên kurdan jî bi germî nêzîkî Nûdemê dibûn, her hejmara ku nû derdiket bi xwendevanên xwe didan naskirin û wê naskirinê jî dikir ku xwendevanên wan weşanan jî bi çavekî dostane li Nûdemê binerin, wê bixwînin û bibin aboneyê wê. Lê bi tenê kovara *Armancê* ku ew jî li Stockholmê xwerû bi kurdî derdiket û xizmeteke baş ji ziman û edebiyata kurdî re kîribû, li hemberî Nûdemê sar bû. Wê ne tu hejmaraen Nûdemê bi xwendevanên xwe da naskirin ne jî dev ji Nûdemê berda. Bi navê Misto Masto di çend hejmaraan de rexneyên ji edebiyatê dûr li min û Nûdemê girtin. Digel ku karê Nûdemê pir baş dimeşıya, roj bi roj hejmara nivîskar û aboneyan zêdetir dibûn, rojê bi dehan nameyên pîrozbahî û pasindayinê jî min re dihatin jî, wan nivîsên Armancê ez pir aciz dikirim, ez jî dil xemgîn dikirim. Di wê demê de, gelek nivîsên li dijî *Armancê* hatin, lê min ew ne-weşandin, min nexwest em nexweşiya siyasetê têkin nava edebiyatê jî û bibim sebeba neyartiyê. Min ji destpêkê ve dixwest ku ez siyaseteke nerm bajom. Ji ber ku hem haya min jî pevçûn û berberiyên siyasi hebû, hem jî ez ji berberiyên eşîri û şexsî haydar bûm. Ji bo ku min karîba ew yek biguherta, diviyabû min pêşî ji xwe dest pê bikira. Min ê di vir de felsefeya Isa bijota, ji bo ziman û edebiyata kurdî, an jî ji bo temendirêjiya Nûdemê yekî li rûyekî min bixista, min ê rûyê din bida ber, loma min hemû neheqî dadiqurtandin û hewl dida ku bi xelkê re nekevîm heft û heyştan û nekevîm polemîkên bêfede. Lê min bi xwe fêda wê paşê dît. Yen ku li rûyekî min xistibûn, paşê li ber xwe ketin û nêzîkî min bûn. Ez dîsa bi wan re neketim gir û berberiyân, mîna ku qet tiştek neqewimî be, min di Nûdemê de cih da wan û nivîsên wan jî weşandin.

Piştî alîkariya Zeynelabidîn Zinar û Nedîm Dagdevîren ya mîzanpajêNûdemê, Mumtaz Aydin û Arif Zêrevan jî di warê teknîka komputer û pergala rûpelan de ji min re bûn alîkar. Edî piştî hejmara heftan mîzanpajê hemû hejmaraan min bi xwe dikirin. Ne bi tenê mîzanpaj, nivîsên destnivîs û bi deqtîlo jî min bi xwe dînivîsandin, tashîha wan min bi xwe dikir û ji hilbijartina bergê kovarê heta resimên



Gava telefon ji derve dihatin û min bersiv dida, yê/ya li hember ecêbmayî dima. (Foto: Arif Zérevan)

hundur hemû min dikirin. Lê di pêwendiyên ji derve re min gelek caran pronava "em" û "me" bi kar dianî. Gava hinekan li rewşa kovarê dipirsîn min digot *em* ê welê an jî *me* welê kir. Min nedixwest ez bi xwendevanan bidim hîskirin ku hemû karêñ kovarê di stûyê min de ye û bi tenê ez kovarê bi rê ve dibim. Ji xwe nas û dostên Swêdî qet bawer nedikirin ku ez bi tena serê xwe kovareke weha bi rê ve dibim. Xelkên dûr ji bawer nedikirin. Ji wan webû ku avahîyeke Nûdemê ya çend-qatî heye, bi kêmanî deh-panzdeh kes di Nûdemê de dixebeitin û ez jî li ser serê wan im. Gava telefon ji derve dihatin û min bersiv dida, yê/ya li hember ecêbmayî dima.

Ji bo min ya girfng encama kar bû. Heger em panzdeh kes jî bixebitiyana û kar bi rê ve neçûya, ci fêda wê hebû. Carinan hin hevalan gazina nebûna redaksiyonê dikirin. Rast e, redaksiyonek hebûya û redaksiyonek bi rêk û pêk bûya, dibe ku kar

baştır bimeşıya. Lê ev jî rastiyek e ku peydakirina redaksiyoneke welê li xerîbiyê ne hêsan bû. Ji bo danîna redaksiyonekê an diviyabû mirov endamê partieneke siyasi bûya û redaksiyon ji aliyê tevgera siyasî ve hatibûya danîn, an jî diviyabû redaksiyoneke profesyonel bûya û meaşê wan ji aliyê kovarê vebihata dayîn. Ya yekê em ne tu partî bûn û me nikarîbû ji jor ve redaksiyonek tespît bikira, ya dudan jî perê me tunebû ku em redaksiyoneke profesyonel deynin.

Swêd welatekî welê ye ku betalî lê kêm e û kurdên Swêdê jî mecbûr ketine nava sistemê û ew jî mîna hevwelatiyê vî welatî her mijûl in. An divê ew ji bo debara xwe kar bikin, an jî heger ew kar nekin divê herin hin kursan da ku ji aliyê dewletê ve meaşekî bistînin. Loma, yê dema wan bi ser biketa û wextê xwe bidana Nûdemê jî nebûn. Lê mîna ku gelek kesan rastiyek fêhm kiribûn û digotin yabo wilo baştir dimeşe û digotin heger gelek kes têkilbûna nedimeşıya. Gava wan ev yek digotin jî hinek kovarênu ku ez naxwazim bi nav bikim nimûne didan û helwesta min rast di-dîtin.

Gava em li dîroka çapemeniya kurdan dinerin em dibînin ku dîroka rojnamege-riya kurdî bi rojnameya *Kurdistanê* dest pê kiriye û rojnameya *Kurdistanê* jî ji aliyê kesekî, Mîqtad Mîhat Bedirxan ve derketiye. Kovarênu *Hawar* û *Ronahî* jî aliyê Celadet Alî Bedir-Xan û kovarênu *Roja Nû* û *Şter* jî ji aliyê Kamran Alî Bedir-Xan ve hatine derxistin. Nimûneyêne welê li cîhanê gelek in, lê bi taybetî jî pişî ku fikra çepîtiyê li ba me xurt bû, me bi tenê baweriya xwe bi kolektivîzmê anî û me karê îndîvîd pir bêmane û biçûk dît. Loma min carinan dibihiştu ku dilxwazêne hin der û doran bi tirkî digotin: "İyi bir dergi ama bireysel bir çıkış."

Herçiqas barê kovarê, hemû berbirisyariyêne kovarê di stûyê min de bûn jî, dîsa min tu carî nedixwest ez wilo nîşan bidim, min hertim dixwest ez wê fireh bigirim, min dixwest insanê cihê, fîkrêne cihê, ji perçeyen cihê şâîr û nivîskarêne kurdan ci-hê xwe tê de bigirin. Min ji destpêkê ve dixwest ez kovareke bi giranî kurmancî der-xim, loma ez zêde li ser zaravayêne din ranewestiyam. Min xwest ku bi kêmanî çend rûpelan ji zazakî re jî veçerînim. Ew nivîsen bi zazakî ku di hejmarêne kovarê yêne destpêkê de hatin weşandin, ji aliyê zazakîzanan ve hatin texnekirin û gava min xwest ew alîkariyê bikin, wan jî gazin ji pirbûna karê xwe kirin û xwe nedan ber, ji ber ku ez jî ne şarezayê zazakî me, me hêdî hêdî zazakî jî rakir û kovar bi tenê kovareke kurmancî hişt. Me bi tenê carinan di nav re şîrîn soranî an jî zazakî weşandin.

Gava min nivîsen zazakî diweşandin û min hem di Nûdemê de hem jî di hev-peyvînêne di kovar û rojnameyêne din de zazakî mîna zaravayekî kurdî dida nîşandan, ji hin der û doran name û fax bi ser min de dirijîyan û dixwest nîşan bidin ku zazakî ne zaravayekî kurdî ye û zimanekî serbixwe ye. Ji ber ku tu adres li ser name



Her ku diçû
kar zêdetir
dibû. Rojê bi
dehan nivîs
û name
dihatîn û
heta ji min
dihat min di
wextê de
bersiv dida.
(Foto: Arif
Zêrevan)

û faxan tunebû loma min ew bêbersiv dihiştin. Min nexwest ez di kovarê de jî mi-jareke welê vekim û pirsgirêkan têxim serê xwendevanan. Gelek kurmanc jî dibêjin em ne kurmanc in, xwe tirk dibînin û dixwazin jî wan re xizmetê bikin.

Weşanê kurdan

Gava min dest bi derxistina Nûdemê kir, weşanên kurdî hebûn, lê kêm bûn. Hem di destpêka weşana Nûdemê de hem jî di pêvajoya derxistina kovarê de hejmara weşanan zêdetir bûn, hinek dirêj jiyan hinek jî zû rawestiyân û dîsa mîna hertim bêhêvîtî li dû xwe hiştin. Ji nav weşanên ku derketin de, televizyon jî hebû. Ev kanala satelît ku bi navê Med-tv dest bi weşanê kir û hera niha bi navên cihê berde-warm e, carinan bi mijara min ve girêdayî bang min jî dikirin, ez jî besdarî programan dibûm û min di wan programan de fîkrêن xwe tanîn zîmên. Program bi kurdî bûn û min bi kurdî fîkrêن xwe tanîn zîmên. Digel ku min di piraniya programan de doza pirdengiyê, doza demokrasî û azadiya fîkrê dikir û piraniya caran rexne li partiyêن kurdan ku guh nedidan zimanê kurdî digirt jî, kesî fîkrên min sansur nedikirin. Piştî her besdarbûna min a televizoyê, gava ez vedigeriyam malê, bi taybetî jî pênc-şes kesên ku ji aliye siyasi ve antî xwediyyen televizyonê bûn, ez didam ber pêla rexneyan û digot ku televizyon me bi kar tîne û dixwazin bi yên wek me politîkaya xwe li ser gelê kurd ferz bikin. Ji aliye din ve ew bi xwe jî besdarî programan dibûn û piştî kurtedemekê gelek ji wan kesên ku ji bo çûna min a televizyonê rexne li min dibarandin, vêca ew çûn wir, her roj derketin, program çekirin, bûn berpirsiyar. Di vir de ne hewce ye ez navan bidim, ew bi xwe xwe nas dikin û gava hinek ji wan jî, bi tundî hatin ser yên wek min û heta ji wan hat nehiştin ku danasî-nênen Nûdemê di rojname an jî di televizyonê de derkevin. Lê helwesta min li hemberî televizyonê çi bû, hê jî wilô ye, helwesta min li hemberî wan kesan çi bû, hê jî ew e. Min tu carî nexwestiye ez bi kurdan re têkevîm berberiyê û bi wan re şer û pevçûnê bikim. Min hertim xwestiye ez bi wan re di têkiliyê de bim, diyaloga min bi wan re hebe û ancax em bi riya diyalogê karibin tiştekî bikin û bigihîjin armanca xwe.

Nûdem dibû nimûne

Bi riya wê diyalogê, bi riya danûstandinên berfireh, bi riya parastina pirdengî û pîr-tengiyê, bi bêhna fireh Nûdemê nêzîkî li pêncsaliya xwe kir. Di wê navê re weşanên Nûdemê jî bi dehan nimûne ji edebiyata kurdî û ya dînyayê pêşkêşî xwendevanên kurd kiribû. Ëdî Nûdem bi cih dibû û yên ku di destpêkê de dijayedîya Nûdemê dikirin jî ew qebûl kiribûn, cih bi cih pesnê wê didan û cidiyera wê ji xwe re nimûne digirtin. Kovarên ku derdiketin, form û fikra Nûdemê li ber çavan digirtin, ji aliye toleransê ji yên berî xwe firehtir bûbûn û vê yekê jî hêdî hêdî qet nebe

di warê edebî û fikrî de di çapemeniya kurdî de toleransek çêdikir.

Nûdem dibû pêncsali

Lê soza ku min ji bo peryoda weşana Nûdemê dabû dawî dihat û Nûdemê pêncsaliya xwe dadigirt. Min di hejmarên destpêkê de û di hevpeyvinên di kovar û rojnameyên kurdan de dabû xuyakirin ku ez ê Nûdemê pênc salan derxim. Min wilo plan kiribû. Min hem di warê aborî de, hem jî di warê taqeta derxistina kovarê de pênc sal dabûn ber xwe. Lê, va ye pênc salên min qediyabûn û mîna ku min di pêşgotina hejmara zoî de nivîsandibû, pênc salên Nûdemê mîna bahozê bîhûrbûn. Bi rastî jî pênc salên Nûdemê ji bo min mîna bahozê bîhûrbûn. Ez hê xort bûm, li ser xwe bûm û ez karîbûm bêî navbir rojê deh saetan bixebitiyama. Xurta-hiya ruhî tesîr li laş jî dikir û laş ji ber westandin û bêxewiyê baş li ber xwe dida. Pênc sal buhûrbûn, min bêî navbir pênc salan kovareke berfireh derxistibû û ez hê jî newwestiyabûm, ez hê jî lê germ bûm. Ya din ew bi rastî jî bûbû mîna zarokeke malê. Bûbû mîna zarokeke delalî û hezkirî. Roj tunebû ku navê wê nehata hilanîn, roj tunebû ku behsa wê nehata kirin, roj tunebû ku bi çendan name ji bo wê nehata, bi çendan telefon ne li ser wê bûna. Û ew hê jî mîna zarokeke pênc salî bû. Tu nexweşiyên wê tunebûn û karîbû bijiya. Lê qedera wê di destên min de bû. Ez ji bo wê Hades bûm. Min karîbû ruhê wê jî bistanda û bihişa ew bijiya jî. Lê ez dilbirehim bûm, min nikarîbû ew bikuşta, min nikarîbû bi destê xwe zaroka ku min mezin kiribû bikuşta. Zaroka ku bi kêf ber bi pêşerojê ve dida lotikan û bûbû hezkira bi hezaran kurdan. Ez nikarîbûm bibûma xwîniyê keçekte wilo spehî. Ez bi xwe nizanim ez kengî hatime dînyayê û loma ez nikarîm rojbûna xwe jî pîroz bikim, lê, min Nûdem anîbû dînyayê, min nav lê kiribû, min ew mezin kiribû û min zanîbû ew kengî hatîye dînyayê. Loma, min xwest ez rojbûna wê, an jî pêncsaliya wê pîroz bikim û hemû dostên xwe û hezkirên wê biezimînim rojbûna wê. O me, li Stockholmê restorantek kirê kir û bangî hemû şâit, nivîskar, muzîkkar, siyasetvan û hinek aboneyan kir. Digel ku wan ê heqê şîva xwe bidana jî, gava bû êvar û saeta me ji wan re gotibû hat, di hundurê nîvsatê de restoranta mezin bi dev re hat dagirtin. Ji bilî çend mîvanên ku ji derve hatibûn, hema bêje hemû navdarên kurdan hatibûn şahiya pêncsaliya Nûdemê.

Ew şeva me, ya ku zêdeyî sêsed dostên Nûdemê beşdar bûbûn, bi şahiyeke xweş derbas bû, lê wê şahiyê, helvesta wan mitovan kir ku ez bi rastî jî nikaribim dev ji Nûdemê berdim.

Pênc salên din

Ji bo ku ez pênc salên din jî nedim ber xwe tu sebeb tunebû. Min bi aña kariya ni-vîskar û aboneyan zora hemû zehmetiyan biribû. Astengiyênu ku di destpêka weşana kovarê de derdiketin pêşberî min nemabûn, kovar ji aliye piraniya nivîskar, rewşenbîr û partiyêne kurdan ve hatibû qebûlkirin, êdî herkesî ew wek nimûne didan. Bêguman ev jî ji bo min dibû berpirsiyariyeke pir mezin û barekî giran. Loma diviyabû ez bi awayekî pir cidî li ser kovarê rawestiyama û min hem xeta wê ya serbix-we biparasta, hem jî di navbera kes û rêlxistinêne kurdan de balansek çêbikira. Ji aliye din ve, diviyabû ez pir li ser kalîteya kovarê rawestiyama. Vê yekê jî ez bêhawê diwestandim, jiyana min ya taybetî serûbin dikir, ji aliye aborî ve ez mehû dikirim. Lê min tu carî êşa xwe neda der, min kêm caran gazinêne aborî kirin û min qet destê xwe li ber kesî venegirt. Min dixwest ez bi ked û inyada xwe li ser lingan bimînim û bi imkanêne xwe Nûdemê bidomînim.

Di peryoda pênc salên nû de, ji bo ku cih ji gelek nivîskaran re çêbibe min rûpelên Nûdemê jî zêde kirin. Lê zêdebûna rûpelan hem di aliye çapê de, hem jî di aliye postê de ji bo min bû bargiraniyeke mezin. Ji bo ku ez vî barî sivik bikim û vegerim fikra destpêkê, min biryar da ku ez kovarê bibim Tirkîyeyê û pênc salan jî li Stembolê derxim. Min xwe wilo konsantre kiribû, enerjiyeke xortane hatibû min û di hundurê bêhêvîtiyê de hêviyeke xurt li ba min peyda bûbû. Lê bi hatina payizê re ewrekî xemgîniyê xwe bi ser jiyana min a taybetî de girt, destê min li kar sist kir, hêviya min cilmisand, ez dilşikestî kirim û bû sebeba ku Nûdem bi tenê di dehsaliya xwe de bimîne.

Spasî

Berî ku ez dawiyê li gotina xwe bînim, ez dixwazim ji dil spasî hemû nivîskarêne vê hejmarê bikim û herweha spasî hemû nivîskar, rewşenbîr û xwendevanêne kurd bikim ku wan bi piştgirî û dilsoziya xwe kirin ku ez deh salan kovarekê derxim. Heger min di pêvajoya van deh salan de dilê hinan hiştibe ez ji wan doza lêborînê dikim û yên ku dilê min hiştine jî ez ji dil wan efû dikim. Lê, ez ê bi dawlanîna Nûdemê jî qada edebiyatê venekişim, dibe ku ez bi awayekî hê xurttir têkevîm nav cîhana edebiyatê.

Niha bi xatirê we!

Dehsaliya NÜDEMê

ROJEN BARNAS

Nûdem dibe deh salî, li çande û edebiyata kurmancî pîroz be û bi hêviya jiyanke bi çendîn dehsalên dîtir.

Deh sal: çar cara deh dike çil; çil hejmar kovar... Her hejmarek ji 120-130 tûpelî û ji 20-25 nivîsaran diçe li kuderê dikeve? Ez giliyê bêhejmar pirtûkên rexberhemên wê nakim û Fîratê bi tena serê xwe ku hem xwedî, hem redaktor, hem nivîsvan û hem bişkûrî...

Nûdem pêwistiyek bû û wek kovareke edebî-çandeyî hêjî ji nivîsara kurmancî re pêwistî ye.

Kovara edebî; ziman, bi taybetî jî zimanê nivîsandinê pêşye dibe. Bikaranîna ziman û stîla nivîsanê bi danûstana wê siviktir, herikandîtir û xweştir dibe. Bi vê riyê ebra tesewir, xeyalkirin û fikirînê ferehtir û kûrtir dibe. Bi xwe re nivîskarên nû diğihîne, besta yên heyî li nivîsandinê hildike.

Kovara edebî meydana bihevguhastin û hevnaşına zewq û rengên edebî yên cihê-reng e. Di wan de meriv çêjên nû dinase û bi ser rengên cuda vedibe. Herwisa ew cîgeha rastîhevbûna edebiyata kevin û nû, ya biyanî û xwemalî ye.

Hin ji wan di edebiyatê de li pêş xwe çexerên nû vedikin ku ev çexer bi xwe re têgehek û bergehek nû tîne cîhana edebiyatê.

Edebiyat bi xwe şîraniya jiyanâ entellektuelî ye û ya nivîskî neynika bidestgir a zewq, reng, fikir û tesewira neteweyî ye. Herwisa neynika herî bi hêztira binasîndaya gelekî ye jî. Hêza meriv a aborî her tim dest nade ku meriv here li welatên ci-

hê cihê bigere û gelê wan binase, lê bi rêgeha berhemên edebî meriv li mala xwe di-kare rûnê û bi nivîkarê edebiyatê re li welatê wî bigere: Bi Homerîs re li Yûnana antîk, bi Nerûda re li Amerîkana Latîn, bi Pûşkin re di nav serhildana Pûgaçev, bi Şoloxov re li kersaxêن Donê, bi Aytmatov re li şafirêن Asya navîn, bi Steinbeck re li nav peyzanoyêن Amerîkayê, bi Balzac re li Fransaya sedsala 19an, bi Ereb Şemo re li zozanêن Elegazê û deşta Rewanê bigere; bi kesêن wan re bikene, veciniqe, hêrs bibe, bikeve mitala û bigirî.

Ev hêza giyanî ya nexuyanî ku gelên hevnedîtî bi hev dide nasîn û hezkirin ji ser-kaniya edebiyatê tê. Bêdera edebiyatê jî îro kovarên edebî ne.

Nûdem jî di warê kurmancî de kovareke wisa ya hêja ye. Xwedîpêñûsên cihê ci-hê yên deverên cografik ên ji hev dûr, yên ji dîtinêni siyasi yên cihê tê de dinivisi-nin. Bi tenê nanivisînîn, ji hev kelk jî digirin. Ez her hejmarê bi mebesta sûdek jê-hilanîne ta ku zemanê min dest bide dixwînim û bi kêri min tê jî; pê bêjezaniya xwe teze dikim, hin tiştên nû hîn dibim.

Pêdiviya min bi kovareke edebî ya kurmancî ya bi vî rengî bi kalîte û tekûz hebû û hê jî heye. Xwezî ku ev ji mehê carekê derketa.

Gotin hêsa lê kirin zor e. Ji bona jiyana kovarekê divê:

- a) Xwestinek ji dil û bi dîşiplîn,
- b) Sermiyanê nivîsarî,
- c) Hatiniya darayî (finans) û bazar (lêpirsîna xwendevanan) hebin.

Xwestina ji dil û bi dîşiplîn a xwedîlyê kovarê bêguman heye. Sermiyanê nivîsarî jî ne xirab e, roj bi roj çêtir û zêdetir dibe. Lê hatiniya darayî û bazar? Bi gotina Xanî "kesad e bazar" û "nîn e xerîdar".

Nûdem hatiye devê neqebekê. Bi ya min divê ku li riya xwe ya weşanê bikudîne. Pêdiviya me pê heye.

Bi hêviya jiyana gelek dehsalêن dinê jî. □

NÜDEM malbatek e

ENWER KARAHAN

Ez bawer dikim ku min cara pêşî Nûdem, di sala 1993an de li ba hevalekî dîtibû. Min heta wê demê tu salixên eschî ji xwedî û berpîrsiyarê wê Firat Cewerî nestendibû. Ji ber ku min ev camêrê hanê ji salên hefteyî de nas dikir û ew bi vê hewesê, bi çol û çepelan ketibû. Di wê dema ku min Nûdem dît, di warê bikaranîna kurmancî de, tavliheviyeke bê ser û ber hebû. Tu nema bû ku ev kurmanciya ku em îro pê dipeyivin û dinivîsinin, bi awayekî texlîtbihata guhertin.

Di reaksiyona pêşî de ku min ew dît û min hin tekstên wê xwendin, zingîniyek ji serê min hat û min li cem xwe got, "A ev ha, kurmanciya me ev e!" Min pir hewil da ku ez wê hejmara Nûdemê ji wî hevalî bixwazim, lê min qêmişî wî nekir. Ji ber ku wî jî bi qasî min xwendina tekstên kurmancî meraq dikir û jê hez dikir. Min derhal navnîşana wê li ba xwe nîvîsand û mìn di qucikeke cuzdanê xwe de bi cîh kir. Min hîn firsenda ku ez bikaribim ji wê navnîşanê re nameyekê binivîsinim û him salîkekê ji Firat hilînim û him ji Nûdemê jê bixwazim nedîtibû, ez hatim girtin. Di esnaya girtina min a vê carê de, gava polîsan alavênu ku bi min re hebûn ji min distend de, ez li wê qaxtera ku navnîşana Nûdemê li ser bû haybûm. Di navbereke ku min alavênu xwe datanî ser maseyê, min hemû rîska ku polîs bikaribe bibîne ji da ber çavênu xwe û min ew perçeyê qaxetê di destê xwe de qermiçand û min ew avêt devê xwe û min ew necûtî daqurtand. Bi vî awayî ez ji girtina wê kaxizê xelas bûbûm, lê min careke din Nûdem bidesit nexist û navnîşana wê pêde nekir.

Berî vê girtinê jî bi salekê, li eynî qereqolê û li vî ciyê ku alavênu min ji min diha-

tin sitendin, dîsa ez girtî bûm. Ber êvarê bû. Dengê polisan dihat û ji hev re digotin ku du kesên swêdî bûnîn mîvanê me. Wexta ku polisan ez birim ifadeya dawî û paçikê ku pê çavê min girtibûn piçekî bilind kirin da ez qaxetê imze bikim, min serê xwe piçekî bilind kir... Bi serbilindkirina min re, awirê min û Fîratî pişî 13 salan di nav destên polisan de li hev ketibûn. Ew û jîna xwe bi hev re hatibûn girtin. Ew bi mebesta ziyaretkirina mala me hatibûn Dêrikê û gava ji mala me vege riya bûn, ji terefê polisan ve hatibûn girtin.

Pişî ewqas sal firseta ku em hevdu bibînin çê nebûbû û pişî vê girtinê ji hev dîtina me, hete bi sala 1995an nebû qismet.

Sala 1989an, meha Adarê bû. Ez dîsa girtibûm. (Hûn nebêjin qey ez dixwazim qala girtinê xwe bikim. Ji ber ku nasiya min û malbata Nûdemê ne weha bi hene-kan e.) Di wê girtina min de, di hucreya kêleka min de qîzeke ciwan û mîrxas ji hebû. Min ew nedidît lê wexta ku polisan jê re dermanê wê dianîn, dengê wê di-hat. Pişî du rojan hate fahm kirin ku ew ê min derxin mahkemeyê. Li ser vê yeka hanê, bi îhtimala ku ez ê bêm berdan, min li dîwarê hucreya wê xist û min xwest ku gotineke ku ew bixwaze bigîhêne derive hebe, ez alîkariya wê bikim. Bi awayekî zahmet me ji hevdu fahm kir ku ew Omerî ye û ez ji Dêrikî mim. Li ser vê hevna-siyê, wê got ku yekî nasê me zavayê dêrikiyan e, ger tu bikaribî cewabekê bide wan dê baş be. Paşê, ji bo em moralê bidin hevdu, me bi hevdu re û bi awayekî hêdîka marşen kurdî gotin. Lê ez nehatim beradan. Ez ji mahkemeyê birim hefsa Diyarbe-kirê û min ew soza xwe nikarîbû bi cîh bianiya.

Di wê girtina ku min û Fîratî hevdu dît de, ew û pîreka xwe bi hev re hatibûn girtin. Ew kesa ku me di hucreyê de (bêyî ku em hevdu bibînin) hevdu nas kiribû û pişî wê careke din me hevdu nedîtibû, ev pîrek bi xwe bû. Yanî Şneşîn bû. Teva ku li eyîn îşkenceyaneyê ev cara duyem bû ku em di eyîn dezgehan re debas dibûn, lê dîsa ji me hevdu rû bi rû nedîtibû. Teva ku ew bi dostê minî nêzîk re zewicî bû û min navê wê li keça xwe kiribû ji pişî nasiya pêşî bi şes salan, me cara pêşî, li An-qereyê, li avahiya HADEPê hevdu dît. A êdî ji wê tarîxê û bi şwîn de, car carna Nûdem kete destê min... Û heta bi sala 1997an ku ez hatim Swêdê...

Bi baweriya min, derketina Nûdemê û berdewamiya wê ya biñnad ku ev deh sal in bi hêl û mîl derdikeye, ji bo dîroka edebiyat û çanda kurdî qezenceke mezin e. Ger pişî 30-40 salêñ dinê li ser Nûdemê bê nivîsandin dê bi pesindayineke bêqiyas bê nivîsandin. Helbet mirov dixwaze ku Nûdem di dîroka edebiyata kurdî de bibe ekolek. Ew bi xwe pêşengiyeke di vî warî de bike. Ev daxwaza mirov e, lê daxwazî û rastiya jiyanê ne wek heve.

Ez Nûdemê dişbînim wek malbateke kurdûnda di nav eşîreke mezin de hebe û piştî çend salan ji wê malbatê re ewledek çêbibe; dê ew zarok bi kîjan delaliyê rabe û ew malbatê bi kîjan qedir û qîmetê lê binêre; divê kurd jî bi delalîbûna wî ewledê malbata kurdûnda û bi qîmeta ku ew eşîra dê bide wî zarokî, divê kurd li Nûdemê binêrin. Heger bi rasîjî bext û şêkirandina mirov hebe, divê ev zarokê/a ku di vî dehsalî de bi vê delaliyê û bi vê itinayê mezin bûye biparêzin û ji bona ku ev zarokê/a di dehsaliya xwe de emirqutî nebe û bi silametî û bi vê delalîbûnê bighêje bîst saliya xwe, ci ji destê wan bê bikin. (Ez dibêjim bila ev zarok nêt be, ya nana ger bighêje 14 saliya xwe rîhsipî dikarin wê bide mîr!)

Di vê dema ku kurdî di ber sîkratê de ye û kurd ji her demê bêtir bêmoral û bêtaqetin de, wazîfeyek mezin li ser milê hemû kurmancîaxêf, xwendavan, nivîskar û siyasetmedarên kurd dikeve ku hêjayiyêni bi vî rengî biparêzin û xurt bikin. Îro, sembola li dijî sistêma înkarkirin û mehandina milerê kurd derketinê, biñnad parasatin û bikaranîna zimanê kurdî ye. Ji bona min, li dijî vê rewşa xirab û li dijî xwestînê kurdan bi sistêmê re pînekirinê derketin, bikaranîna zimanê kurdî bi xwe ye û ev helwesteke siyasi ye. Her çiqas Nûdem ne kovareke siyasi be jî xwerû bi kurdî bûyina wê û alîkariya wê ya bi pêş de xistin û teşwîkkirina ziman, çand û edebiyata kurdî, roleke wê ya girîng heye û divê ji bo vê rola wê, mirov wê geştir bike. Di hin deman de, bi dehan kovar û rojnameyên kurdan (Çi bi tirkî û ci bi kurdî) hebûn, lê di vê dema ku diviyabû ji her demê bêtir kovar û rojnameyên bi kurdî derketina de, li piyaseyê (Him li derveyî welêt û him li nav welêt) tiştek nemaye.

Proseseye bi zaneyî û bi hosteyî bi rê ve tê birin û em jî bi awayekî îndîrek di nav vê çerxê de nin. Loma ez dibêjim divê mirov weke ronahiya çavên xwe Nûdemê piparêze. Ji ber ku Nûdem bûye navnîşaneke ku ji hemû entelektulên kurd û ne kurd re ciyê şêwr û mişêwrê. Loma ez dibêjim, Nûdem ne bi tenê kovarek e, ew malbateke û malbateke bi sala kurdûnda maye û îro xwedî ewledeke salih e. □

06-06-2001

Hevalê hêja kek Firat CEWERI

Te... bi Kovara NÜDEM canê Bedirxaniyan
şad kir û xwinike teze da rojnamevaniyan
kurdi.

Min guman nine ku diroka rojnamevaniya
kurd - bê gili, gotin- dê deriyê. Xwe ji
NÜDEMê ra veket û bi germî. himbêz
ketin.

Ez bi germî destê te digivêsim,
piroz bâhiya te dikim û ji NÜDEM ê
ji re temenekê dirêj dixwazim.

Birayê te

~~Muayyed Teyib~~

3/8/1992

Katrineholm

Nûdem bû pêpelûk û dergehek ji bo nivîskaran

BERKEN BEREH

Pêşî dehsaliya Nûdemê li we û li gelê kurd pîroz dikim û serkeftinê dixwazim. Bi gora ez dizanîm li derveyî welêt kovara herî kevn û têrtije Nûdem e. Ji ber ku Nûdem ferqiyet nexist navbera kesên ku li ser çand, ziman û wêjeya kurdî dixe-bitin roleke girîng list. (Nemaze ji bo nivîskarêñ li bakurê welêt dijîn). Nivîsên cu-re cur hatin weşandin û bi vê rîyê me karî nivîskarêñ xwe binasin û xwe derbi-bin. Tiştekî din ya girîng me hemwelatiyêñ xwe yên li parçê din dijîn naskir û di aî derûnî û ramanê de em nêzîkî hev bûn. Bandora zimanê dagirkieran bi vê rîyê qelstir bû li ser nivîskaran. Roj bi roj binhişa me ji bandora zimanê dagirkir dûr ket. Nivîs, berhem bêhtir bi rengêñ kurdevarî hatin xemilandin. Di aî mijar, teşe, şêwas, hêma û hwd de di nav nivîskarêñ kurd de hevbeşiyek çêkir. Wekî din bi riya Nûdemê nivîskaran karî xwe bigihîjîne her derê ku kurd lê dijîn. Ev bawerî, ev de-rûnî asoya nivîskaran firehtir û bi hêztir kir. Lewra dema yek nikare nivîsên xwe bi-weşîne wê hêdî hêdî destê xwe ji nivîsandinê dûr bixe. Nûdem dîsa ji bo zimanekî yekser û standard ji roleke girîng list. Nivîskar bi nivîsên Nûdemê li devokêñ din jî haydar bû. Heta jê hat xwe ji devoka xwe dûr xist. Bi kurtasî dikarim bibêjim di toreya me ya nûjen de Nûdem bû pêpelûk û dergehek ji bo nivîskaran. Bi dilxweşî dibînim ku di her hejmarek nû ya Nûdemê de rastî nivîskarekî têm. Ez ji bo vê xe-bata we ya pîroz spasdar im û serkeftinê dixwazim.

Beriya ku ez pirsa kengê li kovara NÜDEMÊ rast hatim bîbersivînim dixwazim hi-

nekî behsa rewşa civata me ya 20 salan bikim. Wek ku ez dizanim kovara bi zimanê kurdî (xwerû) di sala 1980 de hate weşandin. Ew jî ne şâş bim ji bilî du hejmaraan ne gîhîst destên nivîskarên li bakurê welêt dijîn. Di salêن beriya cuntaya 1980 yî de hejmara kesêن ku li ser ziman, çand û wêjeya kurdî radiwestin bi tiliyan dihate hejmartin. Wan jî ji ber bandora rewşa siyasi û politikayê hema bêje wext nedîtin ku li ser karê nivîsandinê têra xwe rawestin. Tiştê herî balkêş û seyr jî pirtûkên bi zimanê kurdî hatine weşandin bi zêra jî mirov ne dikarî bi dest bixe û tunebûn jî. Tu têkilî, danûstandin di navbera nivîskarên her çar perçeyên Kurdistanê de nebû û kesî kes nas jî nedikir. Li sazî û komeleyên me kurdan xwedêgiravî me xebat û doza mafêن xwe yêن netewî dikir lê bi hiş û zimanê dagirkir. Piştî cuntaya 8oyî het-a salêن 9oî ji ber pest û pêkutiyêن dagirkiran û tunebûna weşanên bi zimanê kurdî hema bêje kesêن keda xwe ji bo çand, wêje û ziman dirêjandin çend kes bûn. Hinek ji wan jî berê xwe dabûn Ewropa û ji welêt dûr ketibûn. Ez bi xwe jî hatibûm nefîkirin û berê min dabûn derya reş.

Piştî çar salan, di sala 1994an de ku me karî em vegeerin ser axa xwe bi rêya ku hinga bi navê Welat, Welatê me, me saloxa Nûdemê bihîst. Ji ber sedemên hevne-nasînê û qedexeya li ser weşanên bi zimanê kurdî (li bakurê welêt) encax di dawîya sala 1997an de ez rastî Nûdemê hatim. Rebiyo ew ci roj bû! Tu car ji bîra min na-çe. Hevalê ku kovar gihande min bêyi ku ez jê re spas bikim wek pitika bi rojan birçi mabe û xwe avêtibe ber pêşîra diya xwe min dest bi rûpelên Nûdemê kir û min pêşî wergerand û piştre xwend. Hevalê min paşê ji min re got ku neh-deh caran milê min girtye kişandiye û ez bi xwe nehesiyarme. Piştre min ew kovar bi xwe re anî welêt. Hevalek ku ez pê bawer bûm dizanî kurdî bixwîne û binivîse min kovar dayê lê mixabin wî êdî ew li min venegerand û bi gotina wî di şevez ku leşkeran li taxa wan avêtine ser malan wan kovar ji holê rakiriye.

Çiqas min xwest jî ji ber ku navnîşana kovarê li ba min tunebû û li derdora ez dijiyam keseki/e ku li ser toreya kurdî dixebite tunebû heta sala 1998an min nekarî Nûdemê bişopînim. Lê min ji xwarin û vexwarina xwe hinek kêm kir û min bi diravên ku berhev kiribûn ji xwe re computerek stend û tîna xwe ya salan bi rêya internetê av da.

Bi rastî hêza ku NÛDEMê da min nayê bilîvkirin. Bi salan ez bi hesrera peyvek kurdî jiya bûm û va kovarek xwerû û bi zimanê kurdî û nemaze li ser wêje, çand û zimêن radiweste li ber destê min e. De ji vê ya dîlxweşîr, hêzdarfir tiştek heye gelo? Bi kurtaşî dikarîm bibêjîm; mirov bi rojan li bin tava havînê û sehreya mezîn bi darekê ve bê girêdan û bê vexwarin bimîne, piştre yek were werîsê mirov pê hatiye gi-

rêdan biqerîne û erbikek tije bi berfeava çiyayê Herekolê hatiye dagirtin bide mirrov.

Berxwedan û raperîna li bakur ya van 15 salêن dawî, bi weşana rojname û kovarêن li bakur co, hêz û hêviyekê mezin xistibû nava dilê min. Lê tim me ji kesên koçberî Ewropa bûn gazind dikir. Çima li ser ziman, çand û wejeyê serê xwe naêşînin û naxebitin. Lewra şert û mercen wan bêhtir guncaweango tu astengî li ber wan nîne (bi qasî me). Nûdem di alî hevnasîn û têkiliya di navbera nivîskar û wêjevanêن kurd yên li her derê dînyayê bû pir û sînor hilweşandin. Bi rîya Nûdemê em ji bin bandora zimanê dagirkaran xilasbûn. Hiş û mejiyê me kurdan nêzîkî hev bû. Em gîhîstîn berhemêن kekêن xwe yên di pêşıya me jiya ne, em li ser jiyan û rewşa birayêن xwe yên di perçeyêن din de xwedî agahdar bûn. Dema mirov li berhemêن vê dawiye hatine aferandîn kûr hûr bibe dê bê xuyakirin ku ji alî naverok, wate, teşe û hêmayan de nêzîkiyek çêbûye. Ez dikarim bibêjîm Nûdemê di nêzîkîyîde roleke girîng lîstiye. Ji aliye din ve wek hemû kovar û rojnameyêن din Nûdemê jî ji bo yekseniya zimêن jî tol lîstiye. Anglo ji bo zimanekî bi rêk û pêk rûpelêن xwe bi kar anîye.

Ji ber ku di navbera nivîskaran de cûdatî nekiriye û cih daye hemû berhemêن hêjayî û xwedî nirx e, di asoya toreya me de rê vekiriye ku berhemêن cihêreg bibêhn û tahma xwe derkevin ser rûyê erdê û ji hev sûdê werbigirin.

Wek dawî dikarim bibêjîm NÛDEM ji bo wêjeya me ya nûjen bûye dergehek û ez hêvîdar im ku dê bi sedan nivîskar, helbestvan, dîrokzan... li vê dergehê xwe bikemiline û bi serbilindî di wêjeya cîhanê de cihê xwe bigire. □

Kovara Nûdemê bi awayekî xurt li hemberî pêla asîmîlasiyonê radiweste

WEZIRÊ EŞO

Kovara NÜDEM bû 10 salî. Ev ji bo dîrokê zemanekî pir kin e, wek êmê ba-wîşk bê mirov. Gava dewlerên dagirkerên Kurdistanê weşanên kurdî, weke dibêjin, rojê carekê qedexe dikan, jimarên rojname û kovarên kurdan û kurdî dici-vînin, wekî mirovan zindan dikan, ev 10 sal zemanekî dirêj e. Xêن ji wê, bala xwe bidin dîroka rojnamegeriya kurdî, ya weşandina rojname û kovarên kurdan û kurdî. Kovareke wek Hawarê, ku li Kurdistanê û derveyî Kurdistanê evqasî deng da û şopeke herî kûr ne ku tenê di dîroka rojnamegeriya kurdî de, lê bi giştî di edebiyat û çanda kurdî de hişt, weke dibêjin, serî-binî 11 salan (1932-1943) hate weşandin. Helbet sebebên vê yekê ne bi tenê zor û zilma dagirkaran e. Derveyî Kurdistanê jî, heta li welatên rojava yên demokratîk jî, jiyana kovar û rojnameyan demeke pir di-rej berdewam nake. Bêguman, sebebên vê yekê yên dinê jî hene. Ji kêmasiya bingeha madî bigire heta ya kurdên zane û dileş, êdî ez derheqa kêmasiyên xwendevanan de nabêjim, ku pirsgirêkeke jiyana me kurdan ya bi êş û jan e.

Em niha li ser pirsgirêka tunebûn, lê rasttir kêmasiya kurdan û xwendevanan rastevin. Politîka nasnekirin û tunekirina miletê kurd berê xwe yê xerab û tal dide. Giliyê min li vit ne ku bi giştî di derheqa tunebûn yan jî kêmasiya kadroyen kurd yên zana, pispor û xwendevanên kurd de ne, lê di derheqa kêmasiya kurdên rojnameyan de ne, yên ku bi kurdî diafirînin û xwendevanên kurd, ku bi kurdî dixwînin.

Gava ez dixwazim îro konkret Nûdemê binirxînim, ji bo min pîvana nîrxandinê

ev e: gelo kovara Nûdem û xwediyê wê çiqasî milet û welêt didin ber çavan û çiqasî li gora wê rewşê karê xwe dimeşînin. Di vê rewşa kambax de weşandina kovareke xwerû bi kurdî ne hêsan e. Ne ku bi tenê ne hêsan e, lê gava em dibînin ku ev kar bi tenê ji aliyê Firat Cewerî ve tê meşandin, ev karekî pir giran e û nimûneyeke nedîti ye. Firat Cewerî bêî redaksiyon û cîgir ev deh sal in ev kar bi rêk û pêk meşandîye û ev kar ji wî re bûye rûmetek, ji me re jî bûye cihê kêfxwêş û serbilindahîyê. Bêguman ji bo meşandina karekî wisa girîng hewcedarî ne bi tenê bi pisporî, zanebûn, zîrekî û welatevîniyê heye lê hewcedarî bi îradeyeke xurt û karkirineke bi heyecan ji heye. Ev jî li ba Firat Cewerî heye û xurt e. Bi ya min Nûdem ne bi tenê kovareke xwerû bi kurdî ye, lê zimanê wê jî zimanekî standart, rast û edebî ye. Di vî warî de berpirsiyarê Nûdemê Firat Cewerî xwe spartiye Hawara Celadet Bedir-Xanê nemir, hem di warê zimên hem jî di warê rastnivîsandinê de tradisyonâ wê kovarê dom dike. Ü Firat Cewerî vê yekê venâşêre, bilekis, ew bi serbilindî xwe wek peyhâtî û sagirtê Celadet Bedir-Xan dibîne. Ev yeka jî, di nav rewşa weşanên kurdî yên îroyîn de tiştekî pir mihîm e.

Ji aliyê din ve kovara Nûdemê bi awayekî xurt li hemberî pêla asîmîlasiyonê radiweste, birêz Firat Cewerî vî karî bi awayekî profesyoneli baş dimeşîne.

Wî mîna gelek kurdan kovara xwe bi tirkî an jî bi zimanekî din dernexist, lê xwerû bi kurdî û bi kurdiya xwerû derxist.

Gelek kurd dibêjin xwendevanên zimanê kurdî nînin loma divê em weşanên xwe bi tirkî derxin. Gelo di dema Celadet Bedir-Xan de hejmara xwendevanên kurd ewqasî pir bû, ku Celadet kovara xwe bi kurdî derxist? Qet jî na. Dema ku Hawar bi tipêñ latînî dihat weşandin, Türkiye hê nû dev ji alfabeşa erebî berdabû û derbasî alfabeşa latînî bûbû. Em dikarin bê şikberî bibêjin ku gava dest bi weşana kovara Hawarê bû, ji xêti çend ronakbîrên kurd haya kesî zêde ji alfabeşa latînî tûnebû. Lê di nava vê rewşa giran de Celadet Bedir-Xanê mezin û dûrdîti di Hawara xwe de alfabeşa latînî bi kar anî. Wî bi wê helwesta xwe gelek zehmetî kişand, lê dawî bi ser ket. Em nabêjin ku wî hemû kurd kirin xwendevanên Hawarê, ev tiştekî nebûyî bû. Lê Hawara wî şopeke kûr di nav dîroka ziman û edebiyata kurdî de hişt û tro jî ji me kurdan re bûye çavkaniya fîrbûnê.

Gava em nedin ser şopa Hawarê û weşanên xwe bi zimanên serdestên xwe derxin, gelo em hingî bi serdestên xwe re gelê kurd asîmîle nakin? Belê, em dikin û pir baş jî dikin. Lê Nûdem, lê berpirsiyarê wê? Ew, şikir ji Xwedê re karê xwe yê weşandina bi kurdî û parastina kurdîtiyê berdewam dikin. Ü ne bi tenê karê weşandina bi kurdî. Weke tê bîra min kalemêri, Nûdemê jimareke xwe ya taybetî jî pêşkêşî

zimanê kurdî kir. Nûdemê û berpirsiyarê wê li hemberî asîmîlasiyonê dan dû şopa Hawarê. Ev ji bo wan rûmeteke bilind e.

Nûdemê çend caran li ser rûpelên xwe gotûbêj, giftûgoyêñ di navbera ronakbi-rêñ kurd de, nemaze nivîskarêñ kurd de bi fotoyêñ wan weşandiye. Ev tiştekî pir baş e, lê xwezî Nûdemê hebekî guh bida rewşa gel û xwendevanan jî û carinan ni-vîs û giftûgoyêñ li ser wan jî cihê xwe tê de bigirtana.

Ez di dawiyê de dixwazim vê bibêjim ku berpirsiyarê Nûdemê birêz Firat Cewerî piştî weşandina kovara xwe bi 10 salan jî bi heyecan kar dike. Wek min di nava salan de tecrube kiriye, ew nêt û merem û armanca jiyana xwe di nava weşandina Nûdemê de dibîne. Wek kifş dibe, Firat Cewerî bîryar daye ku emir û jiyana xwe bide ser weşandina Nûdemê. Ez ji bo vê daxwaz û armanca wî jê re serketinê dixwazim, ji ber ku gelê me yê bindest hewcedarî vê yekê ye. Loma ez ji Nûdem û xwediyê Nûdemê re jiyaneke dirêj dixwazim. Hêviya min heye ku wê ev xwestina min bi cih bê, ji ber ku Nûdem û berpirsiyarê wê hê ciwan in, beng benga wan e.

De bila ew bi hev re kal û pîr bibin. □

Nûdem bi sihemîn hejmara xwe li pêşberî xwendevanan e



Kovara hunerî, edebî û çandî Nûdem, bi hejmara xwe ya 30.emîn derket pêşberî xwendevanan. Weki hejmaren din di vê hejmara kovarê

ye.

Di hevpeyvîna ku ji cil rûpelan pêk tê de her aliyê hunermend Şîvan Perwer li ber çavan hatiye ra-

de ji nîvîsên cur bi cur hene.

Hejmar bi hevpeyvîna digel Şîvan Perwer dest pê dike. Hevpeyvîn ji hêla Editôrê Nûdemê Fîrat Cewerî ve hatiye pêkanîn û bi besdariya Mahmût Baksi rengîntir bûye. Cewerî, di sergotara xwe ya bi navê "Efsaneyâ Şîvan" de Şîvan weki efsaneyekê bi nav dike û diyar dike ku ev sohbet piştî çûyîna Abdullah Öcalan a Romayê û berî teslimdayina wî ya Tirkîyê pêk hatiye.

xistin. Hevpeyvîn bêhtir bi awa-yekî sohbetî derbas bûye. Mîrov dikare bibêje ji zarokatiya Şîvan û heta iro hemû pêvajoyêni jiyanâ wî di sohbetê de hatine diyarkirin. Têkiliya Şîvan û müzikê, tever-gerên siyasi û jiyanâ wî di nava rûpelên kovarê de bi berfirehî cih girtiye.

Di hejmarê de niviseke din ku bala mîrov dikşîne ser xwe, nîvisa Fawaz Husêna bi sernavê "JeanJacques Rousseau" ye. Weki ji sernavê nîvisê ji diyar dibe, Husêna li ser zanyarê navdar Russo rawestiyaye. Di nîvisa Fawaz Husêna de bi awayekî portreyî jiyan, berhem, fikir û ramana JeanJacques Rousseau té nirxandin.

Jî bili van nîvisan çend nîvisen ku di hejmarê de cih girtiye ey in: "Pisporekî Wêneyan" Rohat Alakom; "Du ciwan û cinawir" Antti Oikarinen; "Topa Mizizixê" Abbas Abbas; Du şîr ji Osmanê Mehmed; "Roj li me tarî ye" hel-best Dewrêş M. Ferho.

SERWÎSA ÇANDÊ

Ji bo Kovara NÛDEMÊ

XELİL DUHOKİ

Ev name eger xerab e ger qenc
Kêşaye me ji bo wî du sed renc

Ehmedê Xanî

"Gelê ku zimanê wî tune be, ew jî tune ye." Dijminên gelê kurd jî, ev rastiya zaniye, ji lewre jî, rê li ber ziman û rewşenbîriya kurdî girtî ne. Lê dilsoz û xemxorêngelê kurd, xebat û bizaveka mezin kirine û pîlanêñ dijminan şkandî ne.

Di van deh salan de, rola kovara Nûdemê gelek mezin bû. Bi her babetî xemlândî bû. Berdewam hewil daye ku, kovara gelê kurd be û ne ya aliyekê taybet. Fırat Cewerî, bêhîn fireh û toleransa wî hebûye û karê xwe pêş de biriye. Xebata wî, pîroz û hêja bûye, lewre heval û dostan jî, piştgirî û alîkariya wî kiriye.

Derkistina kovarekê, karekî pir zehmet û giran e. Giriftarî û problem mişê ne. Peydakirina peran, ya nivîs û serrastkirina wan, çapkîrin û belavkirina kovarê. Bi rastî Fırat Cewerî, jiyana xwe daye kovarê û di karê xwe de serferaz û serkerî bûye. Di nêzik de, em ê dehsaliya wê pîroz bikin, lê hêvîdar im ku gelê kurd, bîstsaliya wê jî pîroz bike.

Napolyon dibêje: "Ez ji hezaran tank û topan natırsim, lê ji rojname û kovarekê dibehitîm û ditirsim."

Ez bawer dikim ku gelê kurd, pêwîstî bi kovar û rojnaman heye, nemaze kovara NÛDEM ya hêja û bihagiran.

Ji bo pêş ve û her bijîn... □

Dehsaliya NÜDEMê pîroz be!

ŞAHİNÊ BEKIRÊ SOREKLÎ

Di sala 1988an de, di rîwîtiyeke di navbera Stockholm û Oslo de, ez, mabxeya min Robyn û her du lawên me yên wê demê biçûk şevekê li Firat Cewerî bûn mîvan; heke ne şas bim li bajarekî bi navê Karlstad. Wekî gellek kesen xwe bi xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî ve mijûl dîkin pirraniya axiftina me jî li ser rewşa kambax ya edebiyata kurdî ya wê demê bû. Em her du jî di wê baweriyê de bûn ku ji bo pêşexistina ziman û edebiyata kurdî hewcedarî bi kovareke serbiyew hebû, kovareke wisa ku xwe têkiliyê siyaseta partîyan, dahol û zurneya propaganda arzan neke û bi kêmâşî mehê carê bi şêweyekê bedew û berfireh bête weşandin. Bêyî guman meraqkeke wisa dê li nik gellek nivîskar û xwendevanên wan salan hebûya. Wekî Firat Cewerî bi xwe dinivîsîne (Nûdem, hejmar 1: f. 3), "Ev demek dirêj bû ku em li derxistina kovareke hunerî, edebî û kulturi difikirin. Erê, em lê difikirin lê me dernedixist. Her cara ku em bi bin hevalên nivîskar û hunermend re dîhatin ba hev, em bi salan li ser valabiya kovarek hunerî, edebî û kulturi dipeyvin, me li ser derxistina wê pilan çêdikir, me li ser belavkirin û abonetiya wê nêrinêñ xwe digotin, me xweş li hev dianî, lê piştî ku em ji hev vediqetîyan û her kes diçûne malen xwe, me her tişt ji bir dikir, an jî ku me ji bir nekira, me digot, di demek wilo de derxistina kovarek bi vî celebî gelek zehmet e û me derxistina kovarê dîhîte rojêñ pê..."

Hejmara yekem ji kovara NÜDEM di sala 1992an de hat weşandin. Karê Firat Cewerî di derbarê derhanîna kovarê de kîrî cîhê pesindanê ye, lê ji bo min pesindanâ herî bilind ji ber wê yekê ye ku ev bûn deh sal kovar her di dema xwe de derdi-

keve. Ev yeka zor girîng e çimkî di dîroka kurdan de weşanê di katê de derkevin û bidomînin zor hindik in. Gotinê naxwaze ku ew ê hîn baştır û bi nerxtir bûya heke NÜDEM kovareke mehane, yan tew heftane, bûya. Heye ku gellek kes bi cîhnebûna meraqeke wisa bi nebûna kadiran û kêmbebûna nivîskarên berheinhêja ve girêbidin. Çiqa gotineke wisa ta radeyekê di cîh de be jî, ew ne egera herî girîng e. Sedema nebûna kovarêne mehane û heftane ku bi kurmancî û tîpêñ latînî bi kalîteyeke çak bêyên weşandin nebûna xwendevanê bi hejmarêñ mezin e. Hcke kovarek bi hejmarêñ bilind bête kirîn, ew ê ne tenê her bête weşandin, ne tenê hejmarêñ xwe zêde bike, lê dê her weha kalîteya xwe baştır bike, dê pereyan ji bo gorarêñ qenc bide nivîskaran; ew ê bikaribe naveroka xwe berfirehitir bike, ûhw... Her kes ê nebûna van îmkanan bi bindestbûna û besbesbûna Kurdistanê ve, bi nebûna ma-fen mirovahî û siyasetê ve girê bide. Ev jî ne gotineke bêyî hîm û rastî ye, lê aliyekî din jî heye ku xwe bi vê rastiyê ve girê dide. Ew jî ew e ku gelê kurd, wek pirraniya endamên gelên Rojhilata Navîn û welatên li paş manî, gelekî nexwende ye. Wek nimûne bi hezarn kurd li Ewropa hene ku bi kurdî dizanin û rewşa wan ya aborî baştır bûye, lê dîsa jî rûpeleke tenê jî bi kurdî naxwênin. Lê em ji mebesta nivîsandina gotarê bi dûr nekevin û car din li NÜDEMê vegeerin.

Di nav deh salêñ cûnî de NÜDEM ne tenê rûpelên xwe ji nivîskarêñ xwedan berhem re vekiriye, lê fersend daye hejmareke ji ciwanêñ ku nû wek nivîskar hatine holê. Di eynî demê de kovarê gellek berhemên nivîskarêñ biyanî bi rîya wergerandinê pêşkêşî xwendevanê xwe kiriye. Bi saya kovarê mc dikaribûye xwe bigihînin berhemên nivîskarêñ wek Zeynelabidîn Zinar, Rohat, Ehmed Huseynî, Mehmet Uzun, Hesenê Metê, Rojen Bernas, Lokman Polat, Derwêş Ferho, Fewaz Husêñ, Muhammed Husein, Husêñ Hebeş, Tosinê Reşîd, Şerefçan Cizîrî, Bedirxan Epozdemir, Xelîl Duhokî, Arjen Arî, Hesenê Qazî, Sebrî Botanî, Mihemed Dehsîwar, Felat Dilgeş, Mehîfûz Mayî, Laleş Qaso, Suleyman Demir, Sidqî Hirorî, Sabah Kara, S. Unis, Fırat Cewerî û bi dehan nivîskar û rewşenbirîñ din. Kovarê em her weha haydarî gellek pirsên xwe bi ziman û edebiyata kurdî û cîhanî ve peywendîgir dîkin kirine. Çiqa cîh ji bo pêşveçûnê hebe jî, ev karê di van deh salan de hatî giran ne tiştekî hindik e. Ji lewre, mirov dikare bi hêsanî bibêje ku NÜDEMê di pêşvebirina nivîs û edebiyata kurdî de roleke piir girîng leyiztiye. Rûpelên wê dê ji bo nifşen pêşerojê bibin çirayeke ku ronahiyê diavêje ser qonaxeke girîng ji qonaxa nivîsandina bi zimanê kurdî, wekî ku kovara RONAHÎ ji bo nifşê me rola xwe ya girîng leyiztiye.

Ji bo xwediyê kovarê cîhê pesindanê ye ku wî dikaribûye NÜDEMê serbixwe û

ji bo amancê destpêkê ta gađeyeke mezin dilsoz bihêle. Tiştekî wisa di nav deh salên borîn de bêguman ne hêsan bû. Li gel hemî aliyên erêni yêñ kovarê jî, ew dikare bi naveroka xwe hîn bedewtir û dewlemenditir bibe, lê ji bo ku mirov hêvi û daxwazeke wisa ji kovarê bike divê mirov rastiya rewşa kurdan bide ber çav. Ji bo bicîhkirina hêvi û daxwazan, ji bo pêkaniya derhanîna kovareke edebî ya mehane, yan tew heftane, pere divên. Lê pere bi serê xwe jî nikarin serkeftina kovarekê misoger bikin. Heke hemî rûpelên kovarekê bibin rûpelên zêrin, lê xwendevanêñ wê zêde nebin ew ê dîsa jî di derbarê bidestexistina amanc û encaman de ne yeke bi tevahî serkeftî bêt. Heke em ji NÜDEMê bipên ku bibe xwediya bedewtiyeke rengîntir û leyiztina roleke mezintir, wê demê divê em berî her tiştî wê hêviyê bikin ku xwendevanêñ wê zêde bibin. Zêdebûna hejmara xwendevanan jî ne tenê bi kovarê bi xwe ve girêdayî ye, lê bi rewşa gelê kurd ya gelempar ve jî. Ji lewre kurdan hewcedarî bi cîhgirtina guftûgo û tevdêran heye, ka mirov çawa bikaribe meraqa xwendinê li nik endamêñ vî gelî kûrtir bike, ka mirov çawa bikaribe nifşê nû fêri xwendina bi zimanê kurdî bike... Heke pirraniya kurdan fêri xwendina bi kurdî nebin edebiyata kurdî dê di rastiyê de tenê di nav hejmareke bi sînor ji nivîskar û rewşenbîrêñ ku bi kurdî dixwînin de bimîne.

Li gel hemî kêmasiyêñ me jî NÜDEM dikaribûye xwe bi dirêjiya deh salan zindî bihêle û findeke din di nav şevreşîya xwe avêti ser ziman û edebiyata me de vêxistî bihêle. Ji bo wê û hemî kovar û rojnameyêñ bi zimanê kurdî têyên der piştgiriya aborî û moralî divê.

Hêvîdar im NÜDEM di deh salên li pêş de xwe bigihîne serkeftinêñ hîn mezintir û di sal 2012 de bîstsaliya wê di nav rojêñ ji bo gelê kurd bextiyartir û ji bo ziman û edebiyata kurdî bi hêvîtir de bête pîrozkirin. □

NÜDEM bûye ekolek

EVDILE KOÇER

W^eke ku tê zanîn, derxistina kovarêن edebî, çandî û hunerî ne hêsan e. Kovarek, ne tenê bi saya firotin û naveroka xwe li ser piyan dimîne; her wiha jê re hezkirin, xebat, bawerî û sebebî divê. Eger ku ev kovar bi reng û dirûveke zanyarî û bi hişmendiyek profesyoneli derkeve û bivê weşana xwe bidomîne wê barê wê girantir bibe. Vêca ku kovareke wiha, mecbûr bimîne ku di nav dirî, strî û keleman de bijî wê ev kar zortir jî bibe; bêbavî û nezaniya heyî wê her gav jê re bibin astengên herî mezin. Kovarêن bi vî rengî li ber van derqanûnan gelek caran têk jî çûne -weke HAWAR- û serê xwe dane haziran. Lê ev têkçûn her dem bi mîranî bûne û ji pêşerojê re bûne bingehek xurt.

Gotina dawî min divê ez vêga bibêjim: Ku tişteke wiha bi serê Nûdemê de were, ne tenê hin kes em ê hemû tev de bixusîrin. Erê rast e, em hînê dubarekirina jiyanê/dîrokê û têkçûnen rojane jî bûne; lê girtinên wiha bi gotineke rasttir wê bibe têkçûna pêşeroja zarokên civaka me. Divê em dîsa li xwe vegerin û rast bibêjin: Pêdiviya me bi ci heye? Em di kêderê de şâşî û xeletiyen dikin? Em ci dixwazin? Ma qey ronahiya ku ji me hemûyan re lazim e, hinekî jî ne di nav wan rûpelan de ye. Muzîkjenek, sîyasetmedarek, şanogerek, rewşenbîrek, xwedîmiqamek û hwd, ku kovarêن bi vî rengî bişopîne û bixwîne, ma qey wê ji bo pêşeroja gelê xwe ne tiştên çêtir biafirîne... Li şûna hinek tiş miştîn beredayî, ku çend pirtûk û kovarêن kurdi jî bikevin mala me û zarokên me bi wan ve mezin bibin, ma qey ne baştir e. Ez mereq dikim, nexwe gelên pêşketî dema ku xwe didin ber tavê jî ci re kovar û pir-

tûkan dixwînin. Û tişta herî sosret jî ev e: Heta merivêن biyanî jî, ji bo ku ji çand û hunera me tahmê hilînin, hînê zimanê me yê şerîn dibin û di ser de jî spas dikin; lê em... em jî hema bêje ji kaniya ber xwe direvin û diçin di cîrnîkên cîranan de ava şîlo vedixwin... Zimanzanêن mezin ji mêt ve gotine: Yê ku zimanê xwe baş nizanibe, wê zimanekî din jî nikaribe baş hîn bibe.

Dema ku ez van gotinêن hêja û gotinêن wekî "geldix, yaptix, yedix, çikdix, git-tix..." didim ber hev, ez aciz dibim. Aciziya min dibe henek û ez êdî di nav "arqa-daş" an de dibêjim: Saziya zimanê tirk(TDK) li sazî û bajarêن kurdan ahaftina bi tirkî qedexe kir. Gelo, ji bo ku em hişyar bibin divê tiştek wiha bê kirin.

Heya ku girîngiya ziman, çand, huner û edebiyatê bê fêm kirin, ma qey em mecbûr in heta piştî helandina çend nîşen din jî bisekinin. An jî qey vê girîngiyê wê hikûmetêن Enqere/Bexdat/Tehran/Şam/Ewrûpayê bi me bidin fêmkirin. Ji bo netewekê ev xalêن hanê çiqas girîng in, jixwe gelek kes dizanin. Ji bo ku em dîsa posman nebin û em dîsa serê xwe li keviran nedin, divê em li kovarêن wiha xwedî derkevin. Ji ber ku kovarêن wiha ji civaka me re dibin deriyê zanebûn û hişyarkirinê. Gelek mirovan digihînin, di civakê de valahiyên mezin dadigirin û dibin çira. Ji gelek nivîskar û intellektüelan re jî dibin dibistanek; dibin cihê azmûnê.

Bi taybetî Nûdem, di warê xwe de bûye ekolek. Cihê wê zû bi zû nayê dagirtin. Riya pêşketin û serkeftinê yek e. Ji bo ku ev rê ronî bibe hişyarkirinek, hewldaneke xîretkêşî û seferberiyeyeke mezin divê. Bi tevî cûdahîyan, berjewendiyêن me hemûyan jî di vê riyê de diborin. Kovara Nûdem jî, ev deh sal in ji bo ronîkirin û sere-rastkirina vê riyê dişxule. Ked û xwêdanek mezin daye û hîna jî dide. Şewqa xwe tevlî vê ronîkirinê kiriye. Bi wergerên çak, bi çapkırına pirtûkên hêja û bi kalste ve, di meşîna vê riyê de gavêن mezin avêtine. Meriv li her 37 hejmarêن wê jî dîsa vedi-gere û dîsa dixwîne.

Ev xebat, ev ked û xwêdana salan naşibe işê sê-çar henekan. Ji avakirina huner û edebiyatê re cidîyet divê; sebir û tebateke mezin, bêhnfirehiyeke kûr û hezkirineke ji dil divê. Mîna Goethe, hewldan û xebata hunermend, nivîskar û rewşenbîran ji bo piçekî din ronahî ye. Ev piça ronahiyê jî, weke ku Konfîçyûs jî kiribû, dîsa li himberî reştariya vê jiyanê bi kar tînin.

Huner û edebiyat, hez jî durûti, bêbextî, binpêkirina ked, hesabêن rojane û pesi-nandina pivdayî nake. Hêz û çeka xwe, ji bo jiholêrakirina van tiştan bi kar tîne. Şûrê xwe ji bo delalkirin û bedewtirîna vê jiyanê hildide. Berhemên edebî, ji çend şîret û perspektîfan nayêن pê. Weke ku Jean Paul Sartre jî gotibû, du sê gotinêن beredayî, nekêrharî nabe edebiyat. Eger ku hêza huner û edebiyatê ji bo guherîna

dinyayê ewqas ne diyar bûya, Mem û Zîna Ehmedê Xanî, helbestên Melayê Cizîrî, destanên Homeros û hwd. wê hîna jî nehatibûna xwendin; ku ev hêza wê bi tena serê xwe ne şoreşek bûya, mûzîka Mozart, Çaykovskî; tabloyên Picasso nedigîhiştin fro.

Ji bo ku ev giringî di civaka me de çêtir were fêmkirin pêdivî bi Nûdemê heye. Bi xwendin û belavkirina kovarêni wiha, xwedilêderketina sazgehêن çandî û hunerî re wê di civaka me de gelek tişt biguherin. Ma di kîjan civakê de tonesans û guherînên mezin bêyi van mînakân çêbûne. Yêن ku her dem dimînin li benda qîvarêni bîharê û di wê bendewariyê de jî avê dikolin, ci re nizanîn guherîn û veguherîn ji xwe de çenabe.

Nûdem di warê xwe de tabûyên mezin şikêñandine. Rûpelên xwe ji ramana azad û nîqaşen bikêrhatî re vekirî hiştiye. Ji avakarina edebiyata kurdî re hewldanek mezin daye; ji pêşeroja edebiyata kurdî re bûye modelek. Weke ku di hejmara tê de jî diyar dike, gîhîştiye armanca xwe û bi serfirazî serkêsiya govendê dike. Lê divê ev serkêşî bêrawestan bidome; divê ev ïnada berdewamiyê bidome.

Ji bo vê ked û xwêdana salane, ji bo vê xebata mezin, meriv dikare ji Firat Cewerî re bi tenê vê bibêje: Biþ! □

23.04.2001

Ez bi xêra NÛDEMê hînî zimanê xwe bûm

ABIDÎN

Ziman, hêza xeyalên mirovan firehtir dike. Di jiyana mirovan de faktora herfî mezin ji bona têkiliyan ziman e. Peyvên di hiş de çiqas zêde be ewqasî jî xeyal azad in. Gava ku pevv di hiş de kêm dibin mirov jî her ku diçe teng dibe û diçilmi-se. Ji ber ku her pevv bi xwe re xeyalên nuh tînin. Girîngiya wê a di jiyanê de bê-gengeşî ye. Di forma jiyanê de jî xwedî gotin e. Gelek caran li gora wê jiyan tê şe-kilkirin. Ji ber ku jiyana mirovan ne tenê pevvê "tarîf" û "kirin"ê ne. Mirovên te-nê bi pevvê "tarîf" kirinê bi rêkevin ew hemî hestên xwe û fikara xwe winda di-kin. "Tarîf" tenê tiştên li holê dide ber çavan. Gava pevvê nuh tunebe wê demê raman jî tuneye.

Nûdem di jiyana min de xwediye bandoreke bilind e. Nûdem hişt ku ez bi zi-manê xwe yê dayikê fêr bibim. Di salên xwe yên lisê de berî ku ez Nûdemê bibî-nim min pirtûkên wê dît. Wê demê ez pir kêtixweş bûm. Min ji xwe re her roj çend pel dixwandin. Pirtûkek jê a Albert Camus bû. Pirtûka "Biyanî" cara pêşî bi xêra Nûdemê min xwend. Dûre hêdî hêdî ez fêrî kovaran jî bûm û min ew kovar bi kêf dixwendin. Min wê demê Nûdem ji mirovan mîna serekê vedişart. Ji ber ku bêhna mirinê li herderê bû. Pişti du sê salan gava ez hatim Îzmîrê êdî min karibû Nûdem bi serbestî bixwenda. Xeyalan dora min pêça bû. Her nivîs û nivîskar ji bona min dinyayeke nuh û tije fikir bû. Ez derdiketim keşa ziman. Carcaran ni-vîskarên ku hîn pirtûkên wan bi tirkî derneketibûn min bi kurdî dixwend. Ji xeynî wan, min Henry Miller, H. Böll, Çexov, Mayakovskî... Bi kurdî dixwend. Ev kefe-ke xweş bû. Ez dibûm mîvanê dinya wan. Dibûm hevalê "Nastenka", li ser "Ewrekî bi şal" difiriyam. Li kêleka "Kevoka spî" bûm û min bi "Baz" re şer dikir.

Êdî min jî ji her hejmarê parek ji xwe re derdixist û li got wê rê ji xwe re vedikir.

Ez fêrî tahma zimanê xwe dibûm. Min dixwest xwe bi ziman bixemilînim û amadeyî şer bikim.

Politîkaya Nûdermê gelek diket serê min. Tenê dixwest "Edebiyat"ê bike. Em bîrçiyê edebiyatê bûn. Xeyalên me ne fireh bûn û me jiyanâ kesen welatê din nasnedikir. Kê karfba edebiyat bikira ew li wir bû. Nûdem di nava kurdan de valahiyek mezin dagirt. Misyonek danî ser milê xwe. Me dixwest her tiştî bi îdeolojiyekê girê bidin û li gor wê îdeolojiyê bixwînin. Lê me dûre fêhm kir ku em ne rast in. Divê raman û kultura me jî pêş biketa. Nûdem ji bo vê bû lingek.

Nûdem di rîwitiya min a kultur û ramanê de valahiyeye mezin dagirt, hîn dadigre. Nûdem, tu hîn min dagire. Tu her bijî!... □

NÜDEM rêxistineke kurdî ye

NEJDET BULDAN

Hind tişt hene, çend sal ser ve biçin jî mirov, dema dîtina wê/wî ji bîr nake. Çi bûyer bin li serê mirovê hatî, ci jî mirovek, dîmenek an jî tişteke din.

Niyasbûna min û Nûdemê jî wesa bû. Dem payîza 1995ê bû. Em li Parlamento-ya Kurdistanê li Derveyî Welat rûniştibûn. Dema poste dihat, name û nivîsên taybetî diçûn odêñ berpirsyaran, rojname û kovar jî dihatin oda ku em lê dirûniştin. Di nav wan de min Nûdem dît. Nayê bîra min ku hejmara çendê bû. Bi rastî min baş nedizanî kurdî bixwînim. Kurdîya min ya deşt û nihalan, ya gundîyatî û rojane bû. Mîna hemû kovar û pirtûkên li mirov bîyanî bêñ min serdestkî û bi lez berê xwe dayê. Rûpela yekemîn ku berpirsyarê wê Firat Cewerî nivîsî bû, bi zorê min xwend. Û min pirsyara hevalên derdorêñ xwe kir: "Gelo eve ci kovar e, kî di dertê-xît, naveroka wê ci ye?..." Gelek pirsên din. Gelek bersiv hat dan, gelek jî şirove. Lê hemû jî bersiv û şiroveyên yekalî bûn. Yanî piranîya wan xirab û nebaş. Dibe ku biçûk dîtin, şiroveyên pêkenîn. Bala min kêşa. Kovareke kurdî ku siyasetê nake, ber çavêñ siyasetmedarêñ kurd biçûk û lewaz bû, lê nîrxike bingehîn ya kurdayatî diparêze, fetîşizma em têdayne nake, bi zimanê kurdî diweşe. Bi destê çend entel-letkuelêñ Swêdê ku ji kurdayatîyê dûrin(!) tê weşandin û filan û bêvan.....

Li ser van nakokîyêñ di mejîyê min da çêbûyî, kovar min kire çantê xwe da, ez hatim welatê ku ez penaberê wanîm, mala xwe ya koçberîyê. Min xwe da zorê, ba-wer dikim du şevan de min xwend. Lê xwendineke çawan, ez perîfîm, car li Fer-henga D. Îzolî dinêrim, car li kovara Nûdemê. Mîna ku ez nû hînî zimanekî dibûm. Telefona birêz Firat Cewerî tê de bû, ez lê gerîyam, mercen abonetîyê ji min re gotin û ez bûme abone. Paşê jî bûm tiryakîyê Nûdemê.

Em kurdêñ bakur hej ji zimanê xwe nakin. Tevgerêñ me bi tirkî ne, weşanên rêxistin û partîyan bi tirkî ne. Berhem û pirtûkên me, axaftinêñ me yêñ şoresserî û welatparêzîyê jî bi tirkî ne. (Yê ku xwudanê vê kêmasiyê yek jî ezim.) Diplomasîya me bi zimanê dijminê me ye. Em bi tirkî hîzrêñ xwe dikin û kurdayatîyê dikin. Bingehîn ramanêñ me yêñ tevgerî dema tirkî bin, xebat û tekoşîna me jî li ser Kêmalîzmê têñ avakirin. Ew kesêñ ku li ser rîka xwe bin, kurdî biaxîvin û binivîsin, li

cem me nezan in, bêfam in û kevnisperest in. Lê Nûdemê li hemberî hemû astengî û dijberiyên kurdan ew zincirê şikandîye. Heke miletik heye zimanê wî jî heye. Li gel hemû kêmasiyên xwe Nûdemê li derveyî welat rika xwe birîye serî. Hingî mirov dikare bêje Nûdemê, hemberê îddia û çalakiyên dijberê kurdayatîyê, hemberî kurdên, alîkarên vê dijminahîyê bi berxwedaneke xwe li ser pêyan ragirtîye. Heke bi zimanê dijminan duruşmeyên welatparêzîyê nehavêtibin jî, daye zanîn ku kurdî nivîsin û xebata ji bo pêşkevtina zimanê kurdî rôbazeke din ya girîng ya welatparêzîyê ye.

Ez bawer dikim ku dema mirovan, rêxistinan, sazîyan û civakan ar ïnat û namûsa taybetî ya ku şexsî nebe, ar-înat û namûsa raman û netewetîya xwe jî nîne. Pêwîst e ku li ser welatparêzîya wê/wan jî giftigo bê kirin. Nûdemê ku bi rik li ser nivîsin, lêkolîn, werger û weşandina zimanê kurdî rawestaye ew wezîfê xwe yê bingehîn bi cih ïnaye. Ewe serkeftinek e.

Welatên Ewrupa ku gelek kurd lê koçber in, piraniya kurdan bi partî û rêxistinan ve girêdayî ne. Ji ber vê çendê jî weşan û belavkirina bi nivîs, di bin bandora wan partî û rêxistinanda ye. Rêxistin çiqas dixwazin, mirov hind weşanan dikirin. Ez nabêjim dixwînin. Lê dikirin. Nûdem wesa nîne. Kesê bixwaze bixwîne Nûdemê û weşanên mîna wê dikire. Eve jî ji bo kesên xwudan ramana bi kurdî bixwînin û binivîsin, an jî têbîgehin û hîn bibin nirxeke mezin e.

Nayê wê wateyê ku Nûdem bê kêmâsi ye. Kêmasiyên wê jî hene û dê hebin jî. Belê dema ez wan kes û rêxistinêni ji bo kurdayatîyê bi tirkî gelek bilind diaxîvin û dînîvîsinin dînêrim, hemû kêmasiyên vê kovarê ji ber çavên min diçin. Heke gengeşîyen ne di rê de hebin jî (mixabin caran min tê de dîtine, xwezî min ne dîtiban) bi kurdî ne.

Pêwîst e dema mirov Nûdemê dinixîne, ne tenê qala kovarê bike. Bi wergerên ji zimanên bîyanîyan ji bo kurdî, dîsa bi weşanên zimanê kurdî yên kurdan, bi kêmasiyên xwe yên li ser lêkolîna zimanê kurdî barekî giran daye ser milên xwe. Kurtîya wê, Nûdem rêxistineke neteweyî ye.

Dema Nûdemê dixwînim, gotineke mamosta Hejar Mukrîyanî tê bîra min:

Be kurdî dejêm

Be kurdî demirim

Be kurdî didem

Welami qebrim.

Bi hîvîyen çend deh salên din... □

Nûdem:

Kulîlkeke nûbişkivî li ser rêya Diyarbekirê

İBRAHİM SEYDO AYDOGAN

4 an jî 95 bû, baş nayê bîra min gava me li Diyarbekirê yekem car Nûdem dît. Ez bawer im ku birayê min jî min re şandibû. Wê gavê me kovarên edebî yêñ bi tirkî dixwendin. Hin kovarên din ku li ser navê edebiyatê bi kurdîderdiketin hebûn, lê ew bêtir di nava hêzin siyasi de bûn. Ji ber wê, Nûdem rengekî xweş dianî pê û bandoreke cuda li mirovî dikir.

Gava kovarek cara yekem têkeve destê mirovekî, mirov ewili li dirûvê wê dinihêre. Nûdem bi kalîteya xwe ya çapê, bixwebaweriyeik dida xwendevanên xwe. Ya esil jî ew bû ku (heke rast tê bîra min) digot, "Nûdem ne a tu hêz û partîyan e, herkes dikare tê de cih bigire." Ev prensîp bi xwe, jî bo salênu ku wê dest bi weşanê kir, nûbûnek bû. Bi dû re naveroka wê: Erê mirov tu carî kovarekê bi temamî naxwîne. An jî ez dikarim li ser navê xwe weha bibêjim. Gava kovarek dikeve destê min ez li nivîsan dinihêrim, belkî ji her nivîsê paragrafekê an jî du paragrafan dixwînim, heke têkeve serê min ez dawiya wê tînim; heke nekeve serê min di cih de dihêlim û derbasî nivîseke din dibim. Lê ez dikarim bibêjim ku di her hejmara Nûdemê de jî sedî hefteyê nivîsan xwe bi mirov dida xwendin. Belkî jî ji ber ku bi kurdî bûn, mirov bi awayekî din xwe li wan digit.

Belê, Nûdem di serî de kulîlkeke nûbişkivî bû, lê hêdî hêdî kemîlî, xweşik bû, şîtlîn rihanen xwe da dorê, gişan bi hev re bêhn da ser deştên avis. Elbet derxistina kovareke bi kurdî geleki zehmet e. Bi ser hev de anîna nivîskaran, gihiştina asteke bilind û estetîzekirî, gihadina nîşêñ nû, afirandina mîrasên xurt û elbet lê bi xwe-

dî derketina ziman, kultur, huner û edebiyata kurdî. Nûdemê, xwediye wê Firat Cewerî û hemû nivîskarên wê, wan ev kar bi serbilindî kir.

Zimanek, gava derbasî nivîsê bû, bû pirtûk, bû kovar, bi kêmanî bû kaxez, ew ziman tu carî wenda nabe. Di dîroka kovargeriya kurdî de du kovar hebûn ku mirov herî bêtir bi wan serbilind dibû. Yek jê Hawar e, ya din jî Gelawej e. Mirov dikare bi kovarên mîna Nûdemê hejmarên van navênu ku mirov serbilind dikin bêtir bike.

Hema bi tenê, hebûna kovareke mîna Nûdemê bêhna mirov fireh dike. Heke dewam bike û hebekî din jî têkiliya xwe ya bi welêt re xurttir bike, dê hê gelek diwaran xera bike. Hêvî dikim ku weha li ser vê xeta xwe dewam bike û her hejmareke wê ji ya din bedewtir be. □

Bi dîtina min Nûdem

SIDQÎ HIRORÎ

Dostaniya bi Nûdemê re her ji roja hatina min bo Swêdê, ji hejmara 7ê, dest pê kiriye. Û her ji hîngê û heta vê hejmarê ez ji xwendevanê wê yên berde-warm im. Egerên berdeambûna min jî li ser abonetiya Nûdemê ew in ku ew:

Di wextê xwe de derdikeve

Babetên wê ji min re balkêş in û bi kalite ne

Zimanê wê xweş e

Bi berg û rawêxistina rûpelên xwe ve qeşeng e

Çi girêdanêن partîtiyê pê ve diyar nînin

Xwe serkeftina Nûdemê û berdewambûna wê jî her ji van binasan têن û her ji ber hindê jî nivîskarêن ji girêdanêن siyâsî yên cida, yên serbixwe û ji hemû perçeyen Kurdistanê jê re dînîvîsin.

Eger mirov temşaşayî kovarêن bi kurdiya kurmancî, yên ku di van deh salêن da-wiyê de derketine bike, dê bibîne ku Nûdem ji wan hemiyan ma berdewarm û pêşkeft û balkêştir e. Û gelek kesan nivîskariya xwe ji nav rûpelên Nûdemê dest pê kir yan jî Nûdemê ew û berhemên wan dan nasandin.

Lê Nûdem ne bes ev kovar e ya ku min li jor behsê wê kirî, lê weşanxaneyeka pir baş e. Wê bi pirtûkêن ku weşandine pirtûkxaneya kurdiya kurmancî pir dewle-mend kiriye. Bi hindê romannivîs û wergervan, helbestvan û lîkolînvan û htd. bi berhemên wan ve pêşkêşî bazarê xwendina kurdî kirine. Û bi dûbare çapkirin û weşandina Hawarê di du bergen de wê berhemê pîroz yê kurmanciyê pêşkêşî evîndarêن zimanê Celadet Bedir-xanî kir.

Xwe bêguman berdewambûn û çêtirbûna Nûdemê girêdayî me xwendevan û ni-

vîskaran e ji; ku em wê bikirin bo ku bi wan pereyan ew derbikeve û em jê re bi-ninvisin û wê dewlemendtir bikin.

Xwe eger xwediye Nûdemê ne Firat Cewerî bûya Nûdem ji yan ne dibû yan ji ne bi vî kirasi dibû. □

Di dîroka edebiyata kurdî de NÛDEM xwediyyê cihekî bilind e

CANKURD

Cara yekem, ku min Nûdem dîtibû, di sala 1992ê de bû. Hejmar 2 û 3 ketin destê min, lê nayê bîra min, ka min herdu hejmar bi xwe re ji Swêdê anî bûn Almaniya an li vir bi dest xwe xistibûn. Hîngê min xwe gellek bi alîkariya başûrê Kurdistanê û hinek pirsên din ên ramyari ve gêro kiribû û pir dem bi dest min de tune bû, ku ez li xebatê hunerî, çandeyî û wêjevanî vegeirim. Lê bêguman hîkariyeke mezin a Nûdemê li dilê min çêbû, yek ji ber ku ew bi zimanê, ku ez sî sal in xwe pê mijûl dikim, hatiye nivîsandin û duwem ji aliyê derxistinê ve bi hostayî û zanabûn derketiye û dawî pir kesen qelemjîr û welatperwer tê de nivîsandine û di-nivîsin.

Ez naxwazim di vir de kesekî nizimtir bikim, lê bi rastî hêja Firat Cewerî yek ji nivîskarêne me yên rêza pêşîn e û gava ew berpis û xwediyyê kovarê be, dê bêguman nivîsına baş vebijêre û kovarê têxîne ser rêya kurdevarî û kurdayetiyê. Lê mixabin! Min ta roja iro, teví ku deh sal in ev kovara hêja derdikeve, gotarek jî bo wê ne hinartiye, ne ji ber tiştekî, tenê ji ber ku hinek egerên min ên taybet hebûn, lê gava Xwedê rê bide, ezê ji niha û pê ve bizava xwe bikim, bo Nûdemê carcaran binivîsim. Lê bo min diyar dibe, ku ew hîç ne pêdiviyê nivîsnêne kukumekî mîna min e, ew bi qelem û wêjezanen têr û tijî ye.

Ez naxwazim pir dirêj bikim, lê wek ez dibînim; Nûdem ciyekî xwe yê bala di nav wêjevaniya kurdî ya nûjen de girtiye û eger alîkariya wê ji aliyê partî û rêlxirâwên kurdî ve wek yên wan heba, dê berhemên xwe yên giranbiha bigihandina hemî xwendevanên Kurdistanê, lê mixabin! pir caran zêr di dikana zêrfiroşan de jî dimîne, lê ew dizane, ku ew bazarvanê çî ye. □

Kovara Nûdemê ya li ser şopa Hawarê, li dû xewna Mîrê nemir C. Bedir-Xan e.

S. UNUS

Hingê, pêşıya zo salan internet û kovarên kurdî tune bûn. Dinya bi awayekî din bû. Cîhanekê bipolar. Çep û rast. Bloka kapitalist û bloka sosyalist. Şerê kendavê wê bîhata bîra kê û serobina gerdûnê ya niho kesekî nikaribû xeyal bike bê xeyal û fantaziya kê. Bi fantaziyek ûtopîk jî tikesî nikaribû roja îtroyîn birame. Ev guhirîna ko cîhana me tevîhev kir, serobino kir, hê jî didome. Bi gavine piçûk ji bona me kurdan jî guherînîne berbiçav anîye pê. Hukumeta heremîya li bakûrê Iraqê, sê televîzyonêñ kurdî, bi sedan kovar, pirtûk û romanêñ kurdî. Em malper an xaneperan jî bîra nekin. Yanê homepageen me. Mehname, Nefel, Amude û Nûdem, yên din... De diha, ev e, dinya ye, me kurdan çi gotiye, "çenxa felekê, geh li jor, geh jî li jêr e..."

Ez ji bona kovara *Çiya, Hêviya Welêt û Hawarê* ya ko ji aliyê Hemreş Reşo ve bi fedekariyekê mezin hatübûn çapkîrin diçûm Berlinê, da ko bikaribim kitêbên kurdî bi dest bixim. Ya rasti lê binhêrim û heke mimkun be kopye bikim. Paşê, peyder pê kovarên wek *Rizagarî, Roja Welat, Armanç, Berbang, Kulîlk, Mîrkut, Zengil, Têkoşer, Azadî, Roja Nû, Hêvi, Hawar, Rewşen, Çarçira û Kurdistan Press* û yên din derketin. Wê demê, wê heyamê, di wî dewran û zemanî de ne Nûdem, ne Nûbihar û ne jî bi kurdîya îtroyîn pirtûk û romanêñ kurdî bidestdiketin. Ji xwe ji romanan bi tenê min navê Erebê Şemo û pirtûka wî ya *Şivanê Kurd* bihîstibû. Herçend Hemreş Reşo kitêbxana xwe ya li Berlinê wek emanetekî zêrin teslîmî min dikir jî; lê dolap û refen kitêban bi zimanêñ kilêtekê girê dida. Kitêbên wek Hawar, Ronahî, Roja Nû mîna işqa çavê xwe diparast. Têkiliyên min bi kovarên

kurdî yên ko li Tirkîyê derdiketin re jî hebûn. Lê ji gişkan pirtir kovara Tîrêjê diçû xweşa min. Ji bona min, Hawar û Tîrêj xezînek bû. Hevalbend û hogirê min ên di xeribiyê de bûn. Rind tê bîra min, ez li Şzmîrê li koçe û kolanan li weşenxana Tîrêjê digeriyam, lê min nedît. Ew hesret nehat cî. Qelemşorên wê kovarê bi navine psoydonîm dixebeitîn. Paşê, pişti salan ez li ciyekî têgîhiştim ko Filît Totanî, Rojen Barnasê me yê hêja ye. Ne Ferheng hebûn ne jî romanê Mehmet Uzun; ne jî yên Hesenê Metê. Heke pîrske min hebûya, min nameyek ji Hemreş Reşo, N. Zaza û Kamiran Bedirxan re rê dikir. Hingê min ne navê Nûdemê û ne jî yê Firat Cewerî bihîstibû. Navê F. Cewerî û Dr. Poloço geh geh di kovarên kurdî de dikete ber çavê min, hetanî ko min *Dê Şêrin e û Girî* xwend.

Nûdem, kovereke nûjen û hemdemî ye, 40 hejmarên wê zereyek ji deryaya kela-pora me ya windabûyî ye. Keda mêtî ya dekadekê (10 salan) ye.

Şâîrê Almanan yê bi navûdeng Johann Wolfgang von Goethe, dibêje:

wer das Dichten will verstehen,
muss in das Land der Dichtung gehen;
wer den Dichter will verstehen,
muss ins Dichters Lande gehen.

kî bixwaze têbighêje helbestê,
divê biçe welatê helbestê;
kî bixwaze têbighêje helbestvân,
divê biçe welatê helbestvân.

Welat li vir bûye Kurdistanâ xeyalî. Bi gotina F. Cewerî, Swêd ji bo zimanê kurdî û xabatên li ser zimanê kurdî yên têr kirin, di jiyanâ rojana de jî bûye Kurdistanâ ke xeyalî. Hin meriv dibêjin ekola li Swêdê. Heye ko li vir rastiyek hebe. Lewra, meriv ji 2000î zêdetir kitêbên ko li wir hatine çapkirin bide ber çavê xwe, bi rastî jî meriv dikare pişti ekola Hawarê ya li Şamê zîl dabû, ekoleke li Swêd dikare bi dilxweşî zar bike. Helbestvan kî ye? Ew camêr in ko bi sedan kitêb, kovar çap kirine ne.

Xwedanê kovara Nûdemê tiştekî nû ko hetanî niha di ti kovarên kurdî yên din de tune bûn fêhm kir û li ser vî babetî jî bi xîretî û aqilmendi sekinî. Ev tişta jî wer-ger bû; belê we rast xwend, wergerandina edebiyata zimanên din ji wî zimanî ji bo

kurdî. An ji bo kurmanciyê bû. Bi gotineke din tercimekirina zimanên din ji bo kurdî bû. Gerînendeyê kovara Nûdemê girîngiya vî baberî fêhm kiribû. Loma me-riy dikare bi dilkweşî bibêje ko kovara Nûdem tiştekî nû, nûjen û nûdem bû. Berê, herçend carmîrine wek Celadet Bedir-Xan û Qedrî Can jî li ser vê meselê sekinibûn jî, lê kovara Nûdemê ev tişt ji xwe re kire armanc û sistematik; lê hê jî negîhiştiye armanca xwe. Dr. Poloço ji Hemingway di hejmara Nûdemê ya yekem de dest bi wergerê kir. Hetanî hingê kovarêñ kurdî bi peryodîk derdiketin û dîsan dihatin jîbirkirin. Yanî wek şâîr dibêje, dihatin û wek bayê bezê dîsan diçûn. Wek mij û dûmanan di ser çiyan û baniyan re derbaz dibûn diçûn. Bi fedekariyeke şexst ye hin kesan carina bi mehan, geh caran jî bi çend salan çend hejmar çap dibûn û bi sedemên aşîkar van camérän nikaribûn vî karî bidomînin. Lê, va ye Nûdem ev deh sal in ko didome. Ev serketinek e.

Bêgotin mexseda min ne ev e ko ez li vir bi awayekî ji rastiyê û ciddiyetê dûr pes-nê kovara Nûdemê û berpirsiyarê wê bidim. Tabloyek an wêneyek ji hezar gotinan çêtir e. Xebata û keftelefta kovara Nûdemê li ser çand û zimanê kurdî heye. Li ser min û yên din jî heye. Heke tune biya, min dê jî ev gotar nenivîsiya. Xebatêñ Zey-nelabîn Zinar, Mehmet Uzun, M. Emin Bozarslan, Şahînê B. Soreklî, Lokman Polat, Hemreş Reşo, Sabah Kara, Reşo Zilan, Hesenê Metê, Arif Zêrevan, Rohat, Alakom, Husein Mihemed, Fawaz Husêن, Xelil Duhokî, M. Aydogan, D. M. Fer-ho, S. Demir, Ş. Cizirî û yên din ên ko ez niha mîna bilbilekî navê gişkan dijmêrim li gor xebat û interesa xwe bêguman hene. Lê, ji bona min ciyê kovara Nûdemê cihê ye. Nûdem tê de ti şık tune ko li ser riya Mîrê nemir C. Bedirxan e. Di vî dekadî de xwedanê kovara Nûdemê xewneke min e bi min re neçû gorê ani-ye cî. Ez dizanim di kultura me kurdan de bi tenê pesn an jî gazin û lome û kote kot heye. Ez hema li ser rikan reşkurmanc im. Em gişk dizanîn ko gelek şâîr, ni-vîskar, filozof piştî mirina xwe navdar û qîmetbilind dibin. Em nikarin piştî nex-weşî an helakbûna nivískar û helbestvanên xwe wan bipesinînin. Ax û oxê bikiş-nin; mala min xerab be, ci carmîr û xweşmîr bû bibêjin. Çima di saxî, silametî û serfirazîye de pesnê xebatêñ baş nekin. Nûdem xwarziyê Mîr Bedirxan el Dengê sa-detiya bilûra şivanêñ li Ararat, Herekol, Subhanê û Cudi tîne bîra min. Kofiya bû-ka kurdan, xweşe xweşa ava şîpan, sûretê feqiyêñ masûm û dêrê patisqeyêñ keçen xama tîne ber çav û guhê min! Ji bona min Rojen Barnas, Sabah Kara, Rohat, Malmisanij ci be, kovara Nûdemê jî ew e! □

Berdewamî, naverok û xeta NÛDEMê di edebiyata kurdî de cîhekî girîng digire

SÎRACETTÎN KIRICI

Di dîroka me ya nêz de gelek rewşenbîr û siyasetmedarên kurd ji sedema ku di nav refîn tekoşîna rizgariya netewa kurd de cihê xwe girtine, ji alî dewletên dagirker muhatabî zilm û zordariyê bûne; cîh û warênen xwe berdane, piraniya wan mecbûri jiyana penaberiyê bûne. Ev jiyana penaberî û xerîbiyê her çiqas bandoreka neyînî li ser kurdan danîbe jî, lê di rastiya xwe de, jiyana sîrgûnê kurd fêri afîrandina berhemên hêja kiriye. Ji bo vê yekê jî îro êş û elema kurdan ci dibe bila bibe ji bo berjewendiyêneteweyî jiyana penaberî roleke erînî lîsitiye.

Ev rol ci ye?

Di pêvajoya zo salêن vê taliyê de kurdêن li derveyî welat dijîn ekolek nû ava kiri-
ne. Bi lîteratureke nûjen ronahiya xwe dane her çar perçeyên Kurdistanê. Bi taybe-
tî jî kurdêن li Swêdê dijîn ev vatiniya xwe baş bi cîh anîne. Ji alî vejandin û pêşde-
birina ziman, edebiyat û kultura kurdî de berhemên hêja derxistine holê. Li ziman,
kultur û dîroka xwe xwedî derketine. Kovara Nûdemê jî yek ji van berhemên hêja
ne.

Nivîskar, edebiyatnas, rewşenbîr û siyasetmedarên li welat û li derveyî welat dijîn
valahiya di çand û edebiyata kurdî ya pêncî, şest salêن vê taliyê de bi xabatêن xwe
yêن hêja dagirtine. Kurd û hêzêن Kurdistanî li xwe vege riyan. Ne wekî do ne. Îro
di warê wergerê de hejmareke hêja klasîkên dinê di pirtûlxana kurdî de ne. Bi se-
dan çîrok, roman, bîranîn hatine nivîsandin. Bi dehan kovar û rojname têن çap-
kirin. Destpêka piraniya van berheman li derveyî welat hatine afîrandin. Ev berhe-
mên hêja di bin bandora xerîbî, hesretî û evîndariyê de; ev berhem di bin bandora

raman û îdealên siyasetmedar û rewşenbîrê kurdan de derketine holê. Gerek mirov gelek qîmetê bide van xebatan. Ez di vê çercewa jorîn de cîhekî girîng didim kovara Nûdemê.

Ma gelo tu kêmasiyê wê tune ye. Dibe hebe. Lê bi xwe ez tu kêmasiyê wê nabînim, ji bo vê yekê jî ez dixwazim bi tespîteke dîtinê xwe di der heqê Nûdemê û bandora wê ya li ser civata kurd bînim holê. Piştî 12ê îlonê gelek kovar û rojname li welat hatin çapkiran. Ji bo vê yekê bi sedan rewşenbîr û siyasetmedarê kurdan sîrgûn bûn, ketin girtîgehan. Lê di weşanê wan de berdewamiyek çênebû. Mirov kare taybetiya welat şirove bike û sedema kêmasiyan fahm bike. Lê li dervî welat. Li vir jî gelek kovar û rojname hatin çapkiran. Mixabin di van weşanan de berdewamiyek çênebû.

Nûdem bi xeteke bi îstiqrar weşanê xwe domand. Û ferqiya xwe derxist holê. Divê kurd li ser vê yekê baş rawestin. Gelo sira vê yekê çi ye. Ji bo çi nivîskarekî kurd bi tena serê xwe kare vê kovara hêja derxîne. Divê ev yeka bibe nimûne ji bo kurdan. Herkes piştgiriya vê kovarê bike, ku karibe ro salêni din jiyana xwe ya weşanê bidomîne.

Ji alî rol û girîngiya Nûdemê bi xwe ez şahidî hin bûyeran bûme. Her çiqas Nûdem kovareke edebî, çandî û hunerî be jî dem dem li Kurdistan û Tirkîyeyê roleke siyâsî jî leyistiye. Ji bo ku Nûdem seranser bi kurdî û naveroka wê Kurdistanî bû, gelek siyasetmedarê kurdan ew ji çentê xwe kêm nedikirin. Wexta li ser wan û malêni wan Nûdembihata girtin neheqî û işkence didîtin.

Di 9şan de em (heyetek ji HADEPê) ji Ankara diçûn Batmanê. Di nava Farqîn û Batmanê de leşkeran em dan sekinandin. Di çentê min de kovara Nûdemê derket, nêzî saetekê em li rê dan sekinandin. Piştî neheqî û hequeretên xerab em berdan. Ev bûyereke biçûk e. Lê balkêş e.

Ez werim ser dîtinê xwe yî li ser Nûdemê. Wek şexs kîfa min ji sê tiştê Nûdemê re tê:

1. Bi kurdîbûna wê
2. Berdewamiya wê
3. Xet û naveroka wê

Ev her sê xalêni jorîn min dilxwes dike. Pirr caran min ji xwe ev pirs pirsîye. Çima ez wexta weşanek kurdî dibînim hewqas pê dilşa dibim. Bi ya min wexta mirov bîbêje ez milletek im. Ez bindest im. Ez kurd im. Du tişt tên bîra mirovan. Ya yeke-

mîn, ziman-kultur (axaftin, nivîsandin û li çanda xwe xwedî derketin.) Ya duye-mîn, azadî ye (li ser axa xwe bi xwe xweîdarekirin).

Milletekî zimanê xwe wenda bike kare kultur û dîroka xwe jî wenda bike. Ji bo vê yekê divê berî her tiştî em li ziman û nasnama xwe xwedî derkevin.

Pirsa duyemîn.

Cara yekemîn min navê kovara Nûdemê di girtîgahê de bihîst. Lê bi xwe heta ku ez ji girtîgahê azad nebûbûm min Nûdem nedît. Lewra wê demê di girtîgeha ku ez lê dimam weşanên kurdî qedexe bûn.

Cara yekem li Ankara li mala Cihan Xanim (Sincar) Nûdem derbasî destê min bû. Wexta min Nûdem dît diltepiyek li helqudorê min rapecikî. Ez ketim nav xemû xeyalan. Xeyalên kûr û dûr. Çend bihar û payiz, çend havîn û zivistan, çend şev û rojê tije hesret ji ser wan rojan derbas bûbûn. Wê demê kovara Tîrêjê hate bîra min. Li dû salên tije işkence û neheqiyêne neyaran ez rastî kovareke xwerû kur-mancı hatim. Bi xwe ez vê gavê nikarim wan hisêن xwe yên wê rojê bînim zimên. Ez piir dilşa bûm. Min naverok, logo û forma wê gelek ecibandibû. Ji wê rojê û şûnde êdî kovara Nûdemê ji çentê min kêm nebû. Min her hejmara wê bi coş û zewqek mezin dixwend. İro jî ew kêfa min berdewam e.

Ez ji bo vî karê hêja birêz Fîrat Cewerî pîroz dikim. Û bi hêviya ku di rojêne pêş me de Nûdem li welat çap bibe. □

Mizgîniya xêrê: Nûdem

SALIHÊ KEVIRBİRÎ

Di dîroka weşangeriya kurdî de du kovar hene ku navên wan di mejiyê hezki-riyên wêje û çanda kurdî de bi tîpêñ zêrin hatine nivîsandin: Hawar û Ronahî. Heger pêwîstî bi destnîşankirina navê kovareke din hebe, li gorî bîr û baweriya min wê ev nav nav NÛDEM be.

Bêguman gava Firat Cewerîyê hêja dest bi weşana Nûdemê kir, hay ji zor û dij-wariyan hebû û xwe di nava keftûlefteke giran de dîtibû. Lê va ye wekî hûn xwendevanên hêja jî dibînin di 10 salêñ ku me li dûv xwe hiştin de, Nûdem hêdî hêdî xemîlî piştre jî kemîlî. Bi rastî jî, gava mirov jimareyên destpêkê û niha dide ber hev dibîne ku di navbera jimareyên Nûdemê de, wekî neqeba çiyayan ferq û meyli heye. Li gorî boçûna min jixwe serkefitin û pêşdeçûyîna mezin jî di vir de derdikeve holê. Bi kurtasî ravekirina vê yekê ev e ku, her hejmara derketî ya Nûdemê, di warê xwenâkirin û biqelîtekirinê de, ji hejmara raborî pêşketîtitir û serkeftîtitir bû. Lewre ji her dem çi li welat û çi jî li derveyî welat Nûdem yek ji weşanên me yên xwerû bi kurdî bû ku ez wekî mizgîniya xêrê li benda wê bûm. Gelek caran gava Nûdem wekî protokol ji bo me dihat Rojnameyê, hevalan ew ji destêñ xwe direvandin.

Bi kurtasî di pêvajoya weşangeriya 10 salan de, di warê ziman, çand, huner û edebiyata kurdî de rol û girîngîya kovara Nûdemê zelal û berbiçav e. Wekî me di destpêkê de jî destnîşan kir Nûdem, ligel Hawar-Ronahî û çend navên din yek ji hîmîn bingehîn a edebiyat û weşangeriya kurdî bixwe ye.

Cara yekem di sala 1992an de, jimareya 4an a Nûdemê kete destê min. Wê gavê ez xortekî 19 salî bûm û 2-3 sal bûn ku min çavêñ xwe li weşanên kurdî digerandin.

Yekem car di wan salan de pirtûka gorbihûşt Mehmûd Bakşî ya bi navê "Gundikê Dono" ketibû destê min ku min her rûpelên wê dadiqûrtand. Wekî weşana dû-wem hejmara qan ya Nûdemê bû ku ketibû destê min. Ji wê rojê ta iro hewl didim xwe ku tevahiya hejmarêNûdemê bi dest bixim, arşîv bikim û wan yek bi yek bi dilê xwe bixwînim.

Baş tê bîra min, di wê hejmara navborî de nivîseke Rohat hebû ku gelekî bala min kişandibû: *Di stranên kurdî de navçeveke erotîk: Memik* wekî rasernav jî gotineke wisa xwes hatibû neqîşandin:

Kesê di orta du dila
çar çavan de xeber dide
bila xêrê wayê qet nebîne.

Sal û zeman derbas bûn, Nûdemê mohra xwe li binê bi dehan hevpeyvîn, lêkolîn û gotarêñ çêjdar û watedar xist û diyar e wê hê jî bixe.

Di dehsaliya xwe de, Nûdem dixemile û dikemile...
Dehsaliya te pîroz be Nûdemâ Rengîn...
Û ji bo te jî spas Fîrat Cewerî, pêñûsxwes!... □

BI NÛDEMÊ NÛDEMEK!

ZEYNELABİDİN ZINAR

Bi kovara NÛDEMê, nûdemeke xweş di wêjeya kurdî ya bi devoka kurmancî de dest bi jiyanê kiriye û ew jiyana xweş wa ye ji hejmara yekê dest pê kiriye û hetanî hejmara 37an domandiye. Hêvîdar im ji Yezdanê dilovan ku dê ew xweşî her û her li jiyanê berdewam be.

Ew nûdem ango dema nû bi kovara NÛDEMê careke din da peyîstandin ku ev çanda kurdî, ev wêjê, ev ziman û toreya wî, çendî ku bi sedê salan in ew ji aliyê bê-bav û bêbextan ve hatine qeşimandin jî û nehiştine ku li ser axa Kurdistanê berfirîreh û toretûrtir bibin, lê wek mesela ku dibêjin ne rim di têrre de tê veşartin û ne jî roj bi perdê tê vegirtin çêbûye. Ger li ser wê axa pîroz vejandina vê çand û wêjeyê rindtir nehatibin berz û balakirin jî, lê li maciriyê, li hin deverên neyîstanê ew hatine jiyanin û radeya balatiya xwe gihadine ber warê herî bilind ê xwezîstana dilşadiyê.

Sal 1991 bû û demsal jî payîz bû. Şevekê di derengiya şevê de gava zîlê telefona min lê xist, ez hinekî veciniqûm û min xwe bi xwe got: "Gelo ev telefona bêwext, wê xêr be yan wê xirab be?" Lê gava min telefon da ber guhê xwe, dengê ku dihat weke ku nas bû, lê dîsa jî bi tavila kî ye û dê çi bibêje, min xwest ku ez gotina paşî di serê pêşî de fêm bikim. Na min dît ku xwedîyê axafînê mirovekî bêhnîfreh û bi semax e. Îcar min jî xwe li wê tevnê hona û xeberdana me herdulan dirêj bû, lê gava ku berpêş çû, min hem mesele fêm kir û hem jî xwedîyê xeberdanê nas kir ku Firat Cewerî ye.

Piştî beyankirina Cewerî ji bo derxistina kovareke xwerû bi kurdî/kurmancîya bi tîpên latêni, dîsa jî ez ketim tavila geloyan û nîvcomayîna kovarê. Ji ber ku Firat Cewerî hêj xortekî cuwan bû, çendî ku berê jî dest bi karê nivîsandinê kiribû jî, di wê demê de lê bi bazırgantîyê re dilipikî û demeke dirêj bû jî ku ew ji Kurdistanê reviyabû. Îcar min xwe bi xwe digot: Gelo wê ev xortê cuwan, karibe hetanî çend hejmaran, vê kovarê derbixîne? Wê şevê min sozê mîrê berê da Firêt û min got: Tişte ku ji min bê, ez ê ji bo derxistina kovarê alîkariya te bikim.

Erê ez li sozê xwe xwedî derketim, tişte ku ji min hat, min alîkarî pê re kir. Tişte ku ji min nehat, min nekit. Lê belê alîkarîya ji bo tiştên wisa ne bi kîloyan tê kêşandin û ne jî bi metroyê tê pêvandin. Mirov tenê eger ji aliyê wijdana xwe ve ku hêsan be, ew yek bes e.

Hejmara NÜDEMê ya pêşî derket û li jiyanâ xwe domand heta ku hejmara 37an jî wa ye niha derketiye. Belê 37 hejmar kovar ku bi sedan navêni nivîskar û rewşen-bîrên kurd tevî nivîsên wan ên babetcihê tê de hatine nexşandin û ketine nava rû-pelên dîrokê, ji nivîşen nûhatî yên kurd re bûne sermiyanekî hazir ku ew dikarin pê sergêjî û teşqeleyên xwe kêmîtir bikin, iro di nava refîn pirtûlxana Kurdistanê de ne û ji bo suxreya mirovatiyê raxisî ne.

Nivîsa min a ji bo hejmara pêşî ya NÜDEMê, li ser mamosiyê wêjeya kurdî nemir Ehmedê Xanî bû ku li gorî nîşandana tarîxa DATAYA min, roja yekşemê II 10 1991 e û ji rûpela 7î heta 76 an domandiye.

Gava ku hejmara pêşî ya NÜDEMê ji çapê derket, ew roj ez li civîna Kurmancî ya Enstituya Parîsê bûm. Civîna me li Girava Biskops Arnøyê/Swêdê bû. Beşdarêni civînê 20-22 kes hebûn. Wê êvarê em vexwendiyê mamosite Reşo Zîlan bûn. Êvarê saet li dora 19an em çûne wir. Firat Cewerî jî tevî pakêtek kovar hate mala kek Reşo. Çend kesêne ne beşdarêni civînê jî hatibûn şebîrka me. Firat Cewerî çend hejmar kovar li civatê belavkirin. Her kesî kîfa xwe jê re anî û bo wî destxasî gotin û jê re serkeftin xwestin. Bi wê yekê kîfa Cewerî pir hat, bevvê wî xwes û ruyê wî jî ges bû. Lê ew gesî û xwesî, zêde nedomandin, bi qîreke berz û bi gotina: "Ev ci virr in, ci derew in? Madem tu apocî yî, çima tu xwe eşkere nakî?.." û gelek peyvîn jê re bêrê hatin gotin... Sedemê gotina wan peyvîn çors, tenê ev bû: Di paşıya kovarê de danasına rojnamyea WELATê hebû û li pişt wê jî danasına pirtûkên Hazim kiliç cih girtibûn.

Ew ahaftina Mahmûd Bakî tengê civatê da guhartin, kîfxweşî û şadiya Firat Cewerî jî dane şikandin; tengê wî sor bû, piştre qermîti û herwekî li benda xeberdaneke xwes be ziloq bû û li kesêne xuyanî yên li civatê nihêri... Lê belê deng ji kesî der-

neket û her kesî li yê din nihêri. Bêdengiyeke mîna cwrê zivistanê xwe berda ser ci-vata me û bêpêjn bû. Min guman dikir ku her kes dipa ka wê encam bibe çi, yan jî her kesî xeberdanê li pawuka yê din dihişt ku bersivekê bide gorbihiş Mahmûd Baksî.

Min xwe çend caran hazır kir ku ez bersiveke nerm bidim M. Baksî. Lê belê li ci-vatê hin kesên bi jiyê xwe ji min mezintir hebûn. Bo min bêdedebî çêdibû ku min li ba yên jixwemezintir karê mezinan kiribûna. Û ez jî bêdeng mam.

Di wê demê de dilê min pir bi Firat Cewerî êşîya. Lewra min dizanibû ku wî çi-qas zehmet bi kovarê re dîtiye û heta ku çend şevan ez û ew jî hîc raneketine û hetanî sibê li ser nivîsên kovarê şixulîne. Herweha wî pereyekî pir jî li çapa kovarê da-ye. Îcar piştre, min xwe bi xwe got: Gelo wê kovara Nûdemê tenê bi vê hejmara xwe dê bikeve mêmjû û wenda bibe, yan dê Cewerî guh nede van peyvîn Mahmûd û dê li derxistina wê bidomîne?

Piştî wan xeberdanêne ne sezayê rewşenbîrtiya rewşenbîran, civata me jî peşkilî û heçî mîvan bûn rabûn çûn malên xwe, emên beşdarên Civîna Kurmancî jî çûn şû-na civîna xwe, her yekê me weke ku ji xwe xeyidî be rast çû ser ciyê xwe û raket.

Roja din naverojê, min gote Mahmûd Baksî ku do êvarê wî niheqîyeke mezin li Firat Cewerî kir. Lê wî li eynî gotina xwe domand û "beredayî"tiya kovareke ji ali-yê apociyan ve dîsa got.

Lê belê wek mesela ku di çîrokan de dibêjin: Çû zeman, hat zeman, serê Mîrza Mihemed hê ji nû ve kete nava xaxêñ giran. Heta çend hejmarêñ Nûdemê derketi-ne jî, serê Firat Cewerî di nava xaxêñ giran de bû. Hinekan digot gelo?... Hinekan digot erê!... Hinekan digot çîma?... Hinekan digot ev ji kur?... Hinekan digot ha-ho!... Hinekan jî digot aferîn ji Firat Cewerî te! Bila ew tenê bêje ku ez berpirsyari-ya xwe tînim cih! Helbet kesên ku ev gotina dawîn digotin, jimara herî zêde bûn.

Di pêvajoya dernê de ewrên reş firrikîn, barana xezebê rawestiya, zîpîka siqûma-tan daneweşîya û dînyaya NÜDEMê germeruhn bû, kovarê li jiyana xwe domand û heta niha gihaye jimara 40î.

Ez hêvîdar im ji Yezdanê dilovan ku dê NÜDEM her û her berdewam be û bi sedan, bi hezaran jimarêñ wê derkevin jiyanê û pêşkêşê mirovatiyê bibin. □

10ê Gulana zoore, Stockholm

Deriyekî zimanê kurdî: Nûdem

YAQOB TILERMENİ

Di pêvajoya weşana kurdî de, ji bo huner û çand û wêjeyê, kovara Nûdemê bi roleke girîng derketiye ser dikê. Bi taybetî kovara Nûdemê û bi giştî KOVAR, ji bo pêşdebirina zimanekî û hunera wî zimanî, weke hîmekî sereke ne.

Kovar, HÊVÎ ne. Hêviyên ku di encamê de wê bi xwe re jiyanên nû, cîhanên nû, nivîsên nû û nivîskarên nû derdixe holê. Bi ci naverokê bin ne girîng e; kovarên çandî jî ên hunerî ji bi herman xurtiyê li zimanekî xwedî derdikevin.

Di xurtkirin û pêşdebirina zimanekî de kovar, xwedî erkên mezin in: Li ber çavêr raya giştî ne, eşkere ne, kinc û cilêن hestêن nivîskaran li hêlekê ne, hestêن wan li hêleke din... Nivîskar nikarin xwendekaran bixapînin. Ci başbûn û ci kêmasiyên nivîsê hebin, li bêjingê dikevin û bi nivîsên mîvanên xwe re rû bi rû dimînin. Bi vê sedemê kesên ku dixwazin di derheqa nivîsekê bipeyivin an binivîsînin, rasterast berhema di kovarê de dininxînin. Gellek caran nivîskarên ku di kovaran de dinivîsînin, ji xwendekaran re weke kesên efsûnkardixuyin: Tu carî kes li wan rast nayêن, nivîskariya wan di kovaran de didome. Ev jî ji hêlekê de bi erêni ye. Ji ber ku xwendekar-rexnegir pirrî caran bêyi ku nivîsa li ber destê xwe rexne bikin, diherin jiyana nivîskar a xususî derdixin pêş.

Xwendekarên (aboneyên) kovaran weke ku li benda mîvanekî eziz bin, ji mehê carekê, ji du mehan carekê, ji sê mehan carekê, an jî kovar çend mehane be, li gora vî wextî bêsebir disekinin. Ev libendemayîn bi xwe re xweşiyekê jî tîne: Wexta ku kovar çend rojan bi derengî dikeve xwendekar bêtir dikeve tahtêla wê. Gelo ci bû? Ci astengî derketin? Kovarê xwe temarn nekiriye, an?.. Ev pirsana û gellekên din dibe sedema girêdaneye zexim. Mînakek şenber e. Cara pêşîn min Nûdem di 1995an de li bajarê Stembolê dîtibû. Ew jî hejmara ii an bû. Kovareke weha tije û

bi rêkûpêk, hêviyên min zêdetir kir. Ji bo nivîskariya min gellek fôlçeyên wê çêbû. Ji bo ku Nûdemê bixwînim, min ji hevalên xwe yî ku bikarin Nûdemê bigihînin min, dixwest. Mînakek din: Kovara Jiyana Rewşenê, kovareke mehane ye. Ji ber şertên neyînî û ji ber astengîyan, tim bi derengî derdikeve. Ez her mch diherim ji pirtûksîroş dipirsim. Çi qas ez hînî derengderketina wê jî bûme, dîsa jî weke karekî di wextê wê de lê dipirsim. Derengderketina wê hem min aciz dike û hem jî kêfxweşiyekê dide min.

Ji ber çi ji kovarekê aciz dibim? Bi miraq li hêviya kovarekê dimînim. Kovar bi derengî be jî dikeve destê min. Lê, nivîsên di kovarê de ne hêjayî lêpirsînê ye. Vê carê li nivîsên heyî bêtir diramim û nîrxandineke berfirehtir dikim. Ev nîrxandin hem nivîskar bêtir dide nasîn û hem jî serê pêñusa min tûjtîr dike.

Carina jî ku kovar bi derengî dikeve destê min, dibêjim "hêja bû ez ew qasî li bendê mam!". Dixwaze nivîsek bi tenê be, dixwaze pîrr nivîs bin ku hêjayî pesinandinê bin, hêviyên min zêdetir dîkin.

Xurtbûneke din a kovaran jî, di nava rûpelêni xwe de kedeke pirrhêl dihewîne. Dibe ku xwediyeckî kovarê, edîtorekî kovarê an jî çend xebatkarêni kovarê hebin; lê, ji bilî van kesan ên ku kovaran zindî dîkin, nivîskar in. Her nivîskarek bi dengêkî bi rengekî curbecur kedekê dide kovarê û kovarê li ser piyan dihêle. Du fêdeya vî tiştî heye: Hem kovar bi nivîskaran dewlemendtir dibe û hem jî bi saya kovarê nivîskarênu derdikevin. Herçî Nûdem e, xwedî û editörê wê Firat Cewerî be jî girîngiya editör mijareke din e-, ên cihêrengiyeckê didin kovarê gul in, nêrgiz in, hermel in, sosin in, nefel in...

Cezanne dibêje, hişmendîyeke rengan jî heye, divê hunermend serê xwe li ber vê hişmendiyê bitewîne, ne li hemberî hişmendiya xwe!.. Li gora vê gotinê divê serbixweyya nivîskarêni kovaran di ser guh re neyê avêtin. Xweîfadekirina wan, cihêrengiya wan û zimanê pêñusa wan ruh dide kovarê. Bi tenê editör weke hilbijêrekî peywirdar e. Çi kîmasî hebin aydî nivîskér e. Çi qasî nivîs nebaş bin jî li gora hin qayideyan-, divê editör li wan bi xwedî derkeve û ku nivîsê di kovarê de neweşîne jî, divê bininxîne. Li gora vê helwesta editör, nivîskarêni hay ji xwe heyî derdikevin.

Mirov dikare hêza kovaran û bi taybetî rola Nûdemê ji pîrr hêlan ve bininxîne, lê bi kurtaşî mirov bibêje, encax zimanekî xurt û dewlemend bi rîya kovaran rola pirtûkan li hêleke din- ve bipêş bikeve. Hêvidar im wê kovara Nûdemê di gellek deh salêni din de bidome!.. □

10 saliya kovara Nûdemê pîroz be

NECÎB BALAYÎ

Li destpêkê ez ro saliy kovara Nûdemê li xwediye wê û tevaya aşiqên peyva kur-dî pîroz dikim, daxwaza berdewamiyê ji bo vê çiraya geş û rohin dixwazim, hê-vîdar im tîrêj û roniya wê hîç carekê kiz û kêm nebe.

Ez xwe wek xwendevanekî berdewam yê vê kovarê dihesibînim, çendî ez karibim min ew bi dest xistiye û rûpel rûpel xwendiye, nirkandina kovareke weha jêhatî, ez nikarim bi çend peyvan bînime ziman, kovareke weke Nûdemê pêwîstî bi lêkolîn û şiroveyên kûr û dûr heye, lê tenê ez dikarim derheqî Nûdema jêhatî vê bêjim ku wê mohra xwe bi hêz li dîroka rojnamevaniya kurdî xistiye û bûye hevşop û heval-benda Hawar, Gelawêj û Sirwe.

Dibe kes hebin bêjin çîma bi tenê ev herçar kovar?

Ez dikarim weha bêjim, ji ber ku di pêvjoya dîroka rojnamevaniya kurdî de, stî-lek tesbît bûye ew jî ew e (destpêkirin û paşî rawistan) lê van kovarên navborî xeba-teke dirêj û bi rûpelên zêrin ji zimanê kurdî re xebat kirine, xwendevanê têni yê peyva kurdî di meytheleyên nazik û hesas de têr kirine û şehiyana peyva kurdî li ser rûpelên wan hatine girêdan, xizmeteke dûr û dirêj ya ziman, edebiyat, folklor, hûner, tablo û çanda kurdî kirine, bi taybet dikarim bêjim kovara Nûdemê bi zima-nekî kurdî hema hema standart weşanên xwe berdewam dike.

Kovara Hawar ji 1932- 1947 li Şamê bi dehan hejmar weşandin, kovara Gelawêj ji 1939- 1949 li Silêmaniyê dîsan bi hezaran rûpel ji peyva pîroz a kurdî pêşkêşî xwen-devanê xwe kirin, Sirwe li rohilatê Kurdistanê berdewamî hebûye û heye, weke rû-peleke zêrin a rojnamegeriya kurdî dihê zanîn û naskirin, herweha kovara mijara

gotinê Nûdem a xoşewîst ev deh sal in bi dehan hejmar weşandine û kurdên ko-çberiyê sêwî ne hiştine, bûye sedemek weha xurt ku û kesên kurd xwe winda ne-kin, ji wan re bibe diwan û seraya Bedixaniyan, çîrok, helbest, gotar, pexşan û peyvîn evîn û hesreta welat pêşkêşî wan kirine û carna jî bi naz û nazdarî silavî koçk û dîwana aşiqêن peyva kurdî li dûrî welatiyê kirine.

Li ba min karê herî girîng yê Nûdem û xwediyê wê, nivîskar û rojnamevanê hêja Firat Cewerî encam daye ew e, ku tradisyonâ rojnamegeriya kurdî şikandiye, ji so-bat û xeleka berteng derçûye û berdewam bûye, pir nîvîskar afirandine û pêgihan-dine, bûye mînakeke zindî di dîroka rojnamegeriya kurdî de, gihiştiye rêza rûpelên zérîn di dîroka peyva kurdî de û ew kerwanê Mîqdad Mîdhed Bedirxan, Mîr Celâ-detet Bedir-Xan, Mustefa Paşa Yamulkî, Huseyin Huznî Mukriyanî û İbrahîm Ehmedî deshpêkirî, iro ew berdewam dike, hêvidar im riya Nûdemê û xwediyê wê Firat Cewerî wê vekirî be û serkeftinê ji bo wan dixwazim.

Pêşniyara min ew e, hêvidar im Nûdem hêdî hêdî ber bi lêkolîn û nivîsên akade-mîk biçe û bi ci bihayî hebe weşana xwe berdewam bike.

Nûdem her ji hejmarêن pêşiyê min dîtiye, dema ku ez hê li welêt bûm, min ew hembêz kiriye, li derveyî welêt jî dîsan ez wê hembêz dikim, bi berdewamiya Nû-demê em dikarin ji bo nivîsa peyva kurdî berdewam bibin, em hemû bi hev re, bi-bin rîwiyêن rîka Mîrê peyva kurdî, aşiqê zimanê şérîn, Mîr Celadet Bedir-Xan. □

Kelehêن parastina zimên

ROŞAN LEZGIN

Her tim tê gotin ku gelê kurd xwedî çandeke bedew a devkî ye. Zargonina gelê kurd deryayeke bêbinî ye, gencîneyeke gewre ye. Lâbelê, neteweyek her çendî xwedî folkloreke bedew be jî, lê ger di vê heyama iroyîn de; di vê qirna enformasyon û teknolojiyê de ger zûtiñin demê de ev çanda xwe ya devkî veneguhêze çandeke nivîskî, di her warî de literaturêñ nûjen neafirîne û her wiha vê yekê li ser zemîneke nivîskî qerar nestîne, him wê ew mîrasa xwe ya devkî roj ji rojê mîna berfa zivistanê ku li ber tav û barana nerm a biharê ku çawa bêhemdî nikare xwe ji helandin û tunebûnê xelas bike, wê ber bi pêşerojên nedîyar ên windabûnê ve biherike û him jî, wê xwediyêñ wê keleporê bi wê helandinê re di nav tarîtiya dîroka bê-însaf de winda bibin û herin.

Netewa kurd ev serê sedan salan e ku bindestê dewlet û otorîteyêñ biyanî ye ku lewma jî ji sazkirina rih û manewiyateke netewî, ji afirandina çandeke nûjen û her wiha ji taybetmendiyêñ; refleksên xwe yên netewayetî ve lawaz ketiye, pir hindik her tim di nav çarenûseke lipaşmayî û karesateke nedîti; di nav tirejedyayekê de nîvfetisandî maye, ku lewma jî dike nake li hember hêzên serdest di şertên newek-hev de bêgav dimîne têbikoşe ku ev jî her tim bi xwe re şikestinêñ dijwar bi xwe re tîne. Dîsa mirov dikare lê zêde bike ku gelê kurd ta iro ji bo îdealêñ azadkirina xwe ya netewayetî xwîna ku rijandiye, berdêla ku daye belki bi têri dehan caran azad kîrinê dike, lê mixabin di dirêjahiya dîroka xwe de tu car negihaye ew xewna xwe. Çima? Mîna ku her dem hatiye gotin û niha jî her tê gotin ku tu car yekîtiyeke qewî pêkneaniye. Bêguman sedemên neyekbûneke qewî gelekin, lê sedema herî bin-gehîn û sereke ci ne hîn jî başebas nehariye zanîn û dahurandin. Di nav xelkêñ cî-

hanê de û netewayên din de tu car nehatiye dîtin û gelek jî bi xwezayî eşkeraye, ku tu car jî yekîtiya netewayekê li ser hîmêن îdeolojîk-politîk û aborî pêk nehatiye û ev yek jî qet ne mimkun e. Ger neteweyê bindest ên cihanê ku yekîtiyekê li hember zordestan pêkanîne û azadiya xwe bi dest xistine ev yek jî bi saya du hêmanê bingehîn pêk hatiye, ku ev jî Ziman û Ol e. Lê dîsa çi xebînete ku her tim partî û bizavêن ku ji bo rizgarkirina neteweya kurd dest bi şer û berxwedanê kirine û xwes-tine ku gelê kurd yek bikin da ku karibin xwe dirêjî azadiya xwe bikin, her tim serî li îdeolojî û doktrînê politîk ên biyanî dane û zimanê xwe, çanda xwe ku sedem û delîlên hebûna wan e, piştguh kirine û bi çavên biyaniyan lê nihêrîne. Lê heyhat û heyhat ku tu car jî di ser zemîna ew doktrînê biyanîyan de kurd nekarîbûne xwe dirêjî ew azadiya ku ewçend dixwazin bikin û her tim pêşîra xwe ji şikestinêن tira-jîk xelas nekirine, berevajî, cûdatiyêن di nav civaka kurd de her kûrtir bûne. Hezar car heyf û xebînet ku di dirêjahiya dîroka kurdan de hemû hêzên siyâsî yên kurdan hîn jî hay jê nînin, ew yekîtiya ku ewçend tê xwestin, ew hêz û potansiyela berxwedanê ya li hember zordestiya dijminêن qewmê kurd bes bi tenê dikare li ser hîmê netewayetî çê bibe. Mamostayê giramera kurdî Mîr Celader Bedirxan di kovara Hawarê de di sala 1932an de wiha dibêje: Du hêman hene ku neteweyeke bindest dikarin azad bikin: Ziman û ol. Ji ber ku ola gelê kurd û neteweyê serdest yek e û li heman perestgehî, li pey heman pêşnimêjî ibadeta xwe bi cih tînin û di ser de jî, ew birariya ummetî heye di nava dîndaran de, lewma jî bi tenê di destê gelê kurd de çeka ziman dimîne. Ger kurd xwe li zimanê xwe bipêçin, rê heye ku helbet xwe bigihînin azadiya xwe. Lê hezar car heyf û xebînet ku ev destûra rewnak, ev perspektîva gerdûnî bala siyasiyêن kurdan nekişandiye, ji ber ku her tim bala wan li ser doktrînê derveyî bûye.

Bêguman gelek partî û şexsiyetêن siyâsî yên kurdan hene ku di riya azadkiranina neteweya xwe de berxwedaneke gewre pêkanîne; pişta xwe sipartine çiyayêن asê yên Kurdistanâ qedîm û ji ava kaniyêن xweşmêran vêxwarine û welatê xwe seranser bi xwîna xwe sor kirine. Lê mixabin, ev şerîn dijwar i sext her tim li ser zemîneke bi tenê îdeolojîk dane meşandin û doza netewayetî mîna terîmeke neteweperiştiya kûvî = ilkel miliyetçilik hesibandine û bi destê xwe damar û delîlên jiyan û hebûna xwe tune kirine ku hîn jî ev tiradîsyona karesat berdewam e û roj ji rojê ew rih û manewiyata netewayetî ku ji mêj ve qels ketibû niha dike ku bi tevayî tune bibe û xaka reş bi şanî me bê dayîn. Bala xwe bidinê; bi dehan bizavêن siyâsî yên kurdan hene û di bin sîwana wan de bi deh hezaran kadroyêن siyâsî canê xwe fedâ kirine û her wiha çiqas îdeolojî, doktrîn û felsefe nemaye ku bi ezber zanîbûne û dizanin, lê

çî heyf ku ta niha hîn lîteratureke politîk, felsefîk, aborî dîrokî a bi zimanê kurdî pêk nehatiye. Lewre tu kesî bîr nebiriye an jî qet jê re xem nebûye ku çandeke siyasi ya nîskî bê afîrin, da ku hismendîyeke netewî bibe mîras ji bo pêşerojê, qet nebe me dil dixwest ku ta iro ew bi cîldan pirtûkên ku hatine xwendin û perwerdeya siyasi ku li ser wana hatiye kirin qe nebe wergeriyana zimanê kurdî. Bi tenê di dirêja-hiya dîrokê de mîna ku bi tenê pirsa ziman, a çend kesênu ku xwedî rehêne edebî û hunerî ne, li hêviya wan hatiye hiştin û bes li wan hatiye spartin. Jixwe, ta iro di nava bizavêni siyasi ên kurdan de hin nîqaşekê ku di warê hebûna neteweyekê de rola ziman çiye nehatiye kirin. Hema mirov dikare bi hêsanî bibêje ku ji sê payê kurdan payekê jê xwerû siyasetmedar in; dikarin bi saetan li ser politîkayê, îdeolojî û doktrînan konferansan bidin. Ger mirov vê yekê mîna pîvanekî hilde divê heta iro bi hezaran pirtûkên bi zimanê kurdî ên felsefe, îdeolojî û her wiha ilmê politîkî hebûna. Lê mixabin, hingî bi ew karê politîkayê ve mijûl bûne ku lewma jî ev karênen mîna wergera pirtûkan a bo zimanê kurdî û her wiha nivîsandina bîrdoziya xwe a bi zimanê ku ji bo wî têdikoşin, ji bo van karêne hêja wextê wan tunebûye! Divê bi kar û barê ziman re bi tenê çend kesêni helbestnîvîs eleqedar bibin, li gor wana ev yek bes e û zêdeye jî!..

Belê iro ziman û bi wî te jî çand û nasnava kurdî, ew rih û manewiyata netewî li hember xetereyeke mezin dike ku serî bitewîne da ku em hemû êdî rehet bin! Bê-guman sedemê vê rewşa zimanê kurdî di serî de jixwe dijminen qewmê kurd heta qirikê tawanbar in û jixwe ji bo wana ev yek qet nayê Înkar kirin jî, lê iro bi qasî gunehê wan û heta bi ji wan jî bêhtir êdî mirov dikare bi hêsanî bibêje ku siyaset-medarên kurdan tawanbar in. Ger iro hîn jî ev ziman û çand li piyan e û ji bo pêşerojê li ber xwe didin, di vê serdema nûjen de mirov dikare bi hêsanî bibêje ku bi saya kovar, rojname û pirtûkên kurdî ye û her wiha ew zarokên jîr û dilsoj ên vî xelkê mazlûmin ku dil û mejiyê xwe ji bo pêñusa xwe dikin hibr. Lewre jî mirov dikare bi hêsanî bibêje ku kovar kelehêni parastina ziman, çand, nasnav, rih û manewiyata netewî ne û ew nivîskarên edeba kurdî jî-siyasi ne tê de- her yek neferekî can-fedayê nobedarên wan kelehan in.

Ka hela bala xwe bidinê, kovara Hawarê ku bitenê kesekî entelektuelî jîr li pey bû, ew kelepora ku ji netewa kurd re hîştiye ma ne ji mîrasa rêxistina Xoybûn, serî-hildana Agirî û ya Şêx Seid bedewtir e? Kovara Hawarê di dema xwe de ji entelektuelên kurdan re bûye zemîneke xurt ku ew karibin tê de şax û zîl bidin. Belê, ger Hawar tunebûya gelo wê Cegerxwîn hebûya? Ku dema srûda "Kine em?" tunebûya wê çawa werzek ji werzêni netewa kurd kêm nebûya?

Ka hela bila ji kerema xwe re kurd û bi taybetî jî hemû siyasetmedarên kurdan piçekî bifikirin ku ev kovarêن heyî bila weşana xwe rawestînin, gelo wê çi li pey wan bimîne? Wê kîjan kelehêن siyasetan karîbin ziman û çanda kurdan biparêzin?

Îro demografiya Kurdistanê seranser felişîye û xelkê kurd çar naçar li keviya bajaren xerîb, li derî û kerîyêner xerîbiyê diçilmisin. Ew çanda wana heyî, zimanê wan di gundê wan de, bi pel û poten wan re di nava taramen agir de şewitî û xelk bêgav maye ku li bajarêن biyan fêrî zimanêner serdestan bibin..! Jixwe fêrbûna ziman û çanda serdestan heman demê de ji bîra kirina tunekirina- ziman û çanda xwe ye. Ger îro, ku hîn jî wext heye, di serî de siyasetmedarên kurdan ku ewqas ji bo Rizgarkirina Neteweyê Têkoşiyane! zûtirîn demê de girîngiya ziman û çanda netewî tênegihêن û hemû hêza xwe nekin bin xizmeta neteweya xwe, ji bo sazkirina rih û manewiyata netewî ji dil hewl nedin xwe, helbet wê nekarîbin xwe bigîhînin ew xeyala xwe û bi xwe re xaka reş bi şanî gelê kurd jî bidin. Û helbet bila neyê ji bîra kirin, ew yekîtiya ku ewqas dixwazin pêk bînin bitenê dikarin li ser zemîna ziman û bi sazkirina manewiyateke netewî pêk bînin.

Belê, xeter e ji ber ku gelekî mezîn û sosrete ku lewma jî ji Hawarê û bi vir de ye ku ev mijar jî bi awayeke sosret her tê vegotin, lê mixabin tew tu xema siyaseta kurdan jî nîn e. Dibe ku ew hîs dîkin da ku xwedîyê van gotinan dibêjin çîma pirtûkênen me nayêñ xwendin! Ku şikir ji Xwedê re em nexwedî pirtûkekê nin ku em bixwazin bila bê xwendin!

Nûdem dehsaliya xwe pîroz dike. Di rojêñ dijwar de, di rojêñ ku zimanê kurdî mîna berfa biharê li ber tava germ û barana nerm bêhemdî bêxwedî- dihele de wê mîna kela Amedê, mîna birca Belek û mîna kela Mêrdînê hembêza xwe ji zimanê kurdî re vekir û mîna dayikeke dilovan ku bi şîrê xwe yê spî û helal dergûşa xwe bimijîne, bûye kelehek ji kelehêن canfeda î parastina ziman, çand û edeba kurdî. Di-vê tu bijî Nûdem, lewre îro eniya berxwedana ziman û çanda kurdî, nasnav û manewiyata neteweyî ji her wextî firehtir bûye ku ta niha bi tenê zilm û qedexeya dijminen kurdan hebûn, lê îro sersarî û xemsariya siyaset û pê re jî a civaka ku li dinê belavbûye ji her rojê bêhtir berdewam e. Tu her bijî û dîrok wê heqê her kesî bike destê wan helbet! □

Amed, 2001

NÛDEM di xizmeta ziman û çanda kurdi de ye

YAKUB KARADEMIR

Xwedi û berpirsê Nûdemê kekê Firat kurtenameyeke elektronîkî ji min re rîki-ribû û di nama xwe de digot ku "ji dilê te were tu dikarî kurtenivîsekê ji bo dehsaliya Nûdemê binivîsî?" Di rojeke wiha de ji bo kurdi û her wiha jî ji bo Nûdemê çawa ji dilê meriv neyê ku meriv çend rîzan binivîse.

Di gurranâ geşbûna tevgera netewî û weşanên kurdi, ci bi kurdi û ci jî bi tirkî li bakûrê welêt, di destpêka sala 1994an de ku me jî wê demê rojnama "Medya Gunesî" li Stembolê derdixist jimareyeke Nûdemê, nizanim jimara çandan bû- ku bi riya postê weke protokol ji me re hatibû şandin kete destê min.

Kovareke edebî ku ji serî hete binî, xwerû bi kurdi, bi teknikeke baş, li ser kaxezke bikalîste hatibe çapkirin û ji her tiştî girîngitir ji bi zimanekî pir fesîh hatibe nîvisin, li ser her kurdekî ku ji xwendin û nîvisandina zimanê kurdi mahrûm be di-kare ci tesîre bike li ser min jî tesîreke wiha kir ku ez bi hebûna kovareke wiha pir şad û bextewer bûm û min xwest ez her gav wê taqîb bikim.

Di van şertên roja îro de ku rojname û kovarêne wek Armanc, Nûbihar (xwerû bi kurdi û mehane), Roj, Roja Teze (heftane bi kurdi û tirkî), Stêrka Rizgarî (bi kurdi û tirkî), Gundem (bi tirkî) ku kurdên bakur derdixistin rawestiyane, pîrozkirina dehsaliya Nûdemê ku li Swêdê derdikeve hejayî pesindanê ye.

Helber ferqek di navbera van kovar û rojnameyên navborî û Nûdemê de jî heye. Kovar û rojnameyên din li gel xizmeta xwe ya di warê çand û edebiyata kurdi de xwedî iddiayêni siyasi jî bûn. Lî Nûdem bitenê di xizmeta ziman û çanda kurdi de ye, di vî warî de roleke girîng û hêja lîstîye û ez hêvî dîkim ku wê vê xera xwe biparêze û gelek deh salêñ din xizmetê ji ziman û edebiyata kurdi re bike.

Bi hêviya ku Nûdem hemî ronakbîr û edîbêñ kurd li dora xwe kom bike û li ser axa welêt derkeve... □

Ziman û wêje nasnama netewan e

RUKİYE ÖZMEN

Di dîroka mirovahiyê de gelek şer çêbûne û çêdibin, sedemên van şeran bi pîranî ji ber parastina çand û nasnama netewî bûye. Nijad serkana civakê ye, civak jî malabata netewê ye, ziman û wêje jî nasnama wê ye.

Netewa bê nasname neteweke bê hîs û bê raman e, felc e û nayê nasîn li cîhanê, ji lew ji hemû mafêñ xwe yên xwezayî mehrûm e. Ji para xwe par nagire û rûmera wê di bin lingan de diperçiqe, di derya êş û neheqiyê de dixeniqe, nikare avjenî jî bike.

Pêşvebirina zimên parastina mîrasa şaristaniyê ye. Pêwîstiya çandê ji bo netewan mîna nanê li ser sıfra danêñ rojê ye, ger rîsê çîrokê wê netewê neyê rîstin, dîroka wê neyê nivîsîn, stranêñ wê neyên parastin û helbestên wê neyêne guhdarkirin, wê ew nan neyê ser sıfrê, ci hişkere ci bi dizî wê biçe li ser sıfra hinêñ din an jî hinê xwe lê bidin pêş.

Her çandek mîna stêrekê ye li singa gerdûnê diçirise, lê ger çandek jibîr bibe, li aşîmanê keskê mirovahiyê ew stêr vedimire û di şûna xwe de qadeke tarî dihêle, pêxistina wê ji nû ve pir xebat dixwaze.

Netewa wêje û zimanê wê lawaz bibe û bimîne bê xwedî, wê sih bigire ser xweşikbûna wê, bicemide û rengê libasê wê winda bibe, dîmenê ruyê wê hêdî hêdî bixeyîre.

Êdî pencera jîyana wê netewê tê perdekirin, piştî demekê, ew perde kevin dibe, dirize û dikeve ber bayê celadan û ji holê radibe. Mîna ku bi salan e çand û zimanê me li ber devê şûrêñ celadan tê hekandin û demekê bi windabûnê re rû bi rû dima.

Jî bo ku stêra ezmanê me tim biçirise pêwîst e em zimanê xwe biparêzin, mezin bikin û pêş ve bibin, da ku gulên baxê çanda me ges bibin û bi bêhna xwe ya xweş me bextewer û serfiraz bike. Zimanê me zimanê dergûşa mirovahiyê ye, divê em himbêz bikin û jê hez bikin, wê hezkirinê her roj vejînin û bi awayekî zanistî bigîhêjînin asteke hemdemî, ji ber ku zanebûn bi xwe hebûn e.

Ew sêhwana ku li ser serê me re hatîye vegirtin û hîs û ramanêne me di bin de hatîye sînorkirin, tevî hemû zehmetiyan û dayîna tekoşînê li hember sernetawandina li bin vegirtina wê, êdî ew sêhwan diqete û ew sînor dişike.

Îspata vê yekê ji rastîya dewlemendiya ziman bûye, ku kovar, rojname, roman û hwd pê hatine nivîsandin û têne nivîsin cî li welat û cî li diaspora.

Pir kovar hatin û têne weşandin ji serkaniya xwe dûr in jî, lê di nava hewldanêne mezin de ne ji bo ku ziman û çanda me biparêzin û bi pêş bixin. Kovar Nûdem jî yek ji van kovaran e ku wê jî mîna gelek kovarê din jiyana xwe li biyaniyê dest pê kiriye û hîna li biyaniyê didomîne.

Xizmetek bi rûmet ji bo ziman û çanda kurd dike, kurdan bi zimanê wan yê dayîkê, ji çanda wan agahdar dike, dide nivîsin, dide xwendin û dide heskirin.

Çendî ne li ser xaka xwe ye û bi hezarêن kilometran ji çavkanîya xwe dûr e jî lê dîsa mîna berfinê di nava sir û seqemê de serê xwe bilind dike, ji biharê dûr jî be, mizgîniyâ buharê dide.

Hêvîdar im ku kovara Nûdem wê bêhtir rê bide zaravayêن kurdî û bi lêkolînêne xurtir me ji me agahdar bike; bibe xwedî jiyanekê herheyî û di jiyana xwe de tim serkeftî be. □

NÛDEM herdem hat seredana me

ŞERMİN BOZARSALAN

Carek ji caran Nûdemê bala min jî kişand. Min lê temâse kir. Ew, ji aliyê form û estetikê ve rind bû. Rûpelên wê tim bi zimanê kurdi hatibûn xemilandin. Di nav de, nivisên edebî û gelêri xwe rêz kiribûn. Ew ji bili çand û edebiyata kurdi girêdayî tu derê nebû. Ez jî li kovareke weha digeriyam. Min dixwest bibim xwendevaneke baş a zimanê kurdi, zimanê xwe pêşta bibim, perspektîfa xwe ya çandî fi-rehtir bikim. Nivis an jî nûçeyên siyasi yên bi kurdi, bi tenê bes nebûn ji bo wê armancê.

Nûdem, dest pê kir hat mala me. Min digot ew ê jî iro, sibê ji me re bibêjê bimînin di xweşiyê de, em nema hew bibînin. Ez jê razî bûm. Min nedixwest ew, ji me xatir bixwaze û êdî qet neyê an jî ji nişka ve têkiliya xwe ji me qut bike. Silava Xwedê jî nede me. Lê di jiyana xwe ya li Swêdê de ma em hindik caran bûne şahidê tiştên weha. Bi çendîn kovar derdiçûn, beriya ku em navêwan hîn bibûna ew dihatin girtin. Hin nas dikariya di carekê de xwe ji mirov dûr bikirana û bibûna nenas. Ên ku dost xuya dibûn, bê ku te fêm dikir ji bo çi, ji nişka ve dibûn neyar. Dezgeh ava dibûn, dezgeh hilidişîyan. Yek diçû, yek dihat. Heta niha jî wisa didome.

Kêmdezgeh û kêm kovaran xwe demeke dûr û dirêj parastine. Yek ji wan Nûdem e. Ew hê jî dijî û di riya xwe de berdawam e. Ew, bi ıstîkrar e, xwedîyê sebreke fireh û înadeke bê tawîz e. Lewra serê me bi wê bilind e.

Nûdem, pirr rengîn û pirr dengîn e. Tê de kes û dîtinêna cuda xwe ifade dikan.

Lê gellek mixabin tê de nîvê civatê, jin ne xuya ne an jî kêm xuya ne. Ez bawer im Nûdem dikare di vî warî de zêdetir rolê biltze û bi her awayî layiqê navê xwe bibe.

Nûdem kovarek e baş e, lê dikare çêtir û hîn jî firehtir bibe. Ew, dikare bibe kovara gelek aliyên civatê. Girîng e kesên cihê, cihê xwe tê de bibînin. Jê gelekî tamê bigirin. Gellek jê fêm bikin û jê hez bikin. Ji bo vê yekê divê, wêneyêni jiyanê yên curbecur ku ji terefîn kesên cuda ji her besên civatê ve hatine boyaxkirin, di Nûdemê de zêdetir cih bigirin. Herweha ez dixwazim nivîsên ku dema me ya îroyîn tînin zimên jî tê de zêde bibin.

Nûdem, divê nebe cihê polemikan û di vî warî de hesas bibe. Karê kollektîfî herçiqas zor bibe jî, di vê merhaleya jîyana Nûdemê de redaksiyoneke xurt dikare wê hîn pêşta bibe. Di hin nivîs û çîrokan de tiştê ku bala min dikişîne ev e ku nivîskar zorê didin xwe da ku zimanê entelektuelî bi kar bînin. Ji bo nivîsên edebî, rola zimên girîng e. Lê dema mirov di xebitandina gotinan de gelek li ser formê bisikine naverok dikare winda bibe, nivîs bê mane û bê hîs bibe.

Rola Nûdemê, di pêşveçûna ziman û çanda kurdî de mezîn e û layiqî pesnê ye. Ez, ji bo Nûdemê jiyaneyeke dûr û dirêj daxwaz dikim û ji bo vê xebata hêja û berhemên giranbiha xwedî û berpirsiyarê giştî Firat Cewerî pîroz dikim.

Nûdem, her berdewam be, da ku tu hertim di dema xwe de werî seredana me. □

NÜDEM zarokek deh salî

MERVANÊ KELEŞ

Deh sal derbas bûn?! Rast e?!

Zarokek nazik û zirz!

mûma dehan vedimirîne!

Deh şaxê bi nêzîkî çil xuncan xemili.

NÜDEM...

Pir zor û zehmetî, pir pevçûn û xirecir, pir devavêtin û zikreşî, lê pir hez-
kirin û hêvî hebûn -hene li dor!

NÜDEM...

Bi mejiyê zorekek jîr û bêcîr ji dayîk bû... bi çarpiyan çû... Nûdem di
dehsaliya xwe de zarokek e, dibe ku hê bi çarpiyan diçe lê hêdî hêdî dike rabe ser
piyan... NÜDEM bû navê çend zarokan jî...!???

Binerin, pir kesên ku di destpêkê de bi tundî dijminê Nûdemê bûn, îro mîva-
nên wê ne, nivîskarên wê ne!!!

Gelo ev çawa çêbû???

Gelo ev bi hêsanî pêk hat?

Gelo ev ne bi kedeke bêwestan û dilekî mezin hat?

NÜDEM...

Çend kovar berî wê hebûn
û -bedaxewe- rawestiyan?

Çend kovar bi dû de derkerin
û -bedaxewe- rawestiyan?

Nivîsên min û -pir kesan- bi weşana Nûdemê re weşîyan û pê re berdewam bûn helbet ez xwe yek ji nivîskarên Nûdemê dibînim û bi vê yekê jî serfiraz im, tev li ku pê re û yekser jî dibêjim Nûdem ne bê şâşî bû. Kî dikare di karekî weha de bê şâşî be! Ü kî dikare di bin barêن giran de netewe?!

NÛDEM...

Gelo:

- 1- Ci xizmet ji zimanê kurdî re kir û dike?
- 2- Ci xizmet ji wêjeya kurdî bi tev babetên wê kir û wê bike?
- 3- Çend nivîskar û xwendevan bi xwe re gihand?
- 4- Ci şâşî, nerastî û çewtî kir?
- 5- Ü ci û ci û ci...?

Lê bersiva van pirsan û gelek pirsên din gelo hêsan e?

Gelo ev ked ne hêjayî lêkolîn û lêgerînê ye?

Çil hejmar û kedek deh salan e, hêja ye ku em li ser rawestin /ci dost û ci nedost/ û binixînin û birexnînin? Ü helbet her ku pirsên me li dor Nûdemê pir bibin û jîr bin ew ê jî ewqas di pêşerojê de bi berhemtir be!

Lê ji bo ku sûd kûr û fireh be gereke em ne bi lez û bez van lêkolînan bikin û gereke ev kar ji alî kesen akademî, profesyonel û kesen ku ji nêz ve Nûdemê nas dikin bête kirin.

Qet mebesta min nîne ku di vê kurtenivîsê de li ser van pirsan rawestim!

Di vê nivîsê de bêtir dilê xwe vekim ji ber ku em jî deh salan bi Nûdemê re mezin bûn, sî salî bûn, bûn cil salî.

Ev nivîsa dil e, ne a felsefe û jihevderxistinê ye!

Em bi hev re mezin dibin, Nûdem dema zaroktiya xwe dijî, em jî kêm zêde bixwazin nexwazin ber bi kalbûnê ve diçin! Gelo xortêñ me vê zarokê wê çawa perwerde bike? Çawa bikin keçeve çeleng?

Dîrok wê bi ci çavî li Nûdemê binere?

Gelo Nûdem wê bibe klasîkeke wêjeya kurdî û çawa? Ü çima?

Xwedîkirina kovareke kurdî deh salan çendî dijwar e? Ën ku ev kar kiribin dizanîn, ên ku Nûdemê ji nêz ve nas dikin dizanîn ku xwedîkirin ci giran û bê ser û bin bû!

Tû û Nûdem

Ew û Nûdem

Em tev û Nûdem...

Çi heye ji hev re
bêjin?!

Dîlana me û Nûdemê wê çawa
berdewam be?

Gelo Nûdem bê piştgirî ji nivîskar û xwendevanan wê neweste?

Gelo Nûdem bê rexne û nîrxandin wê xwe necû û li dor xwe negere?

Gelo Nûdem bê nivîsên estebilind û çap û teknîkek modern wê bikaribe xwe nû
û hêja bike? Û karekî weha ci jê re pêwîst e?

Bûkek çendî ji malbateke jar be jî bê hinek xemlî û xêz dibe? Ev xemlî û xêz hûn
tev in!...

...Berpirsiyariya me teva ye. Ger em xwe berpirsiyar bibînin Nûdem wê bi xemlî
û xêz bibe.

Ez zanim Nûdemê çawa dest pê kir û bi ci zor û zehmetiyê, bi ci dilsozî û hêviyê
û bi ci desttengiyê!

NÛDEM...

Edî yek ji kovarênu ku kêm zêde bi serhişkî be jî xwe ber bi Kurdistanê ve
dikişîne.

NÛDEM...

Bi nivîsan mezin bikin!

Bi hêviya ku Nûdem bibe hawara zimanê kurdî li biyanîstanê em dehsaliya wê
pîroz dikin.

NÛDEM li xwendevanên xwe, li nivîskarênu xwe û li wêje û zimanê kurdî pîroz
be.

Uppsala, 08-07-2001

Nûdem dergisinin yeni sayısı



İsveç'te 3 ayda bir Kürtçe olarak yayımlanan kültür, sanat ve edebiyat dergisi Nûdem'in 6'ncı sayısı çıktı. Derginin bu sayısında Paris Kürt Enstitüsü Başkanı **Kendal Nezan**, merkezi İstanbul'da bulunan Kürt Enstitüsü Yönetimi Kurulu üyesi **Fegi Hüseyin Sağınç** ve Brüksel Kürt Enstitüsü Sekreteri **Derwêş M. Ferho**'yla yapılmış üç söyleşi yer almıştır. Söylesilerde yetkililer, enstitülerin kuruluşundan bugüne kadar yaptıkları faaliyetlere, enstitüler arasında ilişkilerden Kürt kültürünün sorunlarına kadar bir dizi soruyu cevaplıyorlar. **Mehmed Uzun**'un "Karışık Renklerin Ressamı: Hiner Selîm", **Rohat**'ın "Kürt Destanlarında Kadının Direnişi ve Üstünlüğü", **Mahfuz Mayî**'nın "Bir Ulusun İllerleşmesinde Edebiyatın Rolü", **Medeni Ferho**'nun "Şîir ve Şâir Üzerine" bu sayıda yer alan yazılar. Her sayısında dünya edebiyatından çevirilere de yer veren Nûdem'in bu sayısında da iki çeviri yer almıştır: **Firat Cewerî**'nın **Henry Miller**'den çevirdiği "Madmazel Clauda" ve **Şahînê Bekirê Soreklî**'nın **Exupery**'den çevirdiği "Küçük Bey" adlı hikayeler. Derginin diğer yazıları şunlar: **Ziya Şeker**'in "Kürt Şair: Sinan Sabri", **Zeynelabidin Zinar**'ın "Pertew Begê Hekari", **Siyamend Birahim**'in "Yaralı Kalemîn Binicisi: Seydo Goran?" üzerine yazıkları, **Haviz Qazi**'nın **Müzisyen Dilşad**'la yaptığı söyleşi ("Sanatçılarını Tam"), **Fawaz Hussain**'ın "Rüya Köşkü" adlı hikayesi. Bu sayının şairleri ise: **Rojen Barnas**, **Ömer Okumuş**, **Mervanê Keleş**, **Ferhad Pîrbal**, **Bedirxan Epözdemir** ve **Sinan Sabri**. Nûdem dergisi, Gamla Landsv. 36 S-740 41 Morgongava / Sweden adresinden temin edilebilir.

Gündem, 9 Temmuz 93



Kürtçe yayımlanan sanat, edebiyat ve kültür dergisi Nûdem'in 19. sayısı çıktı. Derginin bu sayısında genel olarak aydın sorununa yer verilmiş ve özellikle Kürt aydınlarının konumu değerlendirilmiştir.

Firat Cewerî Kürt Entellektüelleri adını verdiği yazısında Bedir-Xan'ların Kürt aydınlarının üzerindeki etkilerinden, Kürt aydınlarının eksiksliği, fedakarlığı, 70'lerden sonra özellikle üniversitelerden çıkan aydınların çabaları, Türk aydınlarının Kürt sorununa ve aydınlarına bakışı, 12 Eylül'den sonra yurt dışına, özellikle İsveç'e yerleşen Kürt aydınlarının çalışmalarına yer verilmiştir. Firat Cewerî, Kürt aydınlarının kendi güçlerinin ayrılmaz olmadıklarını, bu yüzden de ülkelerinde süren trajediye karşı soğuk, uzak ve kendilerini bu trajedin dışında tuttuklarına dikkat çekmiş.

Bu konudaki diğer yazılar, Rojan Hâzîm'in, Aydin ve Aydin Hareketi, Şâhînê Bekirê Soreklî'nin Entellektüel ve Entellektüelizm, Edip Polat'in, Entellektüel, Derwêş M. Ferho'nun, Aydının Rolü, Cemîd Bender'in, Kürt Entellektüellerin Sorunu, Şerefhan Cizîri'nin, Politik Aydlınlardır, Medeni Ferho'nun, Sessizlik Aydının Ölümüdür ve Rıza Polat'in, Entellektüel isimli yazılarının yanı sıra, bu konuda başka yazarların makalelerine de yer verilmiştir.

Dergide ayrıca Nelson Mandela ile ilgili bir yazı ve değişik şairlerin şiirlerine yer verilmiştir.

NÜDEM

Termov. 52 2tr.

176 77 Jarfalla-Sweden

Nü Roj. 28 Eylül - 4 Ekim 1996

NÛDEM ji her aliyî ve kovareke nûjen e

ZANA FARQÎNÎ

Berî her tiştî, rola hemû weşanên bi kurdî, çi cure weşan dibe ew zane, di pêşve-birina ziman, çand, huner û wêjeya kurdî de heye. Ligel vê yekê, di vî warî de hin weşan xwedî rol û girîngiyeke hîn zêdetir in. Kovara Nûdemê ji xwedîyê vê taybetiyê ye. Ev serê deh salan e, bêrawestan, bêyî atlebûn di vî biwarî de xebat û leba-ta xwe didomîne û riya xwe ya rast dikudîne.

Bêyî pirole (mubalexe), ez bi hêsanî dişêm bibêjim ku, piştî Hawarê, Nûdemê ku wê ji li xerîbiyê dest bi jiyana xwe ya weşanê kir, rûpeleke nû di kovargeriya kurdan de vekir û bû xweyê navekî taybet û resen. Nemaze ji aliyê çeşnên edebî ve bû dibistanek, bû warekî welê ku wêjevan û wêjehez xwe tê de derbibin. Îcar ji we-lêt dûr, li biyanistanê sergihayîkirina karekî wisa dijwar, nabe para her kesî. Bi gotineke dî, her kes nikare ji bin barekî wiha çêtin wisa bi sanayı rabe û karekî wiha bi-be serî.

Wek gotina dawî ya bersîva vê pîrsê, di nav hemû kovarên bi kurdî de, kovara berbiçav û xuyanî bêpesndan Nûdem e. De îcar kovarek ku xwedî van wesfan be, hûn ji xwe re li ser rol û girîngiya wê ya di warê ziman, çand, huner û wêjeya kurdî de biramin. Hûn tê bifikirin.

Ez ne şas bim sala 1992yan bû ku min cara pêşîn hejmara yekemîn a Nûdemê dît. Şêwe û forma wê, naverok û nivîsarên wê bala min kişandibû û ji kovarên din cihêrengtir bû. Ez vê bibêjim, bandoreke erêni li ser min çekir û hêviyek wisa da

min ku ev kovar her here dê xwe nûjentir, naveroka xwe zengîtir bike û hîn bêhtir bibe pisporê karê xwe. Bi ya min Nûdem gîhiştiye armancê, ev kovar her wiha bû-ye xwediye weşanxaneyekê jî û wê gelek berhemên hêja û giranbiha pêşkêşî pirtûk-xane û zimanê niviskî yê kurdan kirine.

Heyn (dema) ku Nûdemê dest bi weşanê kir, li Tirkîyeyê û bakurê Kurdistanê hema bibêje ji bilî du kovaran kovar tune bûn. Ji lew re wê çaxê berhemên kurdî zêde li ber destan tune bûn û çi berhema kurdî biketa destê me em pê zehf kêfawes dibûn. Wekî ku çawa mirov tiştekî xwe winda kiribe û paşê ew dîtibe, a wisa hest û hâsek bi me re çêdibû.

Bi kurtî, Nûdem ji her áliyî ve kovareke nûjen e û mirov dikare bi rihetî wê û kovarên neteweyêñ din bide ber hev û pê serbilind û şanaz bibe. Ew nimûneyeke baş û pêşketî ya weşangeriya kurdan e. □

Di dehsaliya Nûdemê de, em gurzek nêrgiz ji Firat Cewerî re pêşkêş dikan

KONÊ REŞ

Kovara Nûdem ji kurdan re, ji kurdperwer û evîndarên zimanê kurdî te çemekî ava zelal e. Ava vî çemî ji çavkaniyêن zozanêن Botanê, Şerefînê, Serheden, Behdînan, Mêrdînê dizê û di nav bajar û gundêñ welat re diherike...

Welatiyêن dilsoz, tiyêن ava vî çemî ji çand, edebiyat û hunera kurdî, bi hêsanî di-karin tîbûna xwe di nava rûpelên wê de bişkînin û kela dilê xwe hênik bikin.

Min di jiyana xwe de pesnê kesekî sax nedaye, ji bilî ew ên ku xebat û bizav di ber welat, ziman û rewşenbîriya kurdî de kirine û dikan, ew jî ji ber heskirina min ji welat û zimanê dayika min re, û ez di wê baweriyyê de me ku em bi saya zimanê xwe mane kurd, wek ku Mîr Celadet Bedir-Xan gotiye; " ziman şerta heyinê a pêşîn e..."

Belê di roja îro de, neyarêñ me ji çar hawîr ve şerê zimanê me dikan, ji ber ku wan xweş nas kiriye ku hebûna kurdan di zimanê wan de ye û beşekî mezin ji kurdan zimanê xwe winda kirine, bi zimanê biyaniyan diaxivin...

Vêca ger ez îro bi helkeftina weşandina hejmara (40)an ji kovara Nûdemê hin spas û pesnî ji birêz Ferit Cewerî re pêşkêş dikim, di baweriya min de tiştekî normal e û ji mafê wî ye, nexusim pişî deh salan ji xebat û berxwedana bê rawestan di ber ziman û rewşenbîriya kurdî ya giştî de.

Ez vî mirovî mîr û leheng dibînim, leheng ne tenê ew ên ku di şeran de li ber xwe didin, di gelek waran de leheng hene.

Dema ku mirov li panoramaya rojnamevaniya kurdî vegere û berpêl bike, hingê wê jê re diyat bibe ku karwanê rojnamevaniya kurdî di pêvajoya xwe ya dîrokî de

pêrgî gelek kelem û astengên dijwar bûye û gelek leheng li paş xwe hiştiye wek: Mîr Mîqdad Mîdhet Bedirxan, Pîremêrd, Husên Mukriyanî, Mîr Celadet Bedir-Xan, Musa Anter, Edîp Karahan, Salih Yusîfî, û hwd.

Bê guman mirov dikare navê xwedîyê Nûdem jî bi van navan re berde...

Nûdem, ev kovara ku bê sansûr berhemên nivîskarên kurdan di nava rûpelên wê de têne weşandin, çendin car ez bi vê kovarê kîfxwêş û geşbin bûme, dema ku min navê Hesenê Metê ji bakur, Perwîz Cîhanî ji rojhîlat, Bêwar İbrahîm ji rojava, Xe-lîl Duhokî ji başûr û Tosinê Reşîd ji Rewan, bi hev re di nava rûpelên wê de dîtine û berhemên wan xwendine.

Ew berhemên ku xurû bi kurdî û alfabeşa Hawarê hatine nivîsandin.

Di encama vê yekê de, min kovara Nûdemê kovareke Kurdistanî dîtive.

Dudîlî bi min re çenabe û di pêşerojan de ê Nûdem bibe jêdereke bingehîn ji şagirt û kutabiyên dibistan û zanîngehîn Kurdistanê re.

Ji tiştên balkêş ku xwedîyê Nûdemê di van deh salan de pêk anîye, çespandina wê ye ku roja iro bûye cihê razîbûna tev rewşenbîrên kurd, ji ber ku îdeolojiya ku xwedîyê wê li ser dilive; ziman û pêşketîna huner, çand û edebiyata kurdî ye. Bi vê îdeolojiya welatbezî Nûdem di nav tev partî û rîexistinên kurdan de, bi sîngîk fireh hatîye pejirandin. Lê mixabin ku hejmarên wê gelekî kêm dîghêjin welat, tevî ku ez vî pesnê wê yê bêhempa didim, belê kîmasiyêñ wê jî hene û wek ku kurdan gotiye: "Goşt bê hesî nîne" lê tevî ku kêm li welat belav dibe jî, Nûdem bûye dezge-heke zimanê kurdî. Belavnebûna wê di Kurdistanê de girêdayî rewşa kurdan û perçebûyîna Kurdistanê ye.

Belê di van salên dawî de, bi pêşketîna teknolojiyê re, Nûdem jî bi demê re ew sînor û tixûb derbas kirine û xwe ji sansûra dewletên ku Kurdistan dağîr kirine, rizgar kir û roja iro rewşenbîrên kurd li çarkenatîn dunyayê bi hêsanî dikarin navero-ka Nûdemê li ser internetê bixwînin. Anglo Nûdem bi demê re dilive û ev yek di-hêle ku em bibêjin: Nûdem wek stêrek geş e di ezmanê rewşenbîriya kurdî de û sal di pey salê re ev stêrk li ber çavan mezintir, geştir û çîrisitir dibe. Em jî bi vê me-bestê, gurzek nêrgizîn buharî, ji nêrgiziyêñ dora Cizîra Mîr Şeref ji xwedîyê wê bî-rêz Fîrat Cewerî re pêşkêş dikin û temenekî dirêj jê re û ji kovara wî re dixwazin. □

20.06.01- Qamişlo

Kovara Nûdem mîna sibeheke buharê ye

EBDULBAQÎ HUSEYNÎ

Dem çiqasî pêşde diçê, wilo ji gotinên pêşiyân li nik me kurdan giranbuhatir dîbin, û şîrovekirina wan bi tundî şûn digire.

Kurdan berê gotine: "Yek heye bi sedan û sed henin bi yekî".

Ev meteloka han li ser kesên hêja û qehreman ku di jiyana xwe de tiştine hêja kîrine, tê gotin.

Birastî karek wek karê hêja Firat Cewerî ku kovarekê bi vî rengî spehî û dewlemend ji layê tore û çanda kurdî ve idare dike û ji demek dirêj- ku bûye deh sal- serperiştiya wê dike, karekî ne hêsan e, lê karek e ku pir bi dijwarî derbas dibe, bêguman ev kar cihê rûmet û serfiraziyê ye.

Cara yekemîn ku Nûdem gihişte destê min sala 1992an bû, wê demê ez li Şamî bûm li cem rojnamevan Salih Berwarî, vî hevalî hejmara yekemîn dabû destê min û gotibû: "Hevalê Baqî ev kovareke nû ye ku li Swêdê derdiikeve, ez hêvî dikim ku tu li naveroka wê meyzînî, paşê em ê giftogoyekê li ser bikin".

Berwarî, di wê demê ji min xwest ku em hevpeyvînekê ji bo kovara Nûdemê dirust bikin û têde çêla serbora kovara "Zanînê" bikin... û wiha di bin navnîşana Zanînê dilê xwe ji Nûdemê re vekir.

Hevpeyvîn di hejmara Nûdemê ya sêyemîn de belav bû û di wê hevpeyvînê de min bi dilekî xurt di derheqa kovarê de axaft û hêviya min pê geş bû.

Tê bîra min, min di wê hevpeyvînê de peyvek li ser kovarê ji Berwarî re gotibû:

"Kesê ku ev navê bedew li kovarê kiriye, bêguman ew ê mirovekî xwedî ramanên nûjen be û dê hêviya paşerojan li bal peyda bibe".

Ü va ye piştî deh salan ser vê bûyerê hêja Fîrat Cewerî em ji vê baweriyê dûrme-xistin û omîda me bi cih anî û ev ji karûbarêñ wî belû ye, bê çawa ev şitla biçük, bi hemû hunera xwe xwedî kir, ta ku bû darek bejin bilind, ku îro beşêke mezin ya nivîskaran di bin siya wê de vedhesin.

Kovara Nûdem, wek hertişî li dunyayê pêşve çû, naveroka wê ci ji aliyê nirxan-dina berheman, ci ji aliyê dewlemdiya pexşana kurdî, gelek pêşde çûye, ta gihiştiye pêpeloka yekemîn di nava çapemeniya kurdî de, hem li derveyî welêt, hem li Kur-distanê û bi taybetî li cem kurdêñ ku bi alfabeşa latînî dinivîsinin.

Herwiha ji ber ku temenekî wê yê dirêj çûbûye û di gelek serborêñ şînî û şahînî re derbasbûye, ne kîmasî ye ku hin caran tékeve şâşıyan û hinek berhemên qels di nava rûpelên wê de peyda bibin.

Ev kîmasî ne tenê ya kovara Nûdemê ye, lê ya hemû kurdan e.

Nûdem digel wilo ma kovarek azad û serbixwe dûrî girêkên siyasi û bendiya, bi vî hawî xwe bi hemd berda dilê xwendevan û nivîskarêñ kurd.

Niha Nûdem di nav kovarêñ kurd de bûye mîna sibheke buharî bi hemî bêh-nêñ xwe yên xweş. Ü da ku ev buhişt geşir bibe, divê em li kîleka kesen mîna Fîrat Cewerî bin, da bêhna wê buhiştê bi nazenîn bikişînin. □

NÛDEM bi dema nû re dimeşe

ASLİKA QADIR

Cand di dîroka gelekî de rehek bingehîn e. Dîroka gelê kurd dîroka berxweda-na çandê ye.

Dijminên miletê me, bi taybetî tîrkan bakurê Kurdistanê xera kirin, tevlîhev kirin û bi taybetî jî windakirina çanda kurd ji xwe re kirine armanc û bi vê yekê dixwazin cil milyon kurd înakar bikin.

Xwestin hêsayî ye, lê gelo ew ê karîbin bi derewan û dolaban miletêkî qehreman dayinin ser çokan?

Civaka kurd hebûna xwe heta îro jî daye domandin û li gor imkanen xwe çanda xwe parastiye û heta li derveyî welat têkoşîna berxwedana welêt, etîket û kultura gelê xwe bi xwe re kişandiye û dikişîne deran. Yek ji wan jêhatiyan jî, "Nûdem" e.

Nivîskarekî ermenî, Çarêns, dînîvîse: "Eger dixwazî dengê te bibe hêz, bibe tene-fosa dema xwe".

"Nûdem" bi dema em tê de dijîn re hempê dimeşe û problem, xweşî û nexweşî-yen demê, girêdayî bi huner, edebiyar û çanda kurdî ve, bi zimanekî zelal, zanistî û çi gelekî girîng e, ku bi profesyonâlî digihîjîne xwendevanan.

Ez ku "Nûdemê" dixwînim rehetî tê ser min, tiştan jê fîr dibim û ne badîhewa-ye, ku ne tenê entelektuelên kurd lê wisa jî ên miletên cûda-cûda jî xwe li " Nûdemê" dirigin li dora wê top dibin.

Ez dibêjîm xebatkarên "Nûdemê", bi serokatiya xortê ciwan, zîrek û bi marîfet

Firat Cewerî bêwestan kar dikin, ku kovareke bêdereng bigihîjînin xwendevanan û dilê wan xweş bikin. Her bijin...

Mêrekî mezin gotiye: "Heqîqet (rastî) nexweş dikeve, lê namire". Rastiya gelê kurd nexweş e, pêwistî bi du dermanan heye û yek ji wan dermanan jî "Nûdem" e. Sipas ji we re. Ez salvegera "Nûdemê" pîroz dikim. □

Dengbêja radyoya Erivanê, 01.05.29

NÜDEM wek miqnatîsekê evîndarên ziman, edebiyat û hunera kurdî ber bi xwe ve kişand

SERHAD BAPİR

Di warê zimanê kurdî de, nifşê me bû şahidê du bûyeran: yek ji van bûyereke kambax e, wek cinawirekî tiştê derdikeve pêş dixwe, dihêre û diperçiqîne. Ev politîka asîmîlekîrinâ zimanê kurdî ye. Encamên vê politîka kambax êdî li ber çavan in. Rêxistinên kurdan bi zimanê rojname û kovarêن xwe, bi zimanê siyaset û danûstandinên xwe, çiqas alîkariya vê politîka dewleta tirkân kirin, ev hîna ewqas nehatîye gotûbêj kirin. Lewra bi zimanê tirkî li dij asîmîlekîrinâ zimanê kurdî derketin û gotina daxwaza rizgarkirina Kurdistanê bi serê xwe dijberî û xwexapandineke mezin e. Çawa ku mirovekî serxwesî erebeya xwe diajo û di heman demê de ji me re behsa alozî û talûkeya bi serxwesî ajotina erebê bike.

Ya din jî, em şahidê hinek xebatên giranbûha ne, ku ne bi gotinêن vala, lê belê bi kirinêن hêja, anagorî xwe li dijî asîmîlasiyonê disekinin, bi pirsa ziman, edebiyat û hunerê ve mijûl dibin. Ev xebat bi me dan fêmkirin ku ji bo berdewamiya jiyanâ gelan jî, neteweyekî, hewcedariya me bi edebiyat û hunerê jî heye. Anglo gel nikare bi sloganên tûj jiyanâ xwe ya hîsi û ruhî dagire û dewlemend bike, mane û naverok bide jiyanê. Edebiyat û huner jî divêن bi zimanê me çêbibin, da ku bibin mal û milkêن me. Ev xebatên wiha, dema em ji bo 20 milyon kurdên ji bakurê welatê me bifikirin, gelek hindik dimînin. Lê belê li dijî lehiya asîmîlasiyonâ zimên, hiş û mejjîyê kurdan, ew xebat hindik bin jî, gelek hêja û giranbuha ne, pîroz in. Di nava

van xebatên xwenasiyê de bê guman ciyekî taybetî yên kovar û weşanên NÜDE-Mê heye.

Di dehsaliyên 80 û 90 an de mijûlbûna bi zimanê kurdî ji aliyê piraniya rêxistinê kurdan ve mîna tiştekî qor, beredeyî û bêwate dihate dîtin. Ji xwe hinekan, her sal ji me re dubare dikirin ku ji rizgariya Kurdistanê re (ew ji serxwebûna Kurdistanê bû) tiştek nebû, li ber derî bû. Pîrsa zimanê kurdî ji dê piştî serketina şoreşê bi taybetî dê bîhata çareserkirin. Şoreş ji, ji xwe perwerdekarî û danûstandinê xwe bi zimanê tirkî dikir. Kurdish xwestin bi keleşkofê zora Fîş yê dijmin bibin, lê belê pi-hînek li çekek xwe yi ku ji Fîş yê bi héztir e dan, ev çeka bi hêz ji, bê guman zimanê kurdî bû. Bi du çekênu ku herdu hevdu temam dikin ranebûn. Hertim xwestin di deplasmana zimanê dijmin de holê bileyizin û xwestin bi ser bikevin. Lê wan nedîtin ku ji bo kurdan, berxwedana helî mezîn ya sîvîl; bi kurdî axaftin û danûstandin e. Bê guman divê partî û rêxistinê kurdan ji hebin.

Îro êdî piraniya zarokênu kurdan li welêt û li deriveyî welêt ji dayik û bavênu xwe zimanê kurdî fêr nabin. Kurdên welatparêz ku ji dayik û bavênu xwe ên newelatparêz kurdî hîn bûn, lê belê niha ew bi vî zimanî bi zarokênu xwe re naaneyivin, ku ji bîra kiribin ew bi xwe hîn nabin û fêri zarênu xwe nakin. Bi vî awayî naveroka "zimanê zikmaki" berebere vala û pûç dibe.

Hîn ji gelek ronakbîr û zanayênu kurdan pîrsa zimanê kurdî bi serketina şoreşê, ango bi damezirandina dewleta kurdan ve, qet nebe bi statuya federasyon an ji otonomiya herêma Kurdistan ve girêdidin. Şaş û xwexapandin e, bi teralî û kembûna hizra neteweyî a gel qayilbûn e. Lewra ku kurd bi xwe bi zimanê xwe neaneyivin, nedîn û nestînin, weşanên xwe dernexînin û wan nexwînin, guhdarî û temasê nekin, bi kurî ku ew bi xwe li zimanê xwe xwedî dernekevin, ango ku di warê ziman de piranî asîmîle bibin; ne tenê serxwebûna Kurdistanê an ji federayonê, lê belê bi destixtina statuya otonomiya çandî ya çend gundan ji mumkun nîne. Ziman; ku lokomatîfa çand, huner û mîjîyê kurdîtiyê ye, hebûna maşen me dipejirîne, sînorênu xwezayî yê welatê me dide nîşan. Lîwra cûdatiya me wek gel bi tîrkan re, ne reng û ne ji ola me ye, lê tenê zimanê me ye. Dema ku em dev ji zimanê xwe berdin, em bi xwe bi destênu xwe mala xwe xera dikin. Di vê bûyera kambax de sûc û tewan ne tenê yê dijmin e lê para me ji di vî sûcî de heye, lewra di her maleke kurdan de cendermeyekî kurdan an ji polisekî kurdan tuneye, ku zimanê me qedexe bike.

Hûn dibêjin qey, ew dijminênu ku bi salan zimanê me qedexe kir, zimanê me jêkir, ê li me were rehmê û dilovaniyê, ji bo xatirê me ê li seranserê Kurdistanê zima-

nê kurdî li ser me ferz bike? Tiştên ku em ji bo hebûna xwe, ango ji bo zimanê xwe nakin, gelo dê dijmin ji bo me bike? Divê em ji bîra nekin ku li bakurê welatê me, ku pêşeroja zimanê kurdî hebe, ev pêşeroj ê bi destê kurdan bi xwe were avakirin. Ku kurd nebin xwedîyê hizrekî neteweyî û zimanê xwe neparêzin; ê bi hêsanî di nava tîrkan de û li welatê xwe, ê bihelin û ew ê wekî gelekî cûda winda bibin.

Ez behsa wan tiştan dikim, lewra weşanê kurdî û herwiha Nûdem jî di rewşike wiha de derketin û jiyana xwe didomînin. Lê taybetiyeke NÛDEM ê jî heye. Di rewşike ku piraniya weşanê kurdî bi rêxistinê siyâsi ve girêdayîne, herwiha sazgehênu ku xwedêgiravî neteweyî ne, ew bi xwe jî bi rêxistinan ve girêdayîne û xeta siyâsi a rêxistinê dişopînin; NÛDEM bi xeta xwe ya vekirî ya Kurdistanî, li derveyî pevçûn û aloziyên di nav partiyên kurdan, deriyê xwe li hemû kurdan vekir. Civateke wek civata NÛDEMê civateke zindî û saxlem e. Ji ber ku dîtin û ramanên cûrbecûr, carinan rikber têne nivîsin û gotûbêj kirin. NÛDEM liberal e û ev jî camîrtî û dewlemendiya Nûdemê ye. NÛDEM wek miqnatîsekê evîndarênen ziman, edebiyat û hunera kurdî ber bi xwe ve kişand.

NÛDEMê bi me daye ispatkirin ku mirovekî tenê jî, tevî hevkarêن rind, kare karê mazin bike. Dibe ku hinek ji me re bibêjin ku bi kulîlkekê an jî bi çend kulîlkan bihar nayê, lê belê divê bizanibin ku di seqem û sermaya zivistana zimanê kurdî de çend kulîlkênen wek NÛDEMê li derveyê welat be jî, beredayî şîn nabin û nepişkivin. Ev nîşana xêrê ye, mîzgîniya berbanga bihara zimanê kurdî dide me. Divê ev ji bo nivîskar û hunermenden din jî bibe mînak, çawa ku afirandina berhemên edebî û hunerî xebateke ferdî ye, destpêkirin û şopandina kovar û rêxistinê meslekî jî divê bi dest û hevkariya navbera ferdan çêbibe. Ew çax em ê karîbin behsa ferdên xwedî berpirsiyarî bikin.

Kekê Firat Cewerî destê te sax be, pêñûs te her bi rewan û hêz be. □

01-06-05

Nûdem siwareke serbixwe ye, dide pey siwarê revonek û kelehêن parastinê ji zimanê kurdî re ava dike

BÊWAR İBRAHÎM

Dema xewn ji tûrê xewnêن min yê ku bi dîwarê nepeniyê ve daliqandî bû bazdan û bûn rastîyek di jiyana min de, qet min bawer nekir çiko gelek şevan çavêن min li ber naxê tûrê xewnan qerimîn, lê girêkên kûr li wî nexî ketibûn, ta ku ew tûr bi dîwarê jibirkirinê û nepeniyê ve rizîya û xewn ji vî alî û wî alî ve jê bazdan û ketin hembêza min.

Di şeveke havînî de pêlek ji pêlên xewnan ez li ser hespê rastiyê siwar kirim û ji panîyê ta bi anîyê cendekê min şil kir da ku zincirên baweqbûn û xewariyê xwe li min girênedin, şiyar bimînim û karibim pêşewazîya suprîzékê bê peyam bikim, di wê şevê de birêz Fîrat Cewerî li me bû mîvan, piştî ku şînîya çavan li razeyên veşartî mukur hatin, şadûmanî ji nav xaka avdayî fûriya, dostaniya zelal paqîj di lanê şeran de dikeliya û çend dîmenêن zindî ji elboma dûrbûn û nedîtinê xwe vediçîn û li ser dika malekê li gundekî ji gundêن Kurdistanê xwe eşkere kirin, birêz Fîrat Cewerî çenteyê rîwîtiya xwe li ber me vekir, li ser kovara Nûdem peyivî û piştî gengeşîyeke bi havîl û zengîn mîvanê me xatir xwest û çû, lê bareke giran li dewsa xwe hişt ew ji ku ez beşdariyê di 10 saliya weşandina kovara Nûdemê de bikim.

Dema xewn di jiyana mirov ya rojane de dibin rastî, karwanêن hêviyan bê hemdî xwe radiwestin û dîwarên hêşargehan diherijînin da ku her hêviyek bibe wargeh ji

mirovantiya windayî re; çend şevan ez û stêran me şebuhêrk bi hev re qedandin ta berê sibehê, ramanekê ez birim û yekê ez anîm, derûn û morala min li hev dizâvirîn, dûrbûna stêran ez dixapandim, lê ronahiya wan hêvi dida min, û bi taybetî de ma min rahişt hejmara yekemîn ji kovara Nûdem, li nav rez rûniştim û bayê weşxerbî- her kêlîkekê ji ji nişkê ve radibû û xwe li nav pêlén porê min yê berdayî di-xist...; hingê tiliyên destêن min bêrîya ramûsandina pênuşê kir, û li ber ronahiya stêrên gêş bizav dane xwe ku çend goşiyên hezkirinê ji rezê hestê min jêkin û li ser masa şaneşîna Nûdemê deynin, ji bo helkeftina derbasbûna 10 salan li ser weşandi-na vê kovara aktif...

Piştî qonaxa Hewar û Ronahî û bi taybetî di destpêka salên notî de, ji nû weşandina kovarêن serbixwe li nav kurdêن Sûriyê destpêkir û yekemîn kovara serbixwe hat weşandin Gurzek Gul bû wê jî xwest rîbaza Hewarê bimeşîne, lê wek ku xwedî û berpirsyarê wê mamoste Konê Reş dibêje; Gurzek Gul ne dilopek ji deryaya Hewarê ... û bi vî awayî gelek kovar û rojnameyên ku me li nav xwe dîtin piraniya wan rîexistinêne û yên din jî salê carekê dernakevin, ji ber vê yekê çavê me herdem li derive dimîne û bi taybetî li kovarêن serbixwe mîna Nûdemê.

Ez dixwazim tîpêن li ser lêvîn rastiyê birêz bîkim, da ku ez karibim rahêjim teraziya nîxandinê û bi dadiyeke bê sexte wijdanê tozgirtî dawesnîm, ez karim bêjim kovara Nûdem yekemîn kovar e li her çar goşeyên Kurdistanê ku stîleke taybet ji xwe re hilbijartiye, lê dîsa wê pişta xwe bi werîşê bav û kalan girêdaye û ev yek ji gotina xwedî û berpirsiyarê wê diyar e ku di hejmara yekemîn de ji kovara Nûdemê ê wiha dibêje: "Heger alîkarî hebe wê kovara me nemire, ew ê jiyanekê dirêj bijî û bibe Hawareke nû..."

Erê em pir dixwazin ku gelek Celader û gelek Hawarên nû li nav me peyda bîbin, lê dema gotinêن bi stirî di zimanen de diçikilin cawêن rastiyê ji hev diçirin, rojêن pûç bi verendeyên xapandinê ve hildikşin û li zindiyêن ku bîrdankêن xwe windakirine cî bi cî digerin û wan derbaşî ezmanên mirinê dikin.

Kovara Nûdem û yên weke wê solîn û sûlafan li ber me kurdan li welêt pirdikin û di pey re me disipêrin newalêن tîbûnê, lê dîsa jî em wan mîna siwaran dibînin ku ji nişkê ve ji pişt asoyan derdikevin û xwîna ku li kolanan şewitî bû jî nû dikin, mey û hêviyên derewîn jê mest dikin; Nûdem jî siwareke serbixwe ye û daye pey siwarêن revonek ew ên ku ji cengêن şikestî reviyane û laşen kuşîyan bi xwe re revandine da ku wan li bazarêن reş bifiroşin.

Kovara Nûdem nûdemiyek li nav baxê rewşenbîriya kurdi raxistiye, naxwaze ku wêjê, kultur toreya kurdi bibin êzing ji agirê jibîrkirinê re; Cogek di navbera gola

Wanê û gola Ormiyê de vekiriye, dilopên xwîn, xwêdan û rondikên mîr Celadet Bedîr-Xan civandin û li dewsâ ava Dîcle û Firat herikandin.

Nûdem kolkezêrînek e di ezmanê rewşenbîriya kurdî de, bingeha wê Hawar e, lêkirina wê bar e, lê encamîn wê li nav me tevan xweş diyar e, digel hêviyên serkeftin û berdewamiyê ji vê kovara nirxbuha û şanaz re... ☐

01-06-20, Qamîlo

MÎRKUT

Şabaş ji Xwedê ra ku mîrkut
Ket destê dankurê mala xezûran
Em kerixîbûn ji ecîn û îsotê
Niha dor hate ser hûr û pizûran

Rojen Barnas

Her ji deh rojan zimanek li dinyê dimire gidî bila kurdî nebe yek ji wan

SILÊMAN DEMİR

Van deh pazdeh salên dawî, pêşdeketinên ku di teknîkê de, bi taybetî jî ên ku di warê komînîkasyon, medya û mecalên transportê de bûne, guhertinên mezin di jiyana mirovan de, di şiklê dan û stendinên wan de, di fikir û helwestên wan de, di bawerî û hêviyên wan de kirin. Jiyana rojane û pêwendiyên civatî bi îmkan û êrîşen teknîkî re hatin guhertin. Mirov hatin guhertin. Li hin welatan jiyan serûbi-nî hev bû. Hin ji nû ve rabûn û hin jî wenda bûn.

Bêguman her kes di warê xwe de vê yekê analîz dike. Leşker, di warê leşkerî de, tucar di warê tucarî de, banka di warê karê bankan de, siyasetvan di warê siyâsî de vê rewşê analîz dikin. Her kes dixwaze bizanibe ci bûye û wê bi dû de ci bibe.

Hin jê, ji bo ku di xewê de neyên girtin, hin jê jî ji bo ku gava dem bê, amade bin û xurttir bi jiyanê re bin. Ji ber ku baş dizanin ku ev guhertin, dikarin mirinê bi xwe re bînin.

Vê rewşê bala zimanzanên dinyê jî kişandiye. Ew jî wek hemû grûbên lêkolîner ên dinyê di warê xwe de dixebeitin. Lêkolînerên cuda, lêkolînen xwe dîkin û tiştekî hevbeş dibînin. Ew tişte hevbeş ew e ku, rewşa ku bipêşdeketinên teknîkî re derke-tyie û darê ku ji nû ve ji mirovan re daniye, hukmê mirinê ji gelek zimanan re birî ye. Li ber vê yekê dikevin û wek alarmekê eşkere dikin. Ev agahdarî di rojnameyên swêdî jî de derketin. Ez jî dê wan agahdariyan ji kurdan re berhev bikim. Ji ber ku divê em jî pir zû bi vê alarmê bihisin, kumê xwe deynin ber xwe û bisikirin; bizanibin bê divê em ci bikin û ci nekin.

Li gora hesabê ku lêkolîner dikein, her deh rojan zimanek li dinyê dimire. Heta

du nifşan, yanî heta sed salan, wê nîvê zimanên li dinyê bimirin. Yanî wê nîvê zimanên ku niha li dinyê hene, yanî wê nîvê 6800 zimanan bimirin. Û her wilo digihijin encama ku tu deman ziman li dinyê wilo bi xurtî nemirine, tu deman civatan hevdu wilo bi xurtî nexwarine, tu deman zimanan hevdu wilo zû û bi hêsanî nexwarine.

Mark Pagel, biyologê pêşdeketinê yê li Readinguniversity li Îngîstanê dibêje, "em ji niha vê sisê, ya jî çar zimanên ku wê bibin serdestên dinyê dibînin. Ev tê maneya tevkuştin û qelandina zimanan a ku sekinandina wê gelekî sext e".

Îro pênc ziman, yanî îngîlizî, spanî, çînî, rûsî û hîndî, zimanên dinyê yên herî mezin in. Nîvê mirovên dinyê bi van pênc zimanan dipeyivin. Ji sedî 45 parêñ din ê ji mirovên dinyê, bi çend zimanên din dipeyivin. Bi zimanên din ên mayî hindik mirov dipeyivin. Hejmara mirovên ku bi çendek ji wan digihijin digihije milyonekê. Hin jê bi hezaran in. Hin jê çend kes in. Gava ku ew kes dimirin, êdî tu kesen ku bi wan zimanan bipeyivin jî namînin, dimirin.

Lêkolîner dibêjin, "lê her demê ne zimanên biçûk pêşî dimirin". Zimanên mezin ji dimirin. Zimanek ji zimanên beşekî rûniştvanên emerîka yên pêşî Îndîanên Navayo, ku tirk ji wan re kizilderili dibêjin, yek ji wan zimanan e. Gelek mirov pê dipeyivîn, lê îro li ber mirinê ye. Ji ber ku dibistanê wan tune ne, xwendin û nivîsandin bi zimanê wan tune ye û ew bi xwe jî bi ser de rojnameyên xwe bi îngîlizî derdixin, êdî xwendekar û zarokên wan zimanê xwe fêr nabin û zimanê wan hêdî hêdî dimire.

Lêkolîner dibêjin "gava zimanek tê ber mirinê, ne ji ber bê çiqase hindik mirov pê dipeyivin; lê ji ber ku bê ên pê dipeyivin çend salî ne. Heger zarok fêrî zimanê xwe bibin, belkî ew ziman bikaribe ji mirinê xelas bibe".

Bi baweriya min tercumekirineke din ji vê yekê re hewce nake. Pir eşkere ye. Ya mileten xwediyêن zimanên ku di bin tehdîtê de ne stûyê xwe li ber mirinê radidin, xwe fêrî zimanên ku dikan zimanê wan bixwe dikan, ya jî wek ku wan bi xwe demekê ji deman zimanê xwe wek diyarî ji dê û bavêن xwe girtibûn, zimanê xwe wek diyarî didin zarokên xwe, zarokên xwe fêrî zimanê xwe dikan û zimanê xwe ji mirinê xelas dikan.

Ez dizanim û dibihtîzim ku gelek xwende, siyasetvan, entelektuel û burokratên kurdan bi bihîstina van tiştan aciz dibin, henekê xwe bi aqil, bawerî, alarm, fikir û helwestên wilo dikan. Dibêjin, zimanê me heta niha nemiriye ma hema wê ji nû ve bimire. Niha problemên me yên grîngitir hene. Em ê zimên bi dû re xelas bikin. Dêna xwe bidin cezayiriyan. Pişti xelasbûnê bi bûş salan jî hîna bi fransî dipeyivîn.

Lê bawer bin ev yek dikare bes tenê ji ber nezaniyeke mezin bê gotin. Û divê bê gotin ku wan kesên wilo ji zû ve stûyê xwe li ber dijminên zimanê me radane, mirin qebûl kirine û bi helwesta xwe ye dîrokî ya di derbarê zimanê me de, nema kurd in. Malbata ku dê ji wî/wê zêde bibe, pişti nifşekî dê bi tu awayên xwe nema kurd be. Çi bê serê zimanê me, nema xema wan e.

Ên me wilo dibêjin, lê fransî ketine tirsa mirina zimanê xwe. Ji bo vê yekê, ji bo ku îngîlîzî nekeve jiyana wan a rojane, guhdarkirina li mûzîka fransî, bi qanûnan li ser fransiyen ferz dikin. Bi qanûnan derdikevin hemberî zimanên biyan û tesîra wan. Gava serokê Yekîtiya Neteweyan tê hilbijartin, fransa derdikeve û dibêje, ew bi fransî nizane divê ew nebe serok.

Heçî alamanî ye, ew di rewšeke kamaxtir de ye. Dewlet bi kar û barê xwe û mezinbûna xwe daketiye û denigên zimanzanen nabe xwe. Gava zimanzanen alamanî zimanê alamanî dipîvin, dinerin ku di van sedsalêن dawî de, sed peyvîn zimên ên herî aktîv û rojane jî nema bi alamanî ne, ew êdî bi îngîlîzî ne û cihêن xwe di alamanî de girtine. Derkirina wan qet nema mumkun e. Dibêjin ku alamanî deriyên xwe wilo heta pişte ji îngîlîzî re vekirine. Îngîlîzî ha ha dikeve nav.

Ziman bi gelek şiklan dimirin. Gava ku ziman dimirin, mileten ku pê dipeyivîn jî hêdî hêdî di nav mileten xurt de wenda dibin. Hin ziman, ji ber ku tu kesên ku bi wan bipeyivin namînin, dimirin. Hin jê jî, xwe li hemberî asîmîlasyonâ li ser xwe nagirin û dimirin. Civatêن feqîr û qels, di nav ên xurt de dihelin û zimanê wan dimire. Lê gava ku xwendevan, siyasetvan û dê û bavan hêvî û bawerî ji zimanê xwe birîn, xwe hêdî hêdî fêrî zimanekî din kirin û bi zimanekî din jiyan û peyivîn, qedera zimanê xwe dikan mirin, zimanê wan dimire. Vê hêla xetera li ser ziman, Salîkoko Mufwene, şefê beşa lingüistîk a Universiteya Chicago dibîne û eşke-re dike.

Gava ku mirov ji hêla civatî ve ji hev de ketin, kultur û adetên xwe berdan, zimanê xwe ji dixin xetera mirinê. Ji ber ku ziman ne sistemeke peyvan a ku mirov hevdû pê fam dikan tenê ye. Ew bi kultur û adetan re heye û bi wan re dijî. Ziman, karin xwe li dora stûnên hevgirtin û xebata civatî û sîvîl zinde bigirin, xurttir bibin û bijîn. Li gora bê bawerî û helwesta mirovan di derheqa vê hêla civata wan de çawa ye, zimanê wan dijî, ya jî dimire. Heger em tu fêde û pêşeroja xwe di kurdbûna xwe de, di jiyanekê bi zimanê xwe de û di zimanê xwe de nebînin, em zimanê xwe didin mirinê.

Lê gava derd hebin, derman jî hene. Dermanê xelaskirina ziman an jî heye. Ên ku dermanan pêşniyar dikan jî hene. Yek ji wan, Doug Whalen ji Endangered

Languege Fund li New Haven, li Emerîka ye. D. Whalen dibêje, "çara xelaskirina zimanê di xeterê de, modela xwendina bi zimanê dê ye".

D. Whalen bi modela xwendinê, xwendina li dibistanan dibe qest dike. Li Eme-rîkayê, xwendina bi vî awayî, gelek zimanên rûnişvanên emerîka yên kevn xelas kiriye. Xebata ji bo xelaskirina zimanan, ne li emerîka tenê tê kirin. Li Zelanda Nû jî tê kirin û berê xwe dide. Lê numûna herî balkêş, dîsa jî zimanê İsrâiliyan e, hebreî ye. Heta dor serê salên destpêka hezarûneh sedî jî li ber mirinê bû. Lê niha zimanekî xurt û jîndar e. Ji ber ku xwendin û nivîsandin pê bû, pê hat jiyan û çand hat afirandin.

Mixabin xwendineke me ya wilo li hin welatên ewrûpa tenê heye, lê zimanê me li welêt e, qedera pêşeroja me û zimanê me li wir tê nivîsandin. Li wir tê kuştin û li wir tê xelaskirin. Rast e, xwendegehêن me yên wilo tune ne, lê dîsa jî divê em wê yekê bikin. Em nikarin dibistanan ji zarokên xwe re ava bikin û wan bişîninê, lê em karin li malê bi wan re bi kurdî bipeyivin, wan fêrî kurdî bikin. Her wilo, divê em wan fêrî xwendin û nivîsandina bi kurdî jî bikin. Ev yek, karê me yê neteweyî yê herî grîng û ecele ye.

Lê ev yek jî ne bes e. Divê ziman bêن bipêşdexistin. Ew çawa dibe? Ew jî bi xurtkirina çand, edebiyat, huner û hevgirtinên civatî, bi jiyanina adet û taybeti-yen neteweyî dibe. Divê em bikaribin wek kurd bijîn û bi kurdî bipeyivin û bixwî-nin. Divê em bikaribin vê yekê bikin da ku em bikaribin bibin neteweyek û zimanê me jî bikaribe bibe zimanê neteweyekê û bijî. Heger em kurd qet nebe niha ni-karibin pirtûk, kovar û rojnameyên ku bi kurdî derdi Kevin bikirin, bixwînin û bi-bin garantiya ku ew bikaribin bijîn û zimanê me bi nivîskî bi kar bînin, wê zimanê me bimire. Gava zimanê me bimire, em êdî wek kurd tune ne. Em ê zû di nav mi-letên cîran de wenda bibin. Dînê me û tengê me wek hev e. Ferqa me ya herî me-zin, ziman e. Ew tune be, em wek wan in.

Lê wek ku min li jor jî got, hindik kesên ji nifşê ku serê wan şîn bûye, ên ku di siyaseteke bêkêr û ber de asê mane, ruhê vê yekê fam dikin û qebûl dikin. Heta ni-ha nekirine û ji xwe êdî bikin jî di jiyanâ wan a rojane de nema pir fêde dike. Ji ber ku zarokên gelekan ji wan bi kurdî nizanin. Gelek ji wan bi xwe bi kurdî nizanin. Wan rîya tirkbûnê hilbijartine.

Dêna xwe bidinê ku ên ji hêla civatî, tîcarî û siyasî de serdest in, ew in. Loma jî, ew in ên ku piraniya enerjiya kurdan a entelektuelî û nivîsandinê, di derxistina ko-var û rojnameyên bi tirkî de dicivînin û wê enerjiyê têk dibin. Qet nizanin ku karê wan jî, karê têkbirina zimanê me ye. Em kurdêñ ku bi watiniya parastina kurdî hi-

siyane û ên wilo, di derheqa pêşeroja zimanê kurdî de, ne ên şerê eniyekê ne. Nêta wan ci be bila bibe, ew di vê derheqê de, li kêleka dewletê, zimanê me têk dibin, kurdan fêrî zimanekî din dîkin, nahêlin ku kurd bi kurdî bixwînin û binivîsin, na-hêlin ku kurd xwe fêrî kurdî bikin. Ew bi vê yekê, kurdî jîbirakirin didin. Dewlet zimanê me qedexe dike, ew jî dibêjin aha ji we re tirkî. De bixwînin.

Gelî xort û xwendekarêن nûjen... hêvî hûn in, bar li ser pişta we ye. Em dereng dimînin, zû di vê derheqê de pevcûnekê li dar bixin. Wek xorten bi rûmet yên hemû welatan, wek gava ku her demê berî hemû grûbêن civatê bi redîkalî radibin, reform û rîyêن nûjen pêşniyar dîkin û nûjentiyê di civatê de ava dîkin, nîrên zulmê yên herî xeter, berî hemû kesan dibînin û bi dilêri dişkînin, hûn rabin û zimanê kurdî biparêzin. Hûn vejîn û organîzekirina raperîna xelaskirina zimanê kurdî bi-hûnin. Berî hemû tiştan kovar û rojnameyên ku kurd bi zimanên din derdixin, boykot bikin û peyva bi kurdî bikin mode û şiklê welarperweriya nû. Beşdarî civîn, şevbuhêrk û şâhiyên ne bi kurdî nebin û li dijî wan bipeyivin. Heger divê hûn bibin jî, li ser kurdî di qirika wan kevin. Di hemû rûniştinên bi kurdan re, bi kurdî bipeyivin, bersiva ên ku ne bi kurdî dipeyivin nedin, bikin ku ji ber xwe şerm bikin. Bila fam bikin ku gava mirov kurd be, divê mirov xwe fêrî kurdî bike û bi kurdî bipeyive. Bila fam bikin ku gava mirov kurd be, divê mirov ji kurdî hez bike. Vê yekê, vê alarmê, her rojê li hemû deveran munaqaşe bikin. Bikin ku ev munaqaşe qet sar û sist nebe. Divê ev yek, li ber kurdan bibe karekî wek limêja misilmanan a her rojê.

Bikin, li dar bixin da ku ev vejîn bibe diyarî û nav û dengê we yê dîrokî. Wilo bikin, da ku dîrok bibêje nîşê ku nû dibû xort û xwendekarêن nûhatî ên salênu duhe-zaran, di pêşengiya filankes û filankes de karê parastina zimanê kurdî li dar xist. Bi-la kurdêن pêşerojê bibêjiin zimanê kurdî, diyariya wan a ji me re ye. Bi wî awayî, serbilindiya kurdan a ku ji wan tê stendin, hûn dîsa diyarî wan bikin.

Ez bi xwe di wê baweriyê de me, miletekî ku nikaribe û nexwaze bi zimanê xwe bipeyive, bixwîne, binivîsine û biparêzê, ne layiqî tu azadiyan e. Vê kêmasiyê neynin serê kurdan. Ên ku bawer dîkin kurdan azadî heq kirine, divê zimanê kurdî biparêzin. □

ROJÎN

ŞAHİNÊ B. SOREKLÎ

Befir û pûk bû li doraliyîn çiyayê Şengalê, Ehreman dîsan hêrs bûbû û asîmanê welatî bi ewrên dagirtî miş kiribû. Rojê xwe veşartibû, hîvê koç kîribû û stêrkan xwe di kûraniya gerdûnê de wenda kiribûn. Mirina reş xwe berdabû nav gundêñ Kurdistanê, Izraîlê Mewtê derketibû nêçirvaniyê, tîra xwe çep û rast diavêt, ne digot zaro bêtawan e, ne digot va keça yeke xweşik û ciwan e. Wî bi dilekî polatî can dikişand ji giyanêñ çelengan, ji bedena egîdan û ji laşen pîr û kalan. Bi hezaran termên reş li ser befira sipî bûbûn para gurên birçî. Belê, di goristanêñ stana kurdan de dîsan cîh nemabû. Û êlan şîn danîbûn, jinan reş girêdabûn, zaro bêday mabûn, day bêzaro bûbûn, û te digot qey xuristê xwe xistiye nav razaneke bêkat.

Di rojeke dawiya zivistana vê salê de bû ku ez rastî te hatim, sê salan li dû şî-

kestina serihildana Bedirxan Begê, di 1849an de. Tu çelenga devera xwe bûyi, tu benîştê devê xorstan bûyi, tu me-raqa dilêñ bokeyan bûyi û nav û dengê te ketibûn nav meqamên bilûrvanan, têlên tenbûrvanan, stiranê şivanan û heta bi oldarêñ herêma me be di kûraniya şevan de wêneya bejina te ya zirav di xwewn û xeyalêñ xwe de bi bîr dihanîn.

Dema ez gîhîstîm gundê bavê te agir ji asîmanî dibariya. Careke din şerekî dijwar di navbera Ehreman û Hurmuz de dest pê kiribû, şırmaqêñ gîrr û xeba xudadê zivistanê birûsk ji nav ewrên reş dipijiqandin, gurmegurma tavan bû, zîpik ji jor dibariyan. Mirina reş hema bi çend rojan li pêş hatina biharê xwaz-tibû te jî wek bûkekê li gel xwe bibe. Şêx û mele û feqîyan xwe li mala bavê te girtibûn, nivişt li dû niviştê dihat ni-

vîsandin, qurban li dû qurbanê dihat serjekirin, yasîn li dû yasînê dihat xwendin û xorîn êla we bêdeng mabûn, evîndarêne te stûxar li ber yezdanî digerîyan ku bila wan li şûna te pêşkêşî deryaya mirnê bike.

Rê nedan min da ku ez te derman bikim, bawer nebûn bi hêza min ya yezdanî û nehîştin ez pê li deririyê odeya te bikim. Heft roj û şevan ez bûm mîvâne mala bavê te û di şikestina şeva roja heystemîn de min xwe bi dizî xuşand odeya te. Giyanê te di binê lihêfê de di nav xuha sikranê de şil û pil bûbû, nali-neke zirav ji te dihat der û tu di navbera jiyîn û mirinê de bûyî.

Min tenê nav û dengê te bihîstibûn. Digotin tu ji pêriyan xweşiktirîn pêri yî, ji kevokan bedewtirîn kevok î, ji xeza-lan sipehîtitirîn xezal î; digotin tu berxa mala Qoço Begê yî, tu srêrka êla bavê xwe yî, tu girana li ber dilê daya xwe yî, tu serbilindiya xalanan î, tu hêviya her çardeh pismaman î, tu xemgîniya çar biran î. De min ê çawa rê bida vemi-randina jiyana di giyanê te de, min ê çawa bihîsta ku canê te ji bedena te ya delal bête vejetandin?!

Di kûraniya şevê de diya te ya mest bûyî di nav pêlên xewê de wenda bûbû, findê şermok hêstir li kêleka te dibaran-din û tu di hembêza bêdengiyê de ber bi dawiya çemê jiyânê diçûyî. Min li-hêf ji ser te rakir, destek avêt bin serê te yê delal û bi destê din kirasê te ji te da-

nî; min destmala xwe xist nav ulbika avê û bi wê xuha li ser giyanê te zewa kir û min bi lêvên xwe bedena te ya horîyî ji eniyê ta tiliyên her du lingan maç kir. Û min li pêş giyanê te limêja evîndariyê kir, û min gote Yezadanî: Ey Xudayê gerdûna bêyî sînor, Tu dê vê şevê bikî ya dawîn ji zivistana mirinê, Tu dê vê berbangê bikî yekemîn berbanga rojîn bihara jiyînê, Tu dê Roja pîroz îroj ji rojhelatê aso têxî xewanê û Tu dê Izraîlê Mewtê ji Rojînê bi dûr xînî.

* * *

Û min lêvên xwe gîhandin lêvên hingi-vîn yên Rojînê û di germahiya wan de hest kir şopa mîzgînê, û dema wê çavên xwe bi tirs vekirin, min gotê: Metirse ji min, ciwanê, metirse. Va ye min ji te re haniye nûçeya ferecê. Roj li hilatê ye, bihar di destpêkê de ye, dawiya mirina reş e.

Min her du çavên keça xilmaş ramû-sandin û çûm der. Rojîna Qoço Begê roja din behsa xewnekê kiribû, gotibû melekékî ew maç kiriye û mîzgîna hatîna biharê daye. Dizanim, xelk tenê bi melekan bawer e, ne bi çakmîrovê pêkan. Wisa jî baş e. Temenê min pêncê sal bûn, ez bavê sê ciwanan bûm û li gel ku di nav sînga min de dilekî ciwan hebû jî, min dizanbû rîyên qedera min û Rojînê dê di wê dem û şûnê de nebûna

yen: û erf û toreyên me kurdan û kur-mamên di rê de, û zaroyên min, û xêza-na min, û hîn bi ser de her du êlên me ji heft bavan de jin nedabûn hev!

Divabû ez li şûneke din, di demeke din de û di jiyanekê nû de rastî Rojînê bihatama; û min gote Yezdanî: Ez ê ve-gerim va planête mirovan û ne mirovan, ji bo xatirê Rojînê ez ê vege-ri; û ez dizanîm ew ê jî vegere.

Min bi rêya Roja Pîroz gote Yezdanî: Qedera min di jiyanâ yekem de di dest Te de bû, lê di jiyanâ duyem de Tu dê min û Rojînê bigihînî hev û din. Min dizanibû ew roja dê bêt, min dizanibû

dê bêt. Panzdeh rojan li dû destpêka bi-harê min xatir xwazt ji yên xwe, ji xêza-na xwe bexşandin tika kir. Û min na-meyeke yekrêz bi rêya Şêx Ubeydullah M. ji Rojînê re rê kir:

"Da ku tu bijî ez ê koç bikim, lê biza-nibe ku em ê hev bibînin, Pêriya li ber dil giran."

Di heyva nîsanê de, li ser girekî nêzikî çemê xabûrê, min xwe pêşkêşî birûskê-kê kir, wekî ku min ji bo xatirê Rojînê soz dabû Ehremanî. Lê min dizanibû ez ê vege-ri. □

(1999)

Îstiqlal çi ye, Pêşeroj an Paşeroj e?

ROJEN BARNAS

Kurmanç li ser têgeha istiqbal ê li hev nakin, di vê mijarê de jî di dubendiyê de
ne: Hin jê dibêjin ku îstiqlal pêşeroj e, yên dinê dibêjin na îstiqlal paşroj an
paşeroj e.

Bi maneya îstiqlalê mîna gelek kesan ez jî gotina pêşerojê bi kar tînim. Bêguman
gelek kes jî hene ku di dewsê de "paşeroj" bi kar tînin. Du gotinêni bi termamî dij-
mane; pêş û paş.

Yên ku paşerojê bi kar tînin li gora xwe van sedeman berpêş dikin û dibêjin ku
kurd dibêjin:

Gotinêni pêşîyan: Jê mebest ew e ku gotinêni wan kesan in ku li pêşîya me hatine
dinyayê û jîne. Hingê pêş an pêşî bîhûrî (mazî/passé) ye, bûrî nabe îstiqlal.

Pêşîyêni me: Bav û bapîrêni me ne û bûrî (mazî) ne, çûne; ew nabin îstiqlal.

Li paşîya xwe bifikire (yanî li îstiqlala xwe bifikire).

Paşîyêni me: Yanî nevî û neviçirkêni me (ku îstiqlala me) ne.

Rast e gelo? Ez wisa bi wî awayî nafikirim.

Di hemî tişt û têgehêni (mefshûm) ku di hereketê de ne herwekî zuriyet, karwan,
qefle, leşker, govend, garan, av û trêni; aliyê pêşî aliyê wan i serîkêş e. Serîkêşê zuri-
yetê pêşîyê zuriyetê ye ku li gora me dibe bav û bapîr. Paşîya wan jî dûvik, dawî,
xelefê wan e. Li vê derê pêşî (qebl-ûn) û paşî (axir/arka, ard) ye, ne ku yek mazî
(geçmiş) û yek jî musteqbel e.

Gava ku meriv dibêje li paşîya xwe bifikire pê meriv dixwaze bibêje ku li paşîya

(dawî) emrê xwe bifikire; niha tu di ferehiyê de yî an li ser quwet û siheta xwe yî, ev rewşa xweş her tim wisa namîne, dibe ku di pey de bikevî tengasiyê, lewma li paşıya van rojan bifikire yanî bi tedbîr be. Yênu ku dibêjin li paşıya xwe bifikire an Xwedê paşıya me bi xêr bigerîne, di dewsa paşıyê de gelek car dibêjin [axirê, sonî an songiya, taliya, dongiya, dawiya] emrê me û h.w.d. Ji van bêjeyan tu yek jî bi maneya îstiqlalê nayê.

Paşıyên me ku di maneya zarûk-nevî-neviçirk de ye, di erebî de (eqeb) e, ne ku (qebl) e. Ew dûvajo an xelefîn me yên zuriyetê ne. Lê îstiqlal ji bêjeya qebl (pêş) hatîye çêkirin. Meriv dibêje ku zarûkên milletekî îstiqlala wî milletî ye, lê ev nayê wê maneyê ku maneya îstiqlalê bi kurmancî zarûk e.

Li herêma me gava ku mezinekî dewletê dihat bajarekî; eşraf û xwendayê navse-re yên ji dema padîşahî an paşatîyê mayî bi kurmancî digotin emê herin îstiqlala filan kes, xelkên sade jî dîsa bi kurmancî digotin emê herin pêşîya wî.

Ma tu neçûy pêşîya wî (axê/şex/mîr/serok/dawetê/leşker) ? Ev her tim tê gotinê û jê jî mebest ew e ku ka ew kes çiye îstiqlala kesê jê behskirî an ne. Serok an hezkiriyek we dê were balafirgeha bajarê we û hun dixwazin bi qewlê berê herin îstiqlala wî kesî, gelo hunê herin pêşîya wî an paşıya wî?

Di dewsa vê "îstiqlalê" de îro bi tirkî "karşılıama" tê bikaranîn ku bi kurmanciya me "pêrgîn" e.

Di berbanga sibehê de demên limjê yên wê rojê yên li pêşîya meriv (yên musteqbel) nîvro, esir, mexrib û işa ne. Di esrê de êdî limjêa mexrib û işayê bi tenê li pêşîya meriv dimînin yanî musteqbel in, lê limjêa nîvro û ya sibehê bîhurîne, li paş meriv mane.

Baş e, ku pêş bûrî (mazî-geçmiş) be, pêşveçûn bi ci maneyê ye gelo? Çûyina ber bi îstiqlalê ve ye an ya ber bi bûrî (mazî-geçmiş) ve ye? Li gora mentîqa wan kesen ku dibêjin "paşeroj" divê îstiqlal be, herwisa divê ku paşveçûn teqedum an tereqî (ileri) û pêşveçûn jî recî'i (gericilik) bûna. Lê di rastiyê de ne wisa ye.

Paşeroja me perçezemanê me yê dawiya emrê me, yê axirê emrê me ye. Lê pêşeroja me ew perçezemanê ji niha hera paşerojê li pêşîya me ye, em di her gavî de ber pê diçin, li pêşîya me ye ku emê hê bibînin û bijîn, yanî îstiqlal e.

Em dîna xwe bidinê di vê mijarê de ka xwedî rêziman û ferheng ci dibêjin: Li gora Mîr Celader paşroj; berdestik[yêdekk], teserûf⁽¹⁾, li gora Elî Seydo Gewranî paşroj; teserûf (el-wefî), musteqbel⁽²⁾, li gora D. Îzolî paşroj; îstiqlal, lê paşroj-mendî; teserûf⁽³⁾, li gora Salah Saadallah future; paşroj, pêşedem, dungî⁽⁴⁾, li gora Hejar paşroj; lewe diwa, ayinde, rojanî diwayî⁽⁵⁾.

Ji vana ji Hejar û D. Îzolî pêve kes negotiye paşeroj, gotine paşroj. Ku paşeroj îstiqlal be paşrojmendî divê bibûna "xwedî-îstiqlalî", bi ci awayî dibe teseruf têna-gihîjim.

Teseruf a Mîr Celadet, teseruf a (el-wefr) Eli Seydo Gewranî û paşrojmendî (?) ya D. Îzolî li hev dikin. Dûngi ya Salah Saadallah û rojanî diwayî ya Hejar jî li hev in. Lê çawa eynî gotin hem dibe teseruf û hem jî musteqbel? An paşroj: îstiqlal û paşrojmendî jî teserûf? Bi serê meriv nakeve. Ya jî "future" hem paşroj û hem jî pêşedem? Li vê derê paşdaniya [dem] û [troj] karê nîşandayina zeman/peryod dikin, ji aliyê maneyê ve tu cudayî di navbera pêşedem, pêşeroj, pêşezeman, pêşegav de tune; ya ku maneya sereke dide gotinê pêş- an paş- a wê ye.

Bi dîtina min paşroj an paşeroj ne teserûf e û ne jî îstiqlal an musteqbel e, lêbelê bi xwe dawî/dongû/axir e û wek mecaz jî maneya teserûf/zewade/zexîre an tedbîra ji bona rojêñ paşiyê bi xwe re tîne.

Axir û îstiqlal an paşeroj û pêşeroj du têgehêñ gelek nêzîkî hev in. Di jiyan rojane ya xelkê sade de bêtir axir, paşî, dawî, tê bikaranîn. Îstiqlal têgeheke fikri/zanistî ye; bi dest nayê girtin û bi çav nayê dîtin, lêbelê têgehek e. Ev herdû biwêj axir û îstiqlal (paşeroj û pêşeroj) di hin cihan de mîna hev xuyan bikin û wisa bêne fehimkirin jî ne eynî tişt in. □

1. Emîr Celadet Bedîr Han & Roger Lescot, Kürçê Grameri (Kurmancî Lehçesi), Institut Kurde De Paris - 1990.
2. Ali Seydo Ali Gewranî, Ferhenga Kurdî Nûjen, Şirket-el-Şerqel Ewset, Eman-1985.
3. D. Îzolî, Ferheng Kurdî-Tirkî, Kurdish Students Society in Europe, Den Haag -1987.
4. Salah Saadallah, Ferhenga İngilîzî-Kurdî, Paris Kurdish Institute-Avesta, İstanbul-2000.
5. Hejar, Ferheng Kurdî-Farisi, Soroush Press, Tehran-1989.

Li Nisêbînê Qeptan e û li Cizîrê heywan e!

MUSTAFA CİZİRİ

Ki dibêje dibe û kî dibêje nabe... Ava çemê Cizîra Botan bi vexwarinê xelas na-be; rez û tiryên Omeriyan bi xwarina teyr û tilûran teva nabe. Belê belê dibe looo çawa nebe: wexta ku Bûka Mişk bêje ez ê xatûna ser textan bim û sûteleyên kolanan bibêjin em ê paşa û sultan bin. Ë ji xwe ew ê hinek derkevin ku li Nisêbînê qeptan bin û li Cizîrê jî heywan bin.

Geli xwendevanan bi vê nivîsê ez dixwazim hinekî bala we bikişnim ser zimanê kurdt. Kambaxî û wêraniya ku em bi dest û lepan ketine nav û wextî têde xewr bibin, raxim ber çavan. Armanca min bi vê nivîsê ne ku ez pesnê hinekan bidim û yên mayin gunehbar bikim. Lê rastiya me ci be, em divê bibêjin. Ger em rastiya xwe nebînin û herdem li mahne û hecetan bigerin û bi zimanê xwe neaxivin, pêse-roja me weke netew dikeve xetereke mezin. Xaka Mezopotamya gelek xelk di nava xirbe û mezelên xwe ên kavilkirî de winda kirine. Şin û girî wan bi paşde venagerîne û tirsâ min ew e ku em jî di nava rêza xelkên windayî kevin. Divê hesasiyeta me di derbarê ziman de ji ên miletên li derdora me xurtir be. Ger em di vî warîde ne hesas û bi ïnat bin, dê çend pilik û pirtikên me yên ku mane jî ê li ber pêlên lehiya asîmilasyonê di toto re derkevin.

Gelek caran hevalên ku bi kurdî dînîvisin li ser giringiya zimanê kurdî dîkin he-war û gazî û dixwazin dengên xwe bigîhînin siyasetmedarên kurd. Ew li ser giringiya ziman gewriya xwe ziwa dîkin. Ez naxwazim tiştên ku wan hevalan di derbarê giringiya ziman de nivîsandine di vê nivîsê de dubare bikim. Ë zane ji xwe zane û ê nizane jî baqê nîskan e. Eh siyasetmedarên me jî, cerinan wek bersiv di derbarê zi-

man de ji bo dilxwaşkirinê çend gotinênek şekirpare wek bersiv bi tirkî dinivîsinin û carinan jî di axaftinêne xwe de gotinênek wek rojbaş, şevbaş, spas, heval yan jî kekê bikartînin. Li gora wan siyasetmedaran ev çend gotinênek kurdî têra ku mirov siyaseta kurdî bike û welat jî pê rizgar bike heye... Aqilo xamo kundiro famo... ger zimanê kurdî li benda wan camêran bimîne ez bawer nakim em bigihêjin ku bi doxika kevçî jî bigirin...

Werhasil gotina zêde wek bilûra ber ga ye û pûç û vala ye. Ez zêde serê we neêşînim em bênen ser çîroka qebtanê Nisêbînê. Li çaraliyên welatê me Nisêbînê û Cizîrê du bajarêne navdar in. Mirov kare bêje ev herdu bajar hem cîran û hem jî destbirak in. Xelkê Nisêbînê û Cizîrê wek çêlkewenê kundirekî ne. Li Nisêbînê serê mirovekî bişe li Cizîrê destmal û kefi li serê wî digerînin. Secera wî kesî hera heft bavan karin bixwînin. Rojêne berxwadan û serhildanan himberiyê bi hev re dîkin û hevdû diceribînin. Ev herdu bajar jî, xwedî taximêne fitbolê ne ku carinan têne hemberî hevdû. Bi hev re bi gokê dileyizin. Rojekê ji rojan teximê Nisêbînê ê fitbolê li Cizîrê dibe mîvan ku bi hev re bi gokê bileyizin. Ma qeptanê leyistikvanenê Nisêbînê kêmî siyasetmedarêne me ye, bayê zimanê tirkî li serê wî jî xistiye. Qeptan ferman dide leyistikvanan da ku ew li Cizîrê bi kurdî neaxivin. Herçiqas leyistikvan dibêjin eman zeman em ê çawa li Cizîrê bi tirkî biaxivin, qeptan ji ser a xwe nayê xwar û fermana xwe bi paşde nagire. Leyistikvanenê reben bêçare bi ya qeptanê xwe dîkin. Li Cizîrê ji bo bêhnvedan û xwarinê teqimê Nisêbînê diçe restorandê. Garsonê restorandê bi zarekî xweş û kurdî bi xêrhatina qeptan û leyistikvanenê wî dike. Ew dibêje.

- Hûn bi xêr hatine Cizîrê.
- Sagolin, teşekkür ederiz. (Hûn her hebin, sipas)

...

Her çiqas garson hewldide ku bi qepten re bi kurdî biaxive lê qeptan jî bi ïnat bersiva wî bi tirkî dide. Dawiya dawî garson hêrs dibe û bi kurdî bangî hevalê xwe dike û dibêje

- Ka ji wî qeptanê diya xwe dirrrr... re xwarinê bîne!!

Û bi wî awayî bi navê heywanan leyistikvanenê din jî binav dike. Qeptan û leyistikvanenê xwe soromor li hevdû dinerin lê nikarin deng jî bikin. Mirovek ji xelkê Cizîrê ji garson re wiha dibêje.

- Eyb e şerm e, ev qeptan û leyistikvanenê Nisêbînê ne. Tu çîma wilo li wan dikî?
- Garson:
 - Ev ne qeptan û leyistikvan in. Bi eniya Mîr kim, ev tenê heywan in. □

Li ser çapa berhemên hunerî û kalîteya wan ya edebî çend peyv

N. ZAXURANI

Mîna ku baş tê zanîn, berhemên edebî / hunerî zehf kopleks î bi gelek alî ne. Ji ber ku her berhema hunerî xwedî form (şikil) û naverok e. Mirov dikare bi kurtî bibêje ku naveroka berhemên hunerî ji van fenomenên jérîn tê meydanê:

Her berhema hunerî hinek karekterên bi reng civakî ji xwe re dike mijar. Hunermend van karekteran li gora bîr û bawerîya xwe ya civakî, felsefi, olî û dîrokî şirove dike û bi alîkarîya heyecana xwe ya hunerî ji nû ve diafirîne. Bêguman, berhema hunerî bi saya naveroka xwe ji alîyê hunermendî ve tê afirandin. Lê, bêguman, her naveroka berhemên hunerî di nav şax û perê forma xwe de bi xwîn û can dibe. Ji xwe, amanc ji formê ev e: bê kîjan uslûb û nezim di nav rapêçana berhema hunerî de ji alîyê nivîskarî ve hatine bikaranîn, bi xwe ye. Ji vê yekê wirdetir, kîjan awayen vegotina hunerî di serpêhatina berhema hunerî de ji alîyê nivîskarî ve hatine bikaranîn, mirov bi saya forma berhema hunerî hîn dibe. Ji ber ku hunermend bi alîkarîya uslûbênen xwe yên hunerî zimanê xwe bêtir bi rîk û pêk dike û bîr û bawerîyen xwe bi alîkarîya uslûbênen xwe yên hunerî pêşkêşî xwendevanan dike, li ser wan bi awayekî erêni an jî bi awayekî neyêni bandorekê dideyne.

Ji xwe, mirov bi alîkarîya naverok û forma berhemên hunerî kalîteya berhemên hunerî destnîşan dike. Lê, mîna ku rind tê zanîn, nîrxê berhema hunerî bi saya tîraja xwe ya çapê jî ji alîyê hunermend û rexnegiran ve tê destnîşan kirin. Ev herdu pîvan - kalîte û çap - dibine bingeh ji bo nîrxandina berhemên hunerî.

Bi rastî jî, gava ku berhemên hunerî bi çapên mezin têne çap kirin, bêtir digihin

destê xwendevanan û ji alîyê gelek kesen ve têne xwendin. Bi saya vê yekê jî, berhemên hunerî zehftir di nava refêن civakê de yên ji hev cuda têne belavkirin, bêtir gotubêjên edebî / rexneyî li ser wan têne kirin, bi peyveke din dîyaloga di navbera xwendevan û nivîskarî de bi saya rexnegir tê pêkanîn.

Lê nayê wê wateyê ku berhemên hunerî yên ku bi çapên biçûk hatine / têne çapkirin, ji alîyê gelek xwendevanan nayêne xwendin, an jî di nava civatê de nayêne naskirin. Bêguman di vî warî de pir nimûne hene ku mirov dikare bîne bîra xwe, lê bi ya min nimûna herî ber bi çav berhemên gorbîhişte Musa Anter in: Qimil û Birîna Reş. Digel ku çapên van berhemên Musa Anter biçûk bûn jî û hêzên dagirkir astengî di warê hemû jiyanê de derdixistin jî, ev berhemên wî di nava ronakbîr û civata me kurdan de hatin naskirin û ji alîyê gelek kesan ve hatin xwendin.

Lê, li himberî vê yekê, mirov dikare çi ji bo kalîta edebî bibêje. Ma gelo, gava çapa berhemâ hunerî mezin be, kalîta wê ya hunerî / edebî jî bi hêztir dibe? Ango çapa berhemên hunerî bandoreke erêni li ser kalîta edebî dideyne. Carcaran dibe ku weha be, lê zehf caran jî peywendîyên di navbera çapê û kalîta hunerî de bi berrevajî tê xuyakirin, ango çiqasî çapa berhemâ hunerî mezin be, ewqasî jî kalîta wê ya hunerî lewaztir dibe. Ji ber ku gelek romanên ku bi çapake biçûk hatine çapkirin, xwedîyê kalîteyeke mezin in.

Ji alîyê din ve jî, divê bêzanîn ku ev pevgirêdan an jî dijberîya di navbera çapê û kalîte de herdem mîna îro ne weha girîng bû. Lewra di serdemêke dîrokî yeke dûvdirêj de berhemên klasik yên hunerî - ci roman, ci poesi, ci çîrok û ci jî cureyên din yên edebî - di nava refêن civatê de bi awayekî berfereh dihatin belavkirin, ji alîyê hemû refêن civatê ve dihatin xwendin, rexnegiran serê xwe li ser wan diêşand. Bi gotineke din, ji wêjeyê dihate hezkirin, nixxîn edebî mîna berhemên giranbiha dihatin pejirandin, li wan mîna mal û milkê civatê dihate meyzandin. Bi rastî jî, gava ku haya mirovî ji sedsala hijdehan hebe, mirov dibîne bê vê prosesê li welatên ji hev cuda çawa dest pê kirîye. Li Ingîlîstanê Dickens di vî warî de herî ber bi çav e. Dickens bi stîla xwe ya hunerî di nav civata ingîlîzan de dewseke ku bi hêsanî nayê jibîrkirin, daniye. Herweha li Fransayê hunermendêن mîna Balzac û Zola bi saya kar û barê xwe yê hunerî bûne keseyatiyêن navdar. Ji ber ku van nivîskaran serê xwe li ser pirsgirêkîn serdemâ xwe yên civakî diêşandin. Bela vê yekê jî, ji alîyê piranîya kesen civatê ve dihatin hezkirin. Gava mirov ji wir awira xwe davêje Rûsyayê, mirov dibîne ku edîbîn mîna Tolstoy û Dovstoyevskî bi saya berhemên xwe yên hunerî di nav civata rûsan de navûdeng dane. Ev keseyatiyê wiha yên bi nav û deng ne bi tenê ji alîyê gelê rûs ve hatine hezkirin, herweha li seranserê cîhanê ji

alîyê edebîyathezan ve jî hatine hezkirin. Herweha, gava ku mîrov ji welatê Tolstoy û Dostoyevskî radibe ser xwe û xwe digihîne Emerîka Yekgirtî, mîrov dibîne ku ni-vîskarên mîna Steinbeck û Dreiser di nava gelê emerîkî de hatine naskirin û berhemên wan ji alîyê piranîya civatê ve hatine xwendin. Bêguman, ji bo ku pirsgirêk rîndtir bê zelalkirin, mîrov dikare di vî warî de hinek nimûneyan ji dîroka edebîyatâ me ya kevnar bide: Edîb û şâtrên mîna Melayê Cizîrî, Feşîyê Teyran û Ehmedê Xanî hema bibêje ji alîyê timamê gelê Kurdistanê ve têne naskirin, berhemên wan weke ayetên pîroz têne pejirandin, rêzeke mezin li keseyetiya wan tê girtin. Ji ber ku van şâiran bi saya hunera xwe jiyana me kurdan hê bêtir xemilandine.

Lê di destpêka sedsala bîstan de ev meyil ber bi dawîya xwe ve çû. Di dawîya cenga cihanê ya yekê de li Fransayê meyleke nû hate pê. Li kêleke naturalîzmê tevgera edebî ya expresyonîzm şax û per da. Ji bili expresyonîzmê tevgerên edebî yên mîna surrealîzm, dadaîzm, absurdîzm li vî welatî an jî li wî welatê din peyde bûn, kom û komik li dorbera wan gihane hev û li ser vî bingehî modernîzma ku tiştek jê nayê têgihiştin, hêşîn bûn. Vêca, mîrov dikare bibêje ku di proseyeke weha de dij-berîya di navbera kalîte û çapê de dest pê kir.

Wî çaxî, di demeke dûvdîrêj de, Parîs paytexta cihanê ya literatûrê bû. Dîyardeyên edebî yên ku li Parîsê dihatin pê, pêşî li Ewrûpa, dûv re li Emerîka Yekgirtî û di pey te li seranserê cihanê bela dibûn. Bi saya vê belabûnê dîyardeyên edebî rengekî globalî werdigirtin.

Bêguman, îro bi saya teknîka nûjen ûnformasyonê rewş hatîye guhertin: vegetina edebî ya hingî cihê xwe daye filmên sînamê û televizyonê. Mîna ku tê zanîn, dîmenênen filmên sînemê an jî yên televizyonê ji vegetina edebî bêtir bi rîk û pêk dikarin rastîya jiyana civakî digel dîyardeyên (fenomenên) wê raxînin ber çavên bîneran. Lê, bêguman bi ferqeke giring: heçî televizyon û sîneme ye, bi tenê bê diyardeyên civakî çawa têne xuyakirin, weha wan pêşkêş dikan, lê himberî vê yekê, berhemên edebî dîyardeyên civakî bi gelek alî şirove dike, ango his û pêjnên wan digel tasa-wûr û remanên wan radixe ber çavan. Bela vê yekê jî, berhemên edebî bêtir xwedî ûmkanên vegetinê ne. Ji ber ku mîrovê hunermend xwe berdide nav xeyalên kûr û di nav van xeyalan de karekterên xwe ji nû ve diafîrîne û bi alîkarîya vegetina xwe ya hunerî ya cerg û dilên wan ji nû ve vedibêje.

Di destpêka afirandina berhemên hunerî de mîrov dikarfbû rastîya jiyana civakî digel xeml û xêza wê bi awayekî xwezayî vebêje. Pêwistîya mîrov ji bo têgihiştina wê bi pisporîyeke bi taybet nebû. Mîrov li gora têgihiştina xwe pirsgirêkên civatê - ci yên çînayetî, ci yên jinan, ci yên gundîyên hejar, ci yên ku ji ber civata ûndusriyê

dihatîn holê û çi yên netewayî û nav netewayî - dinirxandin û bi vegotineke hunerî pêşkêşî xwendevanan dikir. Ji xwe, gelek nivîskar di nava wan pirsgirêkên ku di rê-zên jorîn de behsa wan hate kirin, mezin dibûn. Bela vê yekê ji, ji bo wan ne zehmet bû ku kar û barê xwe yê hunerî birêve bibin. Di vî warî de nimûna herî ber bi çav Yaşar Kemal e. Mîna ku tê zanîn, piranîya mijar û karekterên berhemên Yaşar Kemal serçaviyê xwe ji civata kiştûkalê ya Kurdistanê digirin. Ji ber ku Yaşar Kemal bi xwe ji zarokê civateke weha ye. Hê ew ji serdema zaroktiya xwe ve di nav alozî û zehmetîya civata kiştûkalê de giha. Bela vê yekê ji, ew bû hostayê vegotina civata kiştûkalê.

Lê îro roj - heger ku ne li welatê me be ji - rewş cuda ye. Lewra, ji bo ku mirov bikaribe ji nav alozîya rewşê derbikeve, divê ku mirov rojnamevanekî bikêrhat û pispor be, da ku mirov bikaribe rewşa civata nûjen ji kar û barê xwe yê hunerî - çi roman, çi çîrok û êd. - re bike mijar. Nimûne: ji bo ku mirov mîna nivîskarekî çalak bikaribe rewşa îro ya li Tirkîyê û li bakurê welêt bi zimanê romanê vebêje, divê ku mirov parîkî li ser pirsgirêkên ku Komara Tirkîyê dixin nava krîzen eborî û politikî de pispor be. Ji vê yekê wîrdetir, divê ku haya mirovî ji nakokîyê di navbera grûbêñ desthilatdar de hebe: bê komên desthilatdar ji bo çi li dijberî hev çalakîyêñ dijwar li dar dixin. Ma gelo ev kom ji bo demokrasîyê di pêşîra hevdu de ne, an ji ji bo kar û barê xwe yê talanê li himberî hev keft û leftê dîkin? Biqasî ku tê xuyakîrin, komên çetewarî û mafyawarî dewlet li hev parve kirine, wey li wî ku bikaribe dewletê ji bo kar û barê xwe yê bi qirêj bi kar bîne. Ji xwe, mîna ku tê zanîn li ser gelê Kurdistanê teroreke bêhempa tê birêvebirin. Hingî ewqasî destgehêñ dewletê bi ideolojîya kemalîzmê hatine birêxistin, êdî hew mafê gelê Kurdistanê yên bi reng netewî, civakî, mirovayetî û demokratikî dipejirînin.

Lê îro biqasî ku ji çapamanîya tîrk tê fêhmkirin, karmendêñ çapamanîyê naxwazin serê xwe bi pirsgirêkên girîng yên civata Tirkîyê re bişênin. Ji ber ku piranîya wan serê wan di alîfê dewletê de ye, ango bi awayekî organîk bi dewletê ve girêdayî ne.

Ji alîyê din ve ji, mirov nikare tixûban di navbera çapêñ biçûk û çapêñ mezin de deyne, herweha mirov nikare sînorêñ di navbera kalîta edebî ya rind de û kalîta edebî ya qels de tu sînorêñ dîyar rakêse, ji ber ku sînorêñ di navbera wan de weha ne dîyar û zelal in.

Bi qasî ku tê zanîn, Kerstîn Ekman nivîskareke swêdî ya mezin e, bi xwezayî xwendevanêñ wê pir in, ango berhemên wê ji alîyê gelek xwendekaran ve têne xwendin. Herweha Jan Guillou ji gelek berhemên ku mijarêñ polîsî ji xwe re dikin

mijar, nivîsandîne. Vêca, heger ku mirov bi awireke edebî li berhemên van herdu nivîskarêñ swêdî binere, ma mirov dikare berhemên Jan Guillou bi yên Kerstîn Ekman re muqayese bike? Lê her sê romanên wî yên dawî ku serdema sedsala 1100 yan ji xwe re dikin mijar, divê ku mirov çawa binirxîne. Bêguman, divê ku mirov mîna texnegir parşîkî bikaribe li ser biponije.

Baş e, li ba me kurdan rewş çawa ye. Çap û kalîta berhemên ku ji alîyê nivîskarêñ me kurdan ve têne afirandin, di çi rewşê de ne. Di destê pêşî de divê bê gotin ku mirov ji ber çend sedeman nikare çapa berhemên nivîskarêñ me bi çapa berhemên nivîskarêñ biyanî re muqayese bike. Hoya yekê: mîna ku tê zanîn, welatê me hê bindest û perçekirî ye. Pîkolîya hêzên dagirker tu mecalê nadî nivîskarêñ me ku bikaribin kar û barê xwe di nav aramîyê de birêve bibin. Sedema diduyan: Nivîskarêñ me ji alîyê madî ve lewaz in, ango hêzên me yên siyasi di warê madî û manewî de piştgirîya nivîskarê me nakin, da ku nivîskarêñ me bikaribin bi awayekî profesyonel kar û barê xwe birêve bibin. Hoya sisîyan: Bela ku civata me paşketî ye, kultura xwendevantîyê di nava gelê me de weha ne bi hêz û bi rexbet e. Hoya çaran: Ji ber çavşorîya hêzên dagirker berhemên ku ji alîyê nivîskarêñ me têne nivîsandin, di nava gel de nayêne belavkirin, ango kanalên belavkirinê ji alîyê hêzên dagirker ve têne xitimandin. Hoya pêncan: piranîya nivîskarêñ me li sergomê berhemên xwe çap dikin, bela vê yekê jî belavkirina berhemê wan - çi li welêt û çi jî li derveyî welêt - hê dijwartir dibe. Ji ber van sedeman, piranîya çapêñ nivîskarêñ me kurdan biçûk in. Ji ber vê yekê jî hindik û bi xisar têne firotin, ango nivîskarêñ me nikarin kar û barêñ xwe bi rê bixin, xwe bi xwe xwedî bikin. Bela vê yekê jî kar û barê çandî li welatê me bi awayekî sistematiķî nayê lidarxistin. Ji bo serrastkirina vê kêmâniyê hêvî dikim ku dê ronakbîr î siyasetvanêñ me li gora reweşa tro plan û poroje-yêñ xwe li dar bixînîñ da ku çanda me jî weke ya welatên din li ser dînamîkêñ civate me geş bibe. □

Stokholm, 22 / 04 / 01

Bavo televizyonê neşikîne wê bide min!

SERKAN BIRÜSK

Hinek kes li derûdora mirov henin, Hew bi rasîf jî, pir bê rehm, dilkevir, dilrejî û isma henûniyê di dilê wan de tuneye. Ger tu hestên van mirovan di formekê de bi gewd bikî, ew ê ji madena herî hişk, ku elmas e, bixwe. Bi gotinek din, ê ji wî çiyayê qeşayê, ku keştiya Tîtanîkê perçeperçe kir jî, pîrr cemidîstir û hiştir be.

Îca mixabin ku gelek caran ji van kesen bi vî rengî re li hevdu tê. Ev mirov, ji bo demek kurt be jî, dibilin xwedî desthilardarî. Ew di vê demê de şîrê ku xelkê ji çıkışkên diyênxwe bi bêmineî mêtine di pozên alemê re tînin xwarê.

Ez nûxuriyê malê bûm. Min sefa çaran ya dibistana serate dixwend. Teví ku nîvê karêñ malê hîna di wî temenê biçûk de katibûn stûyê min jî, dersêñ min ne xerab û ne jî pîrr-pîrr baş bûn, bi gotineke din ez şagirtekî baş bûm. Mamostê min yên ku bi rewşa min di-

zanîbû, wî timî nav di min de dida. Bi vî awayî wî ez li xwendinê sor dikirim. Dayika min jî gelekî ji ber min serbilind bû.

Ew serê şes salan bû ku bavê min li Erebistana Sudî dixebeitî. Du salêñ pêşî wî hinek pere bi riya hevalekî xwe ji me re şandibû. Li gorî pîvanêñ demê pereyekî baş bû. Me bi wan pereyan malek li bajêr kirîbû û lazimiyêñ xwê yên salê jî danîbûn. Mala me pir mezin bû. Em di du odayen de bi cî bûbûn û du odayêñ din jî me bi kirê dabûn merivekî diya min. Min jî li bajêr dest bi dibistanê kiribû. Du salêñ pêşî rewşa me baş bû.

Sala sisêyan bavê min pereyêñ me li ser navê pismamekî xwe şandibû û bi vî awayî semyantiya me jî ketibû destê wî. Ji wê rojê û pê de despêka dawiya rehetiya me dest pê kiribû. Pismamê bavê min berî me bi deh salan koçî bajêr ki-

ribû. Wî hemû salêن xwe ên li bajér bi hemaltıya li halê derbaskiribûn. Pişti ku bavê min ew li ser serê me kiribû semyan êdî wî dev ji hemaltıyê berdabû û li heman hala ku çermê pişta wî ji ber barêن giran mîna tertan qalind bûbû, dest bi bazırganiyê kiribû. Wî birayê xwe yê li gund anîbû û di koxemala xwe de bi ci kiribû. Ew bi xwe ji ketibû şûna kirêciyê me. Bi vî awayî kirêya me ji ji destê me çûbû.

Çar zarokên Çetoyê pismamê bavê min hebûn. Yek ji wan keçik bû yên din ji kurik bûn. Serdarê kurê wî yê mezin bi salekê ji min mestir bû. Ew diçû sefa pêncan. Ev cara pêşî bû ku min ê ev pisêpismarmê xwe nas kiribûya. Hebûna merivekî min li heman dibistanê gelekî baş bû. Êdî paşmîrekî min ji çêbûbû. Me li dibistanê xweyîti li hev dikir û me hev digit...

Bavê min ji me re bi hecacekî gundiye xwe re televizyonike biçûk şandibû. Ji hecî re dibêje tu ê vê televizyonê bidî zarokan. Hecî televizyonê dide pismamê bavê min. Rojekê ez û Serdar ji dibistanê dihatin, hîna em negihîştibûn hewşê birayê Serdar yê helî biçûk, bi kêf û eşq ji malê qêriyabû:

– Bavê min ji min re televizyonek kiriye.

Berî ku ez biçim malê ez rast çûbûm cem mala wan. Jixwe salon di navbera me û wan de hebû. Min cara pêşî destê xwe dida televizyonekê. Ew aleta ku

mirov di nava wê de hebûn. Min ê êdî li filîman temaşe bikira. Ez zû hatibûm malê. Min mizgînî dabû diya xwe. Diya min erza min şikenandibû. Pişti ku min xwarina xwe xwaribû, min rahiştibû termûzê cemedê û ez di derî re pekiyabûm. Çawa be televizyon dereng vedi-bû. Heta wê demê min ê hemû cemedên xwe bifirota û ez ê bihatama malê. Wê rojê ez bikêf çûbûm kar û min ji hemû rojan bêtir bi kêfweşî gotibû:

– Werin bûzê.

Ev serê çend mehan bû ku min dest bi vî karî kiribû. Rewşa me di bin semyantiya pismamê bavo de pir xerab bûbû. Li gorî ku wî digot bavê me êdî ne-ma mîna berê pere dişandin. Tiştikê ku dişand ji ji xwe wî dida me. Her ku diçû rewşa me ya aborî qelstir dibû. Teví ku me mesrefa xwe ji sedî pêncî ji kêm kiribû, dîsa ji me nedikarî em ser û binê mehan li hev derxînin. Lewma ji min dest bi firotina cemedê kiribû.

Roja pêşî me tevlî cîranêن xwe li televizyonâ pismamê bavo bi azadî temaşe kiribû. televizyonâ reş û spî em hemû bi xwe ve girêdabûn. Heta ku hatibû girtin em ji ber ranebûbûn. Çend rojên din ji me bê seravde lê temaşe kiribû. Lî her ku çûbû xewa Çeto zûtir hatibû. Hema ku me dida derî, ew bi zarokên xwe de dixeyidî, wî ji wan re digot:

– Hûn divê dersên xwe çêkin û zû razîn. televizyon ji gelekî germ bûye, ew ê niha biteqe. Ka cîyê min deynin ez ê

razim. Wî nivînên xwe li ber televizyonê datanû û lempe jî vedimirand.

Em piraniya caran ji ber derî bi dilekî hêrsbûyî û şikestî vedigeriyan malê. Pişti demekê me ferqkiribû ku xewa wî mîna ya mirîşkê ye. Hema ku dikeve nava nivînan ew di xew re diçe. Pişt re zarokên wî carek din televizyon pêdixistin. Me jî xwe hêdîka di ber derî re dişexitand hundir. Ev demeke baş bû. Bê ku em gotinên bi giraniya debûzên polayî li ser dilê xwe yê biçûk bibihîzin, me ji xwe re li televizyonê temaşe kiriþbû. Lê pişt re Çeto ev yek ferq kiribû. Çend caran ew şiyarbûbû. Em li wir dîtibûn. Her carê wî televizyon digirt û berdida me. Em bi qırıktalî û bi çavêntije hêşir ji mala wî derdiketin û bi dilşikestî bi ser rebena diya xwe de vedigeriyan. Pişti cend carêni bi vî rengî, dayika min çûyina mala wan li me qedexe kiribû. Edî Serdarê kurê wî ji min re li dibistanê behsa filmîan dikir. Ev rewşa han, heta ku min çareseriyeke bi xeter peyda kiribû domandibû.

Mîna ku min got di navbera me û wan de salineke fireh hebû. Deriyên malen me vedibûn heman salonê. Lê pişti dewlemendbûn û bi taybetî jî, peydabûna televizyonê, Çeto ew deriyê xwe yê vedibû salona hevbes betal kiriþbû. Li şûna wî deriyî deriyekî din vekiribû. Vî deriyê nû riya me ji binî ji ser hev qut kiribû. Edî ne riya me bi mala wan diket û ne ya wan bi mala me di-

ket. Bi tenê carinan xatuna wî dihat serdana dayika min...

Me jî ew salona fireh ji xwe re mîna embarê bikaranibû. Me qutik û hejikên xwe yên zivistanê jî li ber wî deriyê betalkirî rêz kiribûn. Lê salon têra xwe fireh bû. Carinan min û birayê xwe yê bi dû serê min de, me ew salon mîna seheya futbolê bikar dianî. Xweş tê bîra min, min carekê pêhneke bi hêz li topê dabû. Top bi wê xurtiyê li binê zikê hêwanê ketibû û dûv re jî, ji zemînê pengizibû û li ser rêza qutikan sekinibû. Ez ji bo daxistina topê bi xar hilkisiyabûm ser wan qutikan, ha wê demê min ew qula ku tîrêjîn ampulê têre derdiketin û didan hejikan dîtibû. Hema min xwe melisandibû. Min di dilê xwe de gotibû xêra Xwedê ye. Min destêni xwe ji kêfan re firkandibûn. Ne jîxwel dengê televizyonê jî dihate min. Ma ci ji vê xwestir hebû!?. Hema min bi bêdengî xwe berrepas berdabû xwarê. Lê min qet ji bîrayê xwe re behs nekiribû.

Edî hema pişti şîvê min xwe didizi û ez diçûm û min bi bêminetî li televizyonê temaşe dikir. Edî ez ji sergiraniya pismamê xwe jî rizgar bûbûm. Heta têbîra min carekê pismamê min xwestibû ji min re behsa filmekî bike, min gotibû ne hewce ye. Serdar bi ecêbmâyî li min temaşe kiribû.

Lê ez divê bêjim ku birayê min Dilêr ji binî ji televizyonê qut bûbû. Çend caran Dilêr xwestibû digel min derkeve lê

ez bi dijwarî pê de xeyidibûm.

– Tu ê bêyî ku? Ez û hevalên xwe em ê herin bigerin. Tu li malê li cem dayê û Şîlanê bimîne. Dibe ku ez hinekî dereng vegeirim.

Dayê li vir gotina min dibrî:

– Tu nabî dereng bimînî. Kurê min hezar qede û belên dunyayê hene. Zêde dûr neçe û dereng jî nemîne. Dilêr tu nikarî herî. Şev e.

Ez bi vî awayî ji Dilêr rizgar dibûm. Vê rehetiyê heta ku Dilêr carekê ez bi bêhemdî li ser rêza qutikan dîtibûm, berdewam kiribû. Heta wê kêtikê jî, rewşa min pir baş bû? Ci bû piştî vê keşfa bêhemdî bûbû. Ew hema wilo bê his bi dîwarê ji qutikan ve hilpirikî bû jor. Dîna min dîtibû, ew li pişt min e û çawa bi qutikan ve hildikişe jor. Ez pê de xeyidibûm lê fêde nekiribû. Min ne-wêrîbû dengê xwe jî bilind bikira. Ji neçarî min alîkariya wî kiribû. Ew hilkişiyabû cem min.

Ji ber ku kuna di derî de pir teng bû, diviyabû me bi dorê li televizyonê temaşe bikira. Wekî din jî em herdû bi hev re li ser dîwarê ji qutikan bi cî nedibûn. Jixwe ya ku helî zêde ez ditirساند û heta bûbû sebeb ku ez ji birayê xwe re behsa vê keşfa xwe nekim jî, talîka ji dîwarê qutikan bû. Ev xeter bû ku dawiya dawî di serê min re derketibû.

Wek niha li ber çavê min e, ew dema ku me bi dorê li flîmê reş û sipî ku ba-

beta wê li ser bavekî serxweş bû, temaşe dikir. Bavê malê yekî eraqveyxwur û tolaz bû. Kurekî wî yê heş-nehsalî hebû. Ew bi nexweşîyeke giran ketibû. Dayika wî bi dizî hinek pere dabûn aliye kî da kurê xwe xweş bike. Lê bavê lêwik rojekê bi ser peran vedibe û heta sibehê di binê perên ku dayika lawik bi mehan ji devê xwe biribû de bang dide. Jinik pê hesiyabû. Hema çenemene nekiribû û xwe mîna mirîşkek kurkketî qij kiri bû ser çavê mîrê xwe. Bi qîjîniya pîrekê te birayê min xwe bi paş de avêtibû. Pê te jî xurîniya qutikan û hewara min û birayê min tevlîhev bûbû û li nava wê hêwana fireh belav bû. Ji ber ku ez şipi ya bûm min xwe çem kiribû. Ez di bin qutikan de nemabûm. Ez birîndar nebûbûm. Tenê dest û çokên min hinekî zelitibûn û hew. Yanî tu birînê xedar yêñ fizikî li laşê min tûnebûn. Lê birayê min pir eşiyabû. Bi gotina dayê: "derikê me hatibû girtin".

Dilêr dîbinê qutikan de mabû. Dema dayê ew nehişî ji binê qutikan deranîbû, wê ew pîjê di çavê lêwik yê çepê de jî, dîribû. Dayê hema dikir hewar û digiriya. Ez mîna pûtekî şipiya sekînîbûm. Min nema karîbû bimeşim, bigirîm û ne jî bilivim. Heta ku dayê engîş-kek li nava serê min dabû. Hîna nû ez mîna miriyekî ruhpêhatî bûbûm. Dayê Dilêr dabû ber himbêza xwe û di derî re derketibû. Birayê min bi teqsiya cîranê me avêtibûn nexweşxaneyê.

Ez wê şevê bi tenê li ber xuşka xwe ya biçûk mabûm. Min bazor ú heft beleyan Şilan razandibû. Piştî razana keçikê tirsek xedar li min peyda bûbû. Ew surêtê bi xwîn yê Dilêr ji ber çavêن min neçûbû.

Mirin.

Vê mefhumê pêlên cemidî yên lerzê li nava bedena min ya biçûk radikirin. Min êdî nema wêribû çavêن xwe bigirta. Lê xewê zora hişê min biribû. Heta ku ez bi qêrînekê veciniqîm. Bi qêrînê re ez nehişî ji nava nişnîn xwe pekiyabûm û li ber pencereyê şipê sekînbûm. Min ji nişkê de kurpekurpa dilê xwe bi-hîstibû. Mûyên laşen min hemû wisa gjî bûbûn. Tevzînok li min rabûbûn. Hêlek min diqefilî û ya didin ji german diperitî.

Dema wî dengê nediyar ez ji nava nişnîn rakiribûm û ez nehişî ber pencereyê ve kişandibûm, êdî terişen sipî ketibûn ezmên. Dunya gewrikî bûbû. Ji pişta ciyayê li raserî min soriyeke ji renğê pêtên agir rengê xwe li ezmên hêdî hêdî vedida û her ku diçû ewrên gewrikî ji didan ber xwe. Ewr li ber çavêن min mîna dêzên ji pembo dişewitîn. Pêta agir li ezmanê gewrikî belav dibû û stêrk yeko yeko dirijandin.

Stêrk ji konên xwe sor dikirin. Ew mîna berikên topan bi ser ewran de batıyan.

Bayê ku li serê sipindaran diket çixe-çixa çûkîn çavlixew hildigirt û bi pes-

teke mezin li cama min hukum dikir. Bayê bang li min dikir. Piştî vemirandi-na her pêleke xurt dengê straneke bi şîn ku ji nava lêvîn pîreke porkur derdiker, xwe bi zorê digîhand kerika guhê min. Bi hatina pêleke din pîr ji ber çavêن min winda dibû lê dengê wê bi berde-wam ji guhê min nediket. Her ku çûbû ez ji lêdana dilê xwe sil bûbûm. Min pê re ji di qurmên mijankêن xwe de derbûna kaniyekê hîs kiribû. Bêdengi-yek li xweristê peyda bûbû.

Ha wê demê min di cama ku ji nefesa min hilim gitribû re, termê birayê xwe dîtibû. Ew di nava kefenekî sipî de bi jor ve difiriya. Wî destê xwe dirêjî min kiribû. Tiştek digot. Lê deng nedihatê min. Çavêن min hema wisa beloq ma-bûn. Her ku çûbû pêlên tirsê hîn xurt-tir û bi héztir li dilê min yê biçûk belav bûbûn. Ji binê kortala piyêن min heta bi pişta stûyê min û ji wir ji heta bi tayê porê serê min, tofana tevzînokan li ben-da min rabûbû. Min hêdî hêdî hîs dikir ku çokêن min nema karin xwe li ber giraniya bedena min bigirin. Min bi awa-yekî bêhemdî herdû destêن xwe danîbûn ser keviya pencereyê da ku ez jê hê-zê werbigitim û giraniya li ser kabokêن xwe siviktir bikim. Lê destêن min ji ke-viyê negirtibûn. Ew mîna du têsiyan ji keviya pencereyê bi xişenî li çokêن min ketibûn. Min serê xwe bilind kiribû, da ku ez şopa birayê xwe bibinim. Heta ez serpiş li erdê ketibûm û çavêن min tarî

bûbûn jî, min çavêن xwe li ezmên gerandibû.

Dotirâ rojê ez pêhesiyabûm ku çavekî birayê min derkerkiye. Wê Dilêr ji wê rojê û pê de bi çavekî ba. Ew zilamê ku xar di çavê wî de bû, hate bîra min. Kizînî ji dilê min bilind bûbû.

Dayê çavêن xwe girtibûn û devê xwe vekiribû. Çi dihate ber devê wê, wê ji min û bavo û malbata bavo re rêz kiri-
bû.

Dayê, hema wê rojê xeber bi yekî gundiyyê me re ji bavo re şandibû. Hîna me paçê li ser çavê Dilêr venekiribû ba-
vovo xwe gihadibû malê. Dema bavo bi-
rayê min di wî halî de dîtibû û tişte ku
pisê pismamê wî anîbû serê me, ji dayê
û ji cîrananbihîstibû, ew dîn bûbû. Ca-

vêن wî ji hêrzan mîna pizotên êgir sor
bûbûn, damarêniya wî bel bûbûn,
ew lal bûbû û ricifî bû. Wî hema ji nav
wan qutikan rahiştibû sîxekî û heta
Xwedê qewet dabûyê, wî ew sîxê bi gin-
cir dawêşandibû nîvê serê Çeto. Baş bû,
ku Çeto serê xwe bialîyekî kiribû. Dar
li sermilê wî ketibû. Çeto li hêwanê di-
rêj bûbû. Dû re jî bavo ketibû mala wî
û hemû firaxên wî avêtibûn derive. Min
û dayê kiribû û nekiribû, me nikarîbû,
em bavo haş bikin. Giriyê wan zarokan
hîna jî di guhê min de ye. Baş tê bîra
min, ez rûniştibûm û têra xwe bi halê
birayê xwe û wan zarokan giriyabûm.
Dengê Dilêr dihate min”:

– Bavo televizyonê neşikîne wê bide
min. □

Li ser nivîskariyê

FIRAT CEWERÎ

Rast e ku kitêb zikê mirov têr nake, lê serê mirov têr dike. Seriyekî têr ji dikare zik têr bike.

*

Nivîskarî nexweşiyek e, ji nexweşiyê ji wêdetir wek vîrusekê ye, di hemû laşê mirov de digere û heta mirinê dev ji mirov bernade.

*

Hin hene xwe bi nivîsandina kurdî qure dikin, nivîsandina kurdî ji hin kesan qure dike, lê yên ne xwendevan quretiyê li herdu aliyan ji dike.

*

Gava min nivîsand min bi zimanê diya xwe nivîsand, lê diya min nizane bi zimanê xwe bixwîne.

*

Hin kes hene dibêjin, xwezî ez nebûma nivîskar, ji wan weye ku bûne nivîskar.

Hin hene pir dixwînin lê nanivîsinin, hin jî hene naxwînin lê pir dinivîsinin. Yênu ku pir dixwînin hinekî binivîsandina, yênu ku pir dinivîsinin jî hinekî bixwendina wê tro edebiyat di qonaxeke din de bûya.

*

Hin hene baş dinivîsinin lê nizanîn bipeyivin; hin jî hene baş dipeyivin lê nizanîn binivîsinin.

*

Heger min nivîskar bi rabûn û rûniştin û bi tevgerên wan nedîtina min ê bigora ew pêxember in, lê dibêjin pêxember jî wek nivîskaran bûn.

*

Xwendina edebiyatê carinan bi mirov xweş tê, carinan jî li mirov xweş tê.

*

Hin nivîskar bi kitêbêñbicûk mezin dibin, hin nivîskar jî hene bi kitêbêñmezin bicûk dibin.

*

Nivîskarin hene dixwazin kirâse siyasetê li edebiyatê bikin, gava ew kirâs li edebiyatê nayê vêca dienirin.

*

Dibêjin "mirov deh salan tenekan bitewîne mirov ê bibe sobeciyekî baş", heger nivîskarî wek tewandina tenekan bûya wê niha hejmara nivîskarêñ me yên baş pir bûna.

Carinan yên bêedeb edebiyata herî bedew dinivîsinin.

*

Nivîskarî hunerek e, huner dayineke Xwedê ye, Xwedê wê zû bi zû nade herkesî.

*

Nivîskarên baş ne ew in yên ku zêde derewan dîkin an jî bi tenê rastiyê dibêjin; nivîskarên baş ew in yên ku kêm derewan dîkin û rastiyê ne wek rastiyê dibêjin.

*

Hin nivîskar dibêjin min di bîst salan de bi zorê kitêbek nivîsand. Ew tira-lî û bêkêriya xwe mîna marîfetekê dibînin.

*

Rast e ku nivîskarî xweşiyê dide mirov, lê kes behsa êşa nivîskariyê nake.

*

Hin ji kurdan bi daran, hin bi tivingan, hin jî bi qeleman radibin hev, hemû jî şerê birakujiyê ye.

Kürt edebiyatında uzun bir soluk: **NÜDEM**

Kürt edebiyat tarihinde, en azından Kuzey Kürtistan'da, yaşamını uzun süre sürdürmemiş çok az edebi dergi vardır. Hawar, Ronahi, Roja Nû gibi yurtdışında çıkan dergileri bir yana bırakırsak edebiyat dergilerinin çoğu ya siyasi baskı ve istikrarsızlıktan, ya da ekonomik nedenlerle, yayınlandıktan kısa bir süre sonra yayınlarına son vermek zorunda kalmışlardır.

Nüdem, uzun süre yaşamını sürdürmeyi başaranın, uzun soluklu bir Kürt edebiyat dergisi. Genel yayın yönetmenliğini, öykü yazarı, Fırat Ceweri'nin yaptığı dergi 1992'de yayın yaşamına başladı. Onceleri periyodlular yayın yaşamını sürdürdü. Derginin son ve 14. sayısı Yaz-1995 tarihini taşıyor. Dergi, İsveç'in başkenti Stockholm'de ve bütünü Kürtçe olarak çıkmaktadır. Derginin dili ağırlıklı olarak Kurmancı olmakla birlikte her sayıda Dimili ve Sorani lehçelerinde de yazılıra yer verilmektedir. Değişik sayılarında bu ormanın altına ya da üstüne çikılmışsa da dergi genelde 114 sayfadan oluşmaktadır. Dergide ağır basan her ne kadar öykü ise de hemen hemen aynı ağırlıkta şiir ve araştırma-inceleme yazılarına, geniş röportajlara da yer verilmektedir. Başlangıçta öyle



Nüdem, önemli Kürt kültür dergilerinden biri.

olmasa da, bir kaç sayıdan sonra, dergi, çok zengin bir yazar kadrosuna ulaşmış durumda.

Nüdem, herhangi bir siyasi çizgiye yanaşmamaya özel bir özen gösteriyor. Nüdem'in yazar kadrosunda her dişinden insanı rastalamak mümkün. Hepsi bir araya getiren ise, ortak uğraşları olan edebiyat. Derginin yazar kadrosuna ve dergide yazanlara baklığımızda ortaya çok zengin bir tablo çıkarıyor. Kimler yok ki; Fırat Ceweri, Rojen Barnes, Zeynel Abidin Zınar, Şahîn B. Sorekli, Mustafa Düzgün, Tosînê Reşid, Mervanê Keleş, Haviz Qazi, Serefşan Cizîri, Xelîf Duhokî, H. Küliç, Faruk Yaküp, Bares Batte, Mihemed Efîf Huseynî, Hüssem Hebeş, Arjîn Arî, Koyo Berz, Ehmed Huseynî, Rohat, Hesenê Metê, Eskerê Boyik, Férikê Usiv, D. Mêgerî, Mueyed Teyib, Fazıl Umer Salih, Mihem Himbâlij, Revdar Mizûri ve diğerleri....

Nudem Yayinevi de var

Nüdem daha sonraları, yazarlarının ürünlerini kitaplaştmak, eskiden çıkan kitaplardan yeniden basmak ve diğer dillerden kitapları Kürtçe'ye kazandırmak için bir de aynı isimle bir de yayinevi kurmuş ve şu ana kadar 13 kitap yayımlamış bulunuyor.

Önümüzdeki dönemde Nüdem-Werger (Nudem-Ceviri) gibi yeni bir projeleri var. Nüdem'in en önemli eksikliği ise, sadece kitap tanıtımına sınıflaştırmaları, yani dergide edebi analizlere, eleştirilere pek fazla eğilmemeleri olarak belirtilebilir. Onu da gerçekleştirmelerini diliyorum.

Sonuç olarak, Nudem ve onun gibi dergiler, edebiyata profesyonel yaklaşım gösteren dergiler, Kürt edebiyatının gelişiminde birer köşe taşlarıdır ve Kürt edebiyatına çok şey katmaktadır. Daha da uzun bir soluk, daha uzun yıllara diyorum. Derginin adresi: Termov. 52 2tr. 17577 Jarfalla-Sweden Tel ve Fax: 8-583 564 68

♦ CAN GÜLŞENOĞLU / FRANKFURT

*Yeni Politiken
Nummer: 91, 13 Juli 1995*

Dîsa got, şanê wî pîroz be (ji dengê tîpa elîfê: Z=A)

MELE EHMEDÊ ZIVINGÎ

Serê zulfa te bi kullabê du'a
Hate destê mi bi cellabê du'a

Kullab: Hesinek e yan jî darekî sergopal e ku tişt pê têne kişandin.

Cellab: Yê ku pir dikşîne, dibe ku mebest pê ew kewê ku di rikêbê de dixwîne û yên kovî dikîşîne ser dafikê be.

Bi kurtî: Bêguman serê gulangê te bi alîkarîya wî hesinê sergopal û wî xweşkêşî gîhişte destê min.

Encama maneyê: Ey dildara min serhêlên gulangên te bi saya serê wan duayê ku mîna gopalê hesin tiştan bi ser xwe ve dikişîne, yan jî mîna wî teyrê ku nêçîrê dikşîne ser dafê û digihîşîne destê min. Ev li gor maneya "cellab" ya duyemîn e, yan jî bi saya wan duayên xweşkêş ew wan dikşîne û digihîşîne destê min. "Cellabê du'a" bi "kullabê du'a" ve hatiye gihanîn; lê gihanek nihêniye.

Sofiyê xelwenuşîn* bêne sicûd,
Herdu birhêne te ne mîhrabê du'a

Bi kurd: Birûyêne te di dema serdanînê (secdeyê) de mîhraba wan sofiyêne pe-restgehê yên xelwenuşîn (çilekêş) in

Encama maneyê: Ew sofiyê di çilekêşgehê de gava ku übâdet dîkin û diçin sec-deyê, ew têr pêşberî wan birûyên te yên weke mîhrabê zarî û duayê xwe dîkin û berê wan her li wan birûyên kevanokî ye. Ji xwe diyar ku birû ji bo delalî yê bi mîhrabê harîye şibihandin.

'Erzî kê dê bikirim sûretê hal,
ku tu yî qîbleê erbabê du'a

Bi kurtî: Ma gelo ji te pêstir kesî ku ez rewşa xwe jê re bibêjim heye? Na xêr tûne, çiku berîgeha (qîbleya) erbabê zanayê bi du'a her tu yî.

Encama maneyê: Ey dildara min ji te pê ve ez ê rewşa xwe û derdê dilê xwe ji kê te gilî bikim. Ji xwe ji te pê ve tu kesê ku ez vê bûyerê jê te şirove bikim û bînim ziman nîne. Çiku berîgeh û cîhê serî lêdana kesên umîdwar û hêvîxwaz her tu yî; nexwe ez jî daxwazî û serpêhatiya xwe bi tenê ji te re dibêjim.

Ji du'ayê, qedehek der dest e
Her seher mestê meyê nabî du'a

Bi kurtî: Piyaleyek ji du'ayan di dest de ye yan jî nêzîk î ber dest e û her beyaniyê ez ji ber araqa du'ayên safî serxweş im.

Encama maneyê: Pyaleyek du'ayan bi destê min e, yan jî nêzîkî min amadeye. Yanî ez timî bi du'ayan û bi daxwazîyên ji dildarê ve lepikîme û ji vê yekê qet nakerixim. Ez her sibe bi araqa du'ayên bêxiş ser mest im. Yanî ez her beyanî di nav du'ayên jî durûtiyê pak de nixrobûyî me.

Gulê îqbalî ji gulzarê qebûl
Mi çinîbû di şekerxwabi du'a

Bi kurtî: Di nîvê xewa şerîn î xweş de min ji baxçeyê gulan yê pêşhizûrê gulên siud û îqbalê çinîn.

Encama maneyê: Min di dema duayên ku weke xewa şêrîn bîhnfirehiyê didin û can û bedenê hêsa dikin, de gulên siûd û îqbalê ji baxçeyê gulan yê pêshizûriyê çinîn.

Ber du birhêne te ji îxlas û yeqîn
Mi dibir secde bi adabê du'a

Bi kurtî: Min ji dil û can li himber birûyên te bi edeb serî datanî erdê.

Encama maneyê: Min ji dil û can, ne ji bo durûtîyê, li gor eger û viyanêñ per-werdekarîyê li pêşber birûyên te serî danî erdê û çûme secdeyê.

Ji dilek saflı tu mihrabê bibîn
Secdeyek lazim e der babê du'a

Bi kurtî: Dema ku te mîhrabê dît, divê tu di wextê du'ayan de ji dilekî paqîj li ber serî deynî û herî secdeyê.

Encama maneyê: gava te mîhraba birûyan dît û berê te ketê divê tu ji dilekî safî û paqijê ji kederên nefsi berê xwe bidî wan birûyan, ji wan re pate bibî û herî secdeyê; ev babet û riya daxwazî û hêviyê ye.

Mi di dil 'urwetê wusqa ye bi dest
Ji senaya te ser elqabê du'a

Bi kurtî: Qulpa ewletîyê bi nihêni (batini) di destê min de ye çiku ez di pêşîya duayên xwe de pesnê te didim.

Encama maneyê: Qulpa ewletîyê, ya saxlem î qewî bi nihêni di destê min de ye. Ew pêwendîyên min yên nihêni î xurt bi te ve ji ber wan pesn û wesyetên pêşî yên destpêka dua û zarîyan e. Yanî ji ber ku ez di destpêka duayên xwe de

pesnê te didim, têkilîyên min yên nihêni î saxlem û pêwendîyên xurt î qewî bi hizkirina te ve çêbûne.

Ji ezel yek cîhetî daye Melê
Her me îxlas e ji esbabê du'a

Bi kurtî: Xwedayê payeberz ji herheyî (ezelî) ve bawerîya bi yekbûna sererast (tewhîda heqîqî) daye Mela. Ji wê bûnê jî sedemên wî yên taybetî ji bo du'ayan hene.

Encama maneyê: Xwedê hê ji kevn û ji herheyiyê ve bawerîya sererast ya bi yekbûna xwe ya bêguman û bêşik daye Melê û ji ber vê yekê jî ez (yanî Melê) ji sedemên astengiya pejirandina duayan yên mîna riyakarî û nexweşînên din yên nihêni azad û xelasbûyî me.

Beşa ku kafiye bi típa bê (= B) ye
Dîsa got şanê wî pîroz be!

Destê qudret ku hilavêtî ji bejna te nîqab
Bi cemala ceberûtî me neman perde w nîqab

Bi kurtî: Gava destê şeniyê perdeyê ji ser bejna te rakir yan jî gava rûbend û perde ji ber cemala xwedîhêz rabû hingê ti rûbend û perdeyên ku ji bo dîtina cemala zordar û xurt ji me re bibin asteng, neman.

Encama maneyê: Ci dema destê karîna herheyî ji ser bejna te perde û rûbendê rakir û wê derxist pêş çavên me, hingê li pêşber cemala hêzdar û bi heybet ti tişt nema; ew cemal derket holê û çav bi dîtina wê şâ bûn. Yan jî gava destê şenayîyê cemala te ya bi hiner raçavî me kir, rûbend û serpûş ji ser heyiyên din bra-bûn û tiştên bi dizî û veşartî deketin rastê.

Li gulên tey ter û nazik ku seher girtî xunav
Di ebarîqê qinînan ji hesed suhtî gulab

Bi kurtî: Gava beyanîyê avî (şebnem) kete ser gulên te yên ter û nazik hingê ava gulê di wan misînokêن xwe yên fiq û birqok de ji hefsûdîyê heliya.

Encama maneyê: Ber beyanîyê dema şebnem bi ser wan gulên te yên ter û nazik ve ket wê gavê ava gulan ji di misînokêن cam û fiq yên hilanînê de ji zikreşî ya wê bîhna avîyê ya xweş heliya. Yanî wextê xwîdana yarê ya bîhnxweş li ser dêmêن sor belabû, gulava hundirê misînêن cam û belor ji çavnebarîya wê bîhna xweş heliya.

'Eynî kafûrî ye meşreb me ji husna te ye saf
Lew ji 'iştqa te di dil da me vebû 'ilmê 'ubab

'ubab: navê ferhengekê ye ku Sexxanî* bîst cildê wê nivsandîye lê wê temam nekirîye û hê gihiştiye típa "m" ya Erebî. Hem jî dibe ku mebest bi "'ubab"ê derya be, yanî deryaya zanistîya nasînê û hikmeta Xwedayî.

saf: dengdêr û xuyadarê peyva "kafûr" e. Di hin çapan de "bi" hatîye: û hevok dibe 'eynî kafûr e bi meşreb. yanî di vexwarina me de kafûr bi xwe heye.

Bi kurtî: Ew kafûra safî ya ji delalîya te bixwe vexwarina me ye û ji ber vê ye ji ku ew zanîna di ferhenga 'Ubabê de hemî kete dilê me, yan jî deryaya temamê zanistîyan tê de avêt.

Encama maneyê: Kafûra bîhnxweş û spî û saf vexwarina me ye; yan jî ew ji delalî û bedewiya te ketîye vexwarina me. Ji ber vê yekê û ji ber evîn û hizkirina te zanîna di ferhenga 'Ubab de hemî kete dilê me; yan jî zanîna deryaya hikmetê Xwedayî di dilê me de sax da.

Yanî mijandina ji kanîya spehîtî û rindîya te evîneke rastî û hizkirineke Xwedayî gihiştande me û ji ber vê yekê jî avzêmên zanîn û hikmeta îlahî di dilê me de ve-bûn.

Me ji ser çeşmeyê heywan qedehêk safî vexwar
Nagihî lezzet û zewqa me bi sed cildê kîtab

Bi kurtî: Me piyaleyek ji serê kanîya ava jiyanê (ava heyatê) vexwarîye û ji ber vê yekê jî ne mumkin e tu bigihîjî tam û xweşîya ku ji me re çêbûye çendî ku tu sed cild pirtûk jî bixwînî.

Encama maneyê: Bêguman em gîhîstine serê kanîya ava jiyanê û me piyaleyekê safî î paqîj jê vexwarîye. Vêca ti carî tu nagihîjî bingeh û rastiya tam û xweşîya ku ji me re peyda bûye meger tu di vî warî de sed cild pirtûk jî bidî hev, rêz bikî û bixwînî jî.

Lew di çengê me dixwûnî ku di 'îşqa te bi saz
Me bi bejna te dixwûnin ney û qanûn û rebab

Bi kurtî: Sedemê ku tu, di vî halê me yê evîndariya te de, bi awazê çengê gazî me dikî ew e ku nay, qanûn û rebab ji bo dîtina bejna te pêkve me vedixwînin.

Dirêjîya watcîyê: Bêguman hoy û sedemê vexwendin û ezimandina te ji me re di halê evînê de bi ceweta awaz û dengê çengê ew e ku nay, qanûn, rebab û amûretên muzîkê yên din hemî ji bo dîtin û nihîrtina li bejna te pêkve bangî me dikan.

Mebest jê: Sedemê ku awazên çengê di rewşa evîndarîyê de me bi bal evîna te ve dikşînin ew e ku awazên peywengê din jî me ji bo dîtina bejna te ya nazenîn û dilruba vedixwînin. Gava em bi dîtina wê bejna ter û taze xweş bûn hingê bengîtiya me jî bi te zêde bû û awazên çengê hatin bengîti, evîndarî û dildarîya me tewq bi tewq bêhtir kirin

Qehweya telxî digel zehrî helahil biderî
Me ji destê te mûbarek şekeramîz e gulab

Bi kurtî: Ger tu qahweya tal yan jî araqâ bi jahrî jî bidî, ew bi min û li ber çavê min ji ber ku ji destê te yê pîroz e mina gulava şekirkirî ye.

Encama maneyê: Ey dildara min ger tu me bi qahweya pitr tal û bi jahrîya mîrinê jî avdî, dîsa ez dê wê wek ava gulê ya bîhnxwêş û şêrîn ji wan destêne te yê pîroz bigirim, çiku ci tiştê ji dildarê bê hizkirî ye.

Qulzemi 'isqê ji bayê xwo mûxalif demekê
Di hemamatê ecacê me li ser destê xirab

Bi kurtî: Deryaya evînê tu carî ji bayê ku keştiyê ji geşta wê dizivirîne xalî nabe. Em jî di nîvê bagerê de di gemîya bazirganîyê de ne digerin. Yan jî hingê gemî jî zor dide gera me.

Encama maneyê: Bayê deryaya evînê carekê li hev gerîya û em jî hingê li ser gemîya bazirganîyê di nîvê bablîsokê de li benda rizgarbûnê bûn, lê kaye ew rizgarî. Yan jî dibe ku gotina "muxalif" bayê be hingê divê piştî peyya "muxalif" yên "xalî nabit" lê bênen zêdekirin da weku mane weha be: deryaya evînê bê bager û ecacokê qet nabe û em jî di gemîyekê de, di nîvê bager û firtonê de ne; de încar em ê çewa rizgar bibin. Ev maneya dawî xweştir e lê ger ku ne ji zêdekirina bêjeyên "xalî nabit" be piştî bêjeya "muxalif".

Seherê Xudrê 'înayet ku birin çeşmeyê dil
Bi cehanê me nezer da ku cehan eynî serab

Bi kurtî: Gava ew parastina Xwedê, ku mîna Xidir bi meriv re digihîje di berbangê de me bir cem çavê dil hingê me lê nihêrt ku cîhan mîna leyлан e.

Encama maneyê: Gava parastin û miqeytbûna xwedayı ku mîna Xoceyê Xizir - ewleyî li ser be - mirov zû digihîjîne armancê, me berbangê girt û bire cem rastiya dil hingê çavêne me bi cîhanê ket me dît ku cîhanêke derewîn e û mîna ye leyłana ku di deşteke bêav de ye.

Eşkereye ku mebesta wî, sirêن wî pîroz bin, weha ye: "Çi dema himeta rêberê me, ku mîna Xizir rêsînas e, serê sibeyê me gihande rastîya dil yanî cîhê yekerebûna bi Xwedê re, hingê me li gerdûna bê Xwedê nihêri ku mîna ye laylanê. Lewra çi canîwerên ku li wir hene wunda dîbin û rêger (salik) ji Xwedê pê ve tu tiştî nabîne. Çendî me ev yek nedîtibe jî lê me ji gelek kesên gîhiştî bihîstîye; bêguman şêx Ehmedê Cizîrî jî yek ji wan kesan bûye.

Bi 'hebabê mebe mexrûr, wuhe sergeste Mela
Ba vi ber keftîye, wê beyhûde sergest e 'hebab

Bi kurtî: Ey Mela wisa bi tiştîn weke peqpeqokê di ser xwe re neçe û pê sergêjî nebe! Çiku di nava wê de bi tenê ba û hêwa heye, ew ji xwe re bêkêr û beyhûde digere û vale diçe û tê.

Encama maneyê: Mela ji xwe re dibêje: "Ey Melê bi wê peqpeqoka ku wisa xwes li ser rûyê avê digere sergêjî û kubar nebel! Texmîn neke ku ew gera wê ji bo mebest û armanceke kufşe ye û hêvî jî neke ku di hundirê wê de tiştekî bi qîmet heye! Na, bêguman ew texmîn şâş e çiku di nava wê de bi tenê ba û hêwa heye û bi yek libtekê jî dimihe û diçe. Ew bêkêr û bêfêde li ser rûyê avê digere û ti maf jî di gera wê de nîne".

Sererastiya maneyê: Tu bi hinek zanayênu ku îddia dikin û dibêjin: "Em gîhiştine pêplûka bilind ya îctîhad û ravekarîyê" nexape, çiku ew ji ber kêmhişî û nezanîya wan tê. Dîsa tu bi hinek şarezayênu zanistiya nagîhanî ('ilmê batinî) ku xwe weliyênu nîzîkiktirî Xwedê dibînin, nexape! Çiku ew bes ji ber xwe qurekîrin û tênegîhiştina bi awayê perwrdekariya rîgirî (silûk) û pêgîhiştinê ye. Nexwe ger tu xilasîyê bivîyî divê tu xwe ji herduyan jî dur bikî da ku nexweşîya wan negîhiye te û bawerîya te ya rast bi wan xiranebe. Ji ber ku ew mîna wan peqpeqokêni pifdayî yêni li ser rûyê avê bêkêr diçin û têni, ew bi yek pifekê yan jî bi derbeke piçûk vale û tine dîbin. Vêca gere tu bi tijehîya wan nexapî û wan jî-dil negîrî çiku ew bêbingeh in. Çewa ku şairekî Ereban jî gotîye: Tu xwe ji wê rastiyê bipêreze ku tu herkesê qelew weremî bibînî.

Dibe ku mebest bi hebabê cîhan be jî hingê mane weha dibe: "Ey Mela bi cîhana derewîn mexape! Çiku ew mîna peqpeqokê ser avê bêmaf û vala digere, di nav de bi tenê ba heye û zû tine dibe. Her weha di rewşa dinê de jî rastîyeke deshpêgir tine, belkî weke peqpeqokên pifdayî zû wunda dibe û diçe". Ev maneya han çêtir li ya rêza bihûrî, "Bi cîhanê . . . t dw." tê. Çiku ew jî rewşa derewîniya cîhanê mîna leyланекê dide dîyar kirin.

We ye Hudhud ji Seba bêt û bizanîn ci ye hal
Ku li halê me xerîban ne sûal û ne cewab

Bi kurtî: Ma gelo heye ku Silêmanê dunikul ji Sebayê bê da ku em jê hal û rewşê hînbibin. Çiku ti pirs û bersiv ji rewşa me duredestan nîne.

Encama maneyê: Gelo peyamekî mîna silêmanê dunikul ku ji Silêman Pêxember, ewleyî li ser be, re nûçeyeke eseyî ji Sebayê tanî heye ku ji ba dildarê were û me ji rewşa wê agahdar bike? Ji bo ku em rewşa cem dildarê hînbibin, bê ka ew me bibîr tîne û li bûyerên ku ji ber evîn û bengîtiya wî hatine serê me dipirse yan na. Lewra em ji agahdariyên li ser dîlxweşî û dîlnexweşîya wê dûr mane û pê nahisin. Ji xwe niha em penaber in û ji hêla wî ve li ser vê evîn û bengîtiya ku kezeb û gurçikê me diherişîne ji binî bêpîrs û pîrsîyan mane.

Herdu birthêne te ne mîhrab; ci îman û ci kufur ?
Bûd û nabûd ku yek in ev ci sewab û ci 'îqab?

Bi kurtî: Ci di rewşa bawerîyê de û ci jî di ya înakîriyê de be mîhraba perestinê her birûyên te ne. Vêca gava hebûn û tinebûna bawerî û nebawerîyê mîna hev be nexwe ev ci xêr û guneh in.

Encama maneyê: Bêguman hem bi rastî û hem jî bi nihêni (batinî) mîhrab û berîgeha (qîbleya) perestinê ci li cem kesê bi bawerî û ci jî li cem yên bêbawerî be, her tu yî. Çendî ku ev li gor kesê xwedênenas berbiçav cuda be jî dîsa rastî ev e. Nexwe hebûn û nebûna bawerîyê li gor awayê nihêni (batinî) û rastî jî her yek in meger ber biçav cihê bin jî. Vêca madem ku rewş ev e lê ev ci parêvekiri-

na li gor bawerî û erêniyê ye û ev çi tawanbariya li gor înkarî û nanakirinê ye. Ji xwe ti pêwîstiya vê taybetgêriyê û daxwazîya vê veqetê jî nîne.

Xuyaye ku şex - dilovaniya Xwedê lê be - vî tiştî di cihê yekerebûna bi Xwedê te, ku nîşandide bê çawa temamê peydabûyiyan mîna canîder (bêcan), şînahî û canîweran pêkve berê wan li Xwdayê pak e; bawermend û nebawermend hemî serî li ber mezinatî û viyana wî datînin û di ferманa desthilatdariya wî de ne û di cihê şâşî û dudilîyê de xeyberek tine ku ne mecbûrî fermandarî û serwerîya wî be.

Bêguman li ber çavên wî tu cihêtî di navbera bawerî û nebawerîyê de tune û ti pêwîstiya bi xêr û gunehan jî nîne. Ji xwe her tişt jê ye û bi bal ve ye, bi her zimanî ew tê gotin û ji berê ve ew tê perestin.

Were nîşanî Nîşanî de xwo, bê perde seher
Lê ji xwûnê bike perhîz, ku şehîdan ci hîsab?

were nîşanî Nîşanî de: "Nîşanî" ya pêşî bi mancya dîtin û ramîdan e, lê ya du-yemîn yek ji bernavkê Mela ye, şanê wî pîroz be, ew pirrê caran helbesta xwe bi yek ji wan diqedîne. Yanî ew nîşangeha kul û belayan e di evîna xwe de, yan jî ew nîşan û dirûv e ji wê yekê re.

Bi kurtî: Ey dildar were xwe beyanîyê bêperde ramî Nîşanî de! Lê hay jê hebe di rê de peşkê xwînê li te nekevin! Çiku kesê ku di riya evîna te de hatine kuştin bêhejmar in.


Encama maneyê: Ey evîndar, were serê sibê perdê ji ser delalîya xwe rake û xwe şanî vî dildarê xwe yê belengaz, ku bi Nîşanî navdar e, bide! Lê xwe û cilên xwe ji peşkê xwîna min û ya evîndarê din yên mîna min ku di riya te de diherike, biparêze! Çiku canbezârê wê rê ji hed û hisabê der in.

Wergera ji erebî: **EMİN NAROZİ**

* **Xelwenuşîn:** çilekêş, yê ku çil rojî yan jî zêdetir bi xwe yan jî li ber destê şêxekî di silûkê de dimîne û ıbadetê dike.

MIRINA BALDASSARE SILVANDE

Cîgirê Kontê Silvanyayê



MARCEL
PROUST

MARCEL PROUST (1871-1922)

Apollo şivaniya terşûtewalê Admetos dikir, helbestvan dibêjin.
Di her mirovi de yezdanek heye ku zarî şetan dike.

Emerson

– Alexisê birêzok, wisan negirîn. Hema dibe ku cîgirê kontê Silvanyayê hespekî ji bide we.

– Hespek mezin an canîkekî?

– Belkî hespek mezin mîna yê birêz Cardenio. Lê bi rastî ji dibêjim, niha wisan... li rojbûna çardehsaliya xwe... negirîn!

Çavêن Alexis ji pişt rondikan geş bûn dema ew ponijî ku dibe hespek lê bê diyarîkirin û rojbûna wî ji hat bîrê. Lê dîsan ji xemgîniya wî bi temamî xelas nebû çimkî diviyabû ew biçûya nik mamê xwe Baldassare Silvande, cîgirê kontê Silvanyayê. Erê Alexis, piştî bihîstibû ku apê wî nikare sax bibe ji, çend caran çûbûn seredana wî. Lê piştî hingê tiştek wek berê nemabû. Baldassare hay ji nesaxiya xwe bûbû û dizanî ku wî, herî zêde, sê jînsal mabûn. Alexis tê nedigîha ka çawa vê piştarstiyê mamê wî bi xemgîniyê nekuştibû yan dîn nekitibû, û hest pê kir ku nikare li ber xwe bide û apê xwe bibîne. Ew diramî ku mam dê bêguman ji dawiya xwe ya nêz dibû bipeyive û wî dê nikariya xemên mamê xwe vebirevîne û ta dê nikariya rondik û hêşirên xwe ji newerîne. Wî herdem li hember apê xwe, mezintirîn, keşketirîn, xurttirîn, şengtirîn û dilnermtirîn lêzimê xwe hurmetek mezin hebû. Wî pirr hez dikir ji çavên mamê xwe yên gewer, simêlîn wî yên boz û çökên wî, yên ku jê re di dema zaroktiyê de penagehek bizewq i narîn bûn û dişibîn asêgehek dijmin ticaran nikaribe xwe bigihîniyê, bi qasî hespikên hêsk û colankî xwesik û ji ayinghan ji pîroztir bûn. Bûneweriya reşbîn û tund a bavê Alexis jê re xerîb û ne-ecibandî bû û ew di aşop û xeyalîn xwe de li pêşerojekê bû ku bi berdewamî li ser pişa hespekî mîna xanimek nazenîn qeşeng û hindî padîşahîkî ji wurşedar be, û zelamîn mengî û îdeal li ber wî kesên mîna mamê wî bûn. Wî dizanî ku bi xwe ji dişibe mamê xwe yê keşxe û lewend û dizanî ku ew mam jîr, qenc e, bi qasî metranan an generalanbihêz û bibandor e. Erê wî ji gotinên dêbavê xwe fam kiribû ku mamao xwedî hin kêmasiyan ji bû. Ta dihat bîrê ka mam çiqas bînteng bû dema pis-mamê wî Jean Galéas henek pê dikirin, û herwiha dihat bîrê ka çawa çîrîskên çavên mamê wî zewqa wî ya xweperestî peyitandibû dema kontê Parmayê soz dabû ku xwişka xwe bidiyê (hingê mam ji bo veşartina kêfîxweşîya xwe didanên xwe çîrîkandibûn û mîna berê lencîbû û girnijîbû ku Alexis qet jê hez nedikir) û dihat bîrê ka çawa Lucretia, ya ku bi fermî ji ji muzîka wî hez nedikir, bênírx dihesiband dema pê re dipeyivî.

Dêbavên Alexis bi nerasterêyî hin tevger û kirinên din jî yên mamê wî destnîşan dikirin ku haya Alexis qet jê tine bû lê wî dibihîst ku ew kirin dihatin lomekirin û nifirandin.

Lê hemû kêmasiyê Baldassare, ta lencîna wî ya bêteşe jî, dibe nemabûn. Dema mamzanibû ku êdî belkî pişî du salêñ din bikeve nav listeya miriyan, jixwe êdî dê henekên Jean Galéas, dostaniya kontê Parmayê û muzîka wî bi xwe çîma bala wî bikişandana û wî dê çîma li ser wan xem bixwarana. Di aşop û xeyalêñ Alexis de mamê wî hê keşxê lê ji berê jî nirxbilindir û bêkêmasitir bû. Mam jê re nirxbilind lê di heman demê de yê cîhanek din dixwiya. Anglo di bêhêvîtiya kurik de pirtikek xem û tirsê cî girtibû.

Hê ji zû de hesp hatibû xarandin û amadekirin loma êdî dema çûnê bû; Alexis siwarî hentûr û erebeyê bû lê dîsan peya bû û çû şîreta dawîn ji mamosteyê xwe bipirse. Gava wî dê bipirsiya, bi dijwarî rûyê wî sor bû:

– Rêzdar Legrand, kîjan baştir e, mamê min bizane yan nizane ku ez ji mirina wî haydar im?

– Nizane baştir e, Alexis!

– Pa heke wî basa hindê ji min re kir?

– Ew ê neke.

– Ma basa wê yekê ji min re nake? Alexis bi matmayî got çîmkî ew tenak vebijark û alternatîv bû ku wî pêşbîniya wê nekiribû: herdem ku di xeyalêñ xwe de diçû seredana mamê xwe, wî dibihîst ku mamê wî mîna qeşyan bi dilnermî basa mirina xwe dike.

– Lê herna heke dîsan jî bas kir?

– Jê re bibêjin ku ew şâş bûye.

– Pa heke bigirîm?

– Spêdeyê hûn jixwe zêde girîne, hûn ê li cem wî negirîn.

– Ez ê negirîm? Alexis bi bêhêvîti qîrî, – lê hingê ew ê bifikire ku ev qewimîn min xemgîn nake, dê birame ku ez jê... ji mamê xwe yê ezîz hez nakim!

Ü dîsan rondik harin çavêñ Alexis. Diya wî êdî hew karî lê bipê loma hat kurê xwe; çûn.

Piştî ku sersaqoyê xwe yê biçûk li bersîfîkê da dest berdest, ê ku taxima cilêñ wî yên xizmetkariyê li gor arma û nîşana Silvanyayê kesk û spî bû, Alexis bi diya xwe re bîskekê rawestî û li dengê kemanê, yê ku ji odaya cîran dihat, guhdarf kir. Paşî serkêşîya wan ber bi odayek pirr mezin a dîwarcam û gilover ku cîgirê kont ango

vîskont pirri caran tê ve bû. Dema bikevî wê odayê, dê li pêşberî xwe deryayê bibî-nî, û heke li ser milê xwe bizivirî, dê mîrg, çimen û daristan li ber te bin; li kunci-kên odayê du pisik, sorgul, xasxaş û gelek alavên muzîkê hebûn. Ew bîskekê sekî-nîn.

Alexis bizirî cem diya xwe, wê fikir kir ku wî dixwest wê bihemêzîne lê kurik bi dengnizmî, dev bi guhê dayikê ve got:

- Mamo çend salî ye?
- Ew ê pûşperê bibe sîuşşeş.

Li ber devê Alexis bû ku bipirse: "Ma tu bawer dikî ku ew qet bikare xwe bigihî-ne sîuşşessaliyê?" lê newêri.

Derî vebû, Alexis velerizi, xuzmetkar got:

- Rêzdar cîgirê kont dê anîha bê.

Piştî kurtebîskekê xizmetkar vegevî û du firindeyên tawis û berxikek, ên ku cîgirê kont bi xwe re dibirin herderê, anîn. Pasî dengê pêngavan hat û derî dîsan vebû.

"Tişt nabe", Alexis, ê ku dilê wî herdem bi bihîstina dengan pît lê dida, ji xwe re fikirî, "bawer dikim ew xizmetkarek e... erê, xizmetkar." Lê di heman demê de dengek nerm hat guhê wî.

- Rojbaş, Alexisko, û rojbûna te pîroz be.

Ü gava wî mamê xwe dihemêzand, tirs bi ser de çû. Dixwiye ku mamê wî jî hay jê bû loma, bêyî ku başa xwe bide ser kurik, ew bi tenê hişt daku kurik tîrsa xwe vebirevîne, li diya wî zivirî û bi kêfxweşî ew, jinbiraya xwe, ya ku wî piştî mirina diya di dinyayê de ji her kesî zêdetir ji wê hez dikir, axaft.

Alexis hedînîbû û li hember mamê xwe, yê ku xorremerek cazîbedar bû û hê he-ma qet spîçolkîtî jê nedixwiya, yê ku mîrxasî û gernasiya wî ew qas di ser sînoran re bû ku di demên trajîk ên jiyana xwe de jî xwe bextiyar dida xwiyandin, hest bi dilnermiyek bêtixûb dikir. Alexis dixwest xwe biavêje stoyê marmê xwe lê tîrsî ku wî bibetilîne û wî qels bike. Awîrên mamê wî yên xemgîn û narîn hema dikirin ku Alexis bigirînin. Alexis dizanî ku çavên mamo herdem xemgîn bûn û di bîskîn bextiyariyê de jî wisan dixwiya ku ew xemrevînê ji bo kul û kovanîn xwe yên nenas hêvî dîkin.

Lê di wî kîlîkê de Alexis diramî ku xemgîniya apo bi egidî qewirandî revîbû çav-an ên ku di ber gep û alekêñ wî yên lawazbûyî û qurmiçî re di bûneweriya wî de tenak endamên bêhîle û rastnîşander bûn.

– Dizanim, Alexiskoyê delal, ku tu dixwazî bi hentûrek cothespî biajoyî, Baldas-sare got, – sibê hespek dê ji te re bê anîn. Salek din ez ê bi dana hespek din wan bi-

kim cot û piştî salek din ji wê ez ê hentûr û erebeyê jî bidim te. Belkî tu dikarî û sal wî hespî biceribînî û lê siwar bibî; piştî ku vebigerim, em ê bi hev re biceribînin. Çimkî sibê ez ê bi rastî ji biçim, Baldassare lê zêde kir, – lê ne bo demek dirêj. Piştî kêmterî mehekê ez ê vebigerim û em ê bi hev re biçin pêşaniya nîvroyî ya kenawerî û komedyekê ku min soz daye te jî bi xwe re bibimê.

Alexis dizanî ku mamê wî dê çend hefte li cem dostek xwe biborandina, wî herwiha dizanî ku mamo hê jî dikarî biçe tiyatroyê; lê ramana mirinê wisan kurik xo-fandibû û ew hê jî di nav kîlbeltanên xwe re şidandibû ku gotinên mamê wî ew ji bingeh ve dihêbitand û matmayî dihişt.

"Ez ê pê re neçim", ew ramî. "Ax, mamo dê çiqas biêse dema qerf û henekên lis-tikvanan û ken û coşa cemawer û temaşevanan bibihîzel!"

– Ew çi awaza kemanê ya bedew bû me bihîst dema em hatin hindir? diya Alexis pîrsî.

– Ay! Ma ew li ber we bedew bû? rûyê Baldassare geş bû. – Ew romans bû ku min basa wê ji we re kiribû.

"Ma ew bi xwe pêşkêş dike?" Alexis fikirî. "Çawa serketina muzîka wî dikare di vê rewşê de jî wî kîfîxweş bike?"

Tam di wê bîskê de rûyê cîgirê kont veqlipî janek dijwar, gepêñ wî zerikîn, de-vê wî beş bû, eniya wî qurmîçi û rondik ji çavan herikîn.

"Wey Xwedêyo!" Alexis di dilê xwe de qîrî, "êdî ew hew dikare xwe kîfîxweş bide xwiyandin... Weyla mamo rebeno! Lê çîma ew ewqas ditirse û naxwaze ku em bi rewşa wî biêşin? Çîma ew bela xwe ji xwe venake?"

Lê amaje û girovêñ têrjan ên felcbûnê, yên ku carinan wisan dikirin mîna ku Baldassare di nav asinan de bê mericandin û şopêñ xwe li bedena wî dihiştin û rûyê wî diguherand xerabewêneyek di nav kul û kovanên bijan de, êdî vê carê nerimî-bûn.

Piştî ku Baldassare çavêñ xwe ji rondikan paqîj kirin, bi kîfîxweşî dîsan dest bi suhbetê kir.

– Wer dixwiyc ku dukê Parmayê êdî ji te re ne xweşdost e, ma ne? diya Alexis bi bêahengî pîrsî.

– Dukê Parmayê! Baldassare bi hêrs qîrî. – Dukê Parmayê ne xweşheval! Ev hûn ci dibêjin, xwişka delal? A vê spêdeyê wî ji min re peyamek şand û kela xwe ya Illy-riyê ji min re pêşnûma kir ku belkî hewayê çiyayî kêrî tenduristiya min bê.

Ew bi lezokî rabû ser xwe lê jana xwe ya dijwar jî bi xwe re şiyar kir loma bêçare ma ku bîskekê rabiweste; hê janê baş bernedabû, wî bang kir jî:

– Wê nameya li rex doşeka min bînin.

Û bi lez xwend:

Hevalê min i ezîz Baldassare,

Çi qas ne xweş e ku ez nikarim bêm we bibînim û hwd.

Bi vê dostaniya mîr rûyê wî geş bû. Lê serdanser, belkî ji bo ku kîfbweşîya xwe, ya ku wî nirxek berz nedidayê, vebişêre, wî didanên xwe çîrrikandin û bi xweşikî lê bi bêteşe bişîrf û anî bîra Alexis ku herdem fikiriye ku heman nîşane ji rûyê nearam ê mirinê deng vedidin.

Heman devxwariya Baldassare ya ji Alexis re nas çavên kurik vekirin, nexwe ew li hizûra mamê xwe fikiribû û hez kiribû li wan rûyan binere ku li ber mirinê ne, yên bi herherî ji rastiya rojane veqetîne ku herî zêde bişirokek bi gernasî neçarkirî, bişirokek dilnerm i xemgîn, a esmanî û bêzarbûyî belkî bikare bicîrise. Niha wî guman nedikir ku Jean Galéas mîna berê karîbû mamo biqehîfne, û dizanî ku di veşariyek di kîfbweşî û di çûna tiyatroyê ya mamê nesax de tine bû, û ku Baldassare keti ber mirinê jî dîsan her li ser jiyanê diramî.

Bi rîya ber bi malê ve ket ramana Alexis ku ew ê jî carekê bimire, û tevî ku hê gelek salêñ wî yên mamo zêdetir li ber wî bûn, dê dotmama Baldassare, kontesa Alériouvreyê, û herwiha baxçevanê wî yê pîr jî ji wî bi xwe zêde dirêj nejin. Rocco-yê baxçevan têra xwe zengîn bû ku bikare xwe vebikişîne bînvedana pîriyê lê dîsan jî tê dikosî daku hê jî zêdetir pare bicivíne û tê dikosî xelatek şerefî ji bo sorgulên xwe werbigire. Tevî heftesaliya xwe jî kontesê pirça xwe teng dida û nivîsar, ên ku tê de pesna bûneweriya wê ya ciwanşîb, pêşwazîyên wê yên xweşik, servîsên wê yên kubar dihat dan, bi pare di rojname û kovaran de didan weşandin.

Van mînakan qet matmana ji ber teyger û rabûn-rûniştina mamo kêm nedikir; berevajî: hê pêlîn hêbetiyê di kurik de dizeximandin ku hêdî hêdî ev matman bû hêbetî û kurik bi wan qonaxan, ên ku jiyanê, a wî bi xwe jî pê re, bi paşpaşkî ber bi mirinê ve dibirin, behecand.

Wî bi xurtî bîryar da ku ew ê di jiyana xwe de nede pey leyланoka derewîn û rûxîner nebe û mîna peyamberîn berê yên bişeref xwe bi çend hevalên xwe yên lîstikan re vebikişîne çolistanekê.

Lê baş bû ku jiyan ji henekkirina bi débavan bihêztir bû û wek bervêdan û itirazekê sînga xwe, ya ku wî hê hemû şîrê çêşirîn û zeximînende jê venecîkandibû û kaniya wî hişk nekiribû, pêşkêşî kurik kir. Û kurik dest bi vexwarina bi coş û bi

kêfbweşî kir û aşop û xeyalên wî yên dewlemend û jêbawer bi çavşînî guhdarî nalî-nêñ wî man û dilsariyêñ wî pîne kirin.

II

Goşt bikovan e, mixabin...

Stéphane Mallarmé

Roja piştî seredana Alexis, cîgirê kont çû kela cîran ku dixwest çend hefteyekan tê ve biborîne bi wê hêviyê ku amadeyiya hejmarek mezin a mîvanan li wir dê bikariya xemêñ wî, yên ku pîrî caran piştî êşgirtinêñ wî ew digirt, vebirevîne.

Piştî kurtedemek li kelê, wî hay jê bû ku hemû zewqên wî bala xwe daye ser jî-nek ciwan. Baldassare hest pê dikir ku jinik jê hez dike lê wî hinekî bi guman û demîngirtî nêzîkî li vê baweriya xwe dikir: wî dizanî ku jinik bêşert yeke pak e û bi bînfireyî li benda mîrê xwe ye; herwiha wî di hezkirina xwe de jî ti piştrastiyek xurt tine bû û bawer dikir ku handana jînê ber bi rîya xerab ve guneyek pîrî mezin e. Lî kengî pêwendîya wî û jinikê rûyê xwe guherand, wî nedikarî bîne bîra xwe. Ni-ha wî wek nîşaneyâ ahenga bêpêjn, û ya hema bêdem jî dixwiya, zendên wê ramûsan û destê xwe li gerdena wê dialand. Jinik wisân bextiyar dixwiya ku mîrik hê dûrtir çû: pêşî rûyê wê maçand, dû re demek dirêj ew mist da û mizişand, û dîsan çavêñ wê, gepêñ wê, lêvîn wê, kenda gerdena wê, serê poza wê... ramûsandin. Devê jinika ciwan di dema mistdanan de dibîşirî, û awirêñ wê mîna ava rojê geriman-dî diteyisîn. Mistdanêñ Baldassare bistetir û cesûrtir bûbûn; carekê wî li jinikê nerî; ecêbgirtî ma ji ber spîçolkîtiya wê, bêhêvîtiya wê ya bêdawî, ya ku bi saya eniya wê ya mirriçok û çavêñ wê yên girîbat, dilşewitîn û westî, yên ku awirêñ wan xemgintir bûn ji rondikêñ ên îşkencedayiyêñ li ber çarmixandinê yan jî ji yên evîndarêñ xwe bi ebedî jîdestdayî. Baldassare bîskekê çavêñ xwe li jinikê gerandin; jinikê jî bi têkoşînek bêwêne çavêñ xwe yên dilovanîxwaz rakirin rastî wî û devê wê yê bicoş di riqaço û krampêñ xwe yên bêhaybûnî doza hê maç û ramûsanan dikir.

Bi zewqa di biheştbîna ramûsanan û bîranîna mistdana de coşbûyî wan herduyan xwe di hev rapêçandibû û çavêñ xwe miçandibûn, çavêñ stemkar, ên ku neynik û awêneya tengasiya giyanêñ wan bû; wan nedixwest wê tengasiyê bibînin, û nemaze Baldassare çavêñ xwe bi tundî miçandin mîna celadê wijdan lê beña ku di-zane destê wî dê birecîfe heke li rûyê yê gorî û qurban binere û bikeve derd û kulan

li şûna ku xeyal bike ku yê gorî ew kişkişandiye û neçar kiriye ku celad xwe biparêze.

Bûbû şev, û jinik hê jî di odeya mêtîk ve bû û bi çavên bêrondik fedikir pêşıya xwe. Wê bi coşek xemgîn destê wî ramûsand û, bêyi ku tiştekî bibêje, derket.

Edî xewa mêtîk nehat, ji xwe ve diçû û direcîfî dema dihat bîrê ka çawa çavên qurbana şîrîn û nazenîn bi nik wî ve hildiketin û bêhêvî bûn. Di heman demê de ket xeyalên wî ku niha jinik şiyar bû û hest bi tenêtî û bêkesiyê dikir. Wî cil li xwe kirin, bi bêpêjnî meşî ber deriyê odaya jinikê û li xwe seqbêr bû deng jê neyê daku, heke jinik raketî be, wê şiyar neke lê herwiha newêriya vebigere odaya xwe bi xwe jî ya ku tê ve erd û esman lê teng dibûn û bîna wî diçikand. Ew li wir li ber deriyê odaya jinikê rawestî û fikirî ku dê edî bîskekê jî nikare xwe rabigire û divê bikeve hindir; lê paşî pirr tîrsî ku hema wijdana wî dê çawa qebûl bike ku jinikê ji wê xewa şîrîn şiyar bike û wê bikişîne nav kûl û kovanan ên ku jinik niha jê azad raketîye. Li ber derî ma, geh li ser çokan, geh rûniştî û carinan jî paldayı. Bi berbanga spêdeyê re, sarmayê girtî û hedinî vegerî odaya xwe, têr nivist û bi dilek xweş şiyar bû.

Wan her tişt kir daku wijdana xwe bihedinînin, ew hewisîn kêm'bûna ezaba wijdanî û lawazîna zewqê, û piştî ku cîgirê kont vegerî Silvanyayê, ji herdulan re ji bîskîn bicoş î bistem tenê bîranînen şîrîn û sarbûyî man.

III

Xortaniya wî diqîrî û wî nedibihîst

Madame de Sévigné

Dema Alexis di rojbûna çardehsaliya xwe de çû seredana mamê xwe, wî, bi qasî xe-yalkirî, mîna sala berî wê bi hêz hest bi bandorîlêbûn û kartêkeriyê nekir. Siwariya berdewam bi hespîn mamê wî daniyê bi pêşdebeirin û xurtkirina hêz û şıyanen wî dilnazikiya wî vemirandibû û hesta saxlemiyê, ya ku ji ber kereseyên nehînî û kêfx-weşiyên bihêz ên xortaniyê pêgirî wê ye, di wî de ava kiribû. Dema wî hest pê dikir ku bi çargaviya hesp re sînga wî mîna bawan û babirekan diperçivî, dema zend û destên wî mîna agirê argûnên zivistanan digurmijîn, dema eniya wî hêz dibû di nav çilûyê di ber re difirî ku meşa wî dixemiland, dema dihat malê û xwe berdida nav ava cemidî yan jî dema ew av dişepand û bi nermî serborî û serpêhatiyên xwe

dianîn bîra xwe; hemû vê yekê şahiyên hêzên jiyanê di wî de dibişkivandin. Ev hêz, ên ku carekê ji Baldassare serbilindiyek bicoş bûn, ew bi herherî bi cî hiştibû û ra-guhezibûn daku dilên xorttir, ên ku ew ê jî carekê neçar bibin dev jê berbidin, ges bike.

Alexis dê êdî ji ber lawaziya mamê xwe zivêr nebûya, û ji ber dawîlêhatina jiyanâ wî nemiriya. Tevgerên dîşadiyê yên xwîna wî di demarêni wî de û dîlxwaziya wî ya li hember jiyanê nedîhişt ku ew nalînên ê nesax bibihîze. Alexis gihabû wî jiyyî ku bedena mirov lê seray û eywanêni xwe di navbera xwe û giyanê wisan asê ava dike ku hema giyan rasterê wendabûyî û nemayî dixwiye ta ku rojekê nesaxî yan xemgî-nî kunikekê dikirrîne û giyan tê re serê xwe dertîne. Alexis nasyarî nesaxiya mirinê ya mamê xwe bûbû mîna ku mirov çawa hewisi her tiştî dibe ku li derdorêni me di-dome, û tevî ku mam hê dijiya jî, rewşa wî carekê kurik gîriyandibû mîna ku çawa yên dimirin me digirînin loma, bi hesibandina mamê xwe wek kesek mirî, Alexis êdî rewşa wî ji bîr kiribû.

Dema mamê wî wê rojê jê re got: – Alexisê delal, ez ê hentûran jî bi hespê du-yem re bidim te, ew tê giha ku mam difikirî: "çimkî wek din ez ê negîhim hentûran bidim te", û wî dizanî ku ev raman di serê mam de bêşînor kovandar bû. Lê kurik hest bi vê yekê nekir çimkî di wî de êdî cî ji xemgîniya kûr re tine bû.

Çend rojan derengtir pîrtûkekê ew matmayî hişt ku basa keleşekî dikir ku dilna-zikiya lêzimek wî yê li ber mirinê dilê wî pê nedîşewitand.

Evarê xewa wî nehat dema diramî ku ew bi xwe jî dişibe wî keleşî. Lê roja piştî wê wî rîwîtiyek biserketî ya siwariyê kir, wisan baş xebitî, hest bi dilnermiyek wi-san mezin li hember xizmîn xwe kir ku bi bêxemî xewq kir û bi bêserêşî raket xe-wê.

Birêveçûn ji cîgirê kontê Sîlvaniyê re êdî ewqas dijwar bû ku hema êdî qet ji ke-la xwe dernediket. Xizm û dostêni wî teviya rojê pê re diborand, û dikarîbû bê ditin ku tevgerên herî şêtane û pûçkirinên bêwêne yên malîyetê wî dikirin, iddiyayêni dûrî aqil pêşkêş dikirin û xwe di xerabîkariyên sostret didanî bêyi ku xizmîn wî lomeyan lê bikin an jî dostêni wî henekan pê bikin an jî li dij wî derbikevin. Wer dixwiya ku bi bêpêjnî barê berpirsiya gotin û kirinên wî ji ser milî hatibû rakirin. Nemaze diyar bû ku dihat xwestin ku bi nerimandina bi dilnermî û daçemandina bi mistdanan neyê hiştin ku ew dengê bedena xwe, ya ku ji bingeh ve hildihejî dema jiyanê hêdîka dev jê berdida, bibihîze.

Wî bûskên dirêj û xweşik li ser doşeka xwe bi xwe re diborandin; wî ticaran di ji-yana xwe de xwe bi xwe venexwendibû şîvê. Wî hest bi kêfîxweşiyek têrxem dikir

dema cil li bedena xwe ya biş dikirin û pala xwe dida milbenda paceyê û radestî nerîna li deryayê dibû. Wî ev cîhan bi wêneyan, ên ku hê jî di wî de dijiyan lê ji ber navber û beredayîtiyê xwedî bedewiyek bêkîfş bûn, rapêçand bûyera mirina xwe ya ku hê ji mêt de di serê xwe de nijinandibû lê ew hunereser hê jî bi xemgîniyek bicoş ava dikir. Di aşop û xeyalên wî de xatixwestina ji duçes Olivianeyê, dosta wî ya platonîk, a ku hukumrana saloneyê bû tevî ku heke hemû mîrên payebilind ên esilzade, hunermend û ronakbîrên herî navdar ên Ewropayê lê bicivîna jî, teşe digirtin. Wî di serê xwe de suhbeta xwe û wê ya dawîn dixwend:

”... Roj ava bûbû, û deryaya di nav darsêvan re dibiriqî şîn bû. Ewrikên şîn û sor sivik mîna destegulên rewşen ên hişkbûyî nerm û mîna neqşen li ser kîlên goran herdem-şen li qeraxa esman hildifirin. Koma spîndaran di tarîgewrikê de biskên xwe berdabûn ser komsorgulên dêrê; tîrojên dawîn çeqên wan direngandin, bêyî ku dest biavêjin qurmên wan, û wişiyên ronahiyê bi caxên wan ên bersîber ve didaliqandin. Ji bakok biheştîna deryayê, ya pel û belgên terr û şîl û ya şîr hildifûri. Ticaran dîmen û xwiyanga Silvanyayê wiha bi têrzewqî êvara tijîxem nexemilandibû.”

– Min ji we hez kiriye lê mixabin kêm daye we, dostê reben, di xeyalên wî de duçesê jê re digot.

– Hûn ci dibêjin, Oliviane? Çawa we kêm daye min? We herdem ji daxwaza min zêdetir daye min û bi rastî gelekî jî zêdetir ji hindê ku heke sehekân di evîna me de par hebûya. Wek hûn kesek serxwezayî bin mîna madonnayê û ruhsivik bin wek şîrdiya min, ez heyranî we bûm û we jî ez dilorandim. Evîna min pevgirêdanek bû ku ti xwestekê bedenî nedikarî tûjbîniya wê ya hismend nerehet bike. Û ma we wek hemberxelat ne dostaniyek bêwêne, çayek bêpayan biçêj, suhbetên na-veroktijî û çendîn destikên sorgulan dan min? Tenê we dizanî çawa bi destên dayikane û axivger eniya min a tagermî hêñ bikin, hingiv berbidin nav lêvên min ên peritî, mînakêñ cewer bidin jiyana min. Dosta ezîz, ka ez destê we rabimûsim...

Tenê Piaya xemsar, dotmîrek hûrik a syrakusî, ya ku Baldassare hê jî bi hemû hest û bînahîyan jê hez dikir lê ya ku bala hemû evîndariya xwe ya bicoş dida Castruccio, carinan ew jiyana stemkar, a ku Baldassare dixwest ji bîr bike, dianî bîrê. Ta rojên dawîn jî wî besdarî li şahî û roşanan dikir û dema bi vê dotmîrek re di ber pozberê xwe re diborî dixwest ku wî biqehirîne û şehmezar bike lê dema bi keçikê re dimeşî jî, hay jê dibû ku çavêñ wê yên kûr li evîndariyek din digerîn lê wê, tenê ji ber ku li ber ê nesax diket, dixwest vê yekê vebişêre. Lê êdî Baldassare nedikarî biçe şahiyan jî. Lingên wî ew qas goc bûbûn ku wî nedikarî biçe derve jî. Lê dot-

mîr gelek caran dihat seredana wî û, tam mîna ku ew jî bi yên din re ketibe nav komployekê, ew bênavbirr bi nermî û nazenînî dipeyivî û ticaran wek berê ev ner-miya xwe bi qîrînek xemsar û diyarkirina xeyidîna xwe nedîkand. Ü Baldassare pê dihesî ku wî ji vê dilnermiya wê ji seredana hemû kesên din zêdetir dilaramî dis-tand.

Lê rojekê, dema ew ji ser kursiyê rabû daku biçe ser sifreyê, xizmetkarek matma-yî dît ku ew pirr baştir dimeşe. Wî bangî nojdar kir. Roja din ew baş dihat û diçû. Pişti hefteyekê êdî destûr jê re hat dan ku biçe derve. Hingê di xizm û dostên wî de hêviyek bêsinor vejî. Nojdar texmîn kir ku nesaxiyek demarî ya dikare sax bibe eşâ felcê dabûyê ku niha bi rastî jî ev eş wenda dibû. Wî gumana xwe wek rastî pêşkêşî Baldassare kir û got:

– Hün hatine sitirandin û saxkirin!

Yê darizandî mirinê bi eftuya xwe gelekî kêfweş bû. Lê pişti demek diyarbûna saxyîê, xema rêveker dest pê kir kêfweşiyê ji pêsiya xwe vebide. Ji bahozên dinyayê parastî, di nav dilnermiya li derdorê, aramiya ji neçarı û ponijîna azad de mirinx-waziyê ew girtibû. Hê ti şik di serî de tine bûn lê hest bi tirsek nekîf dikir dema diramî ku divê ji serî de dest bi jiyana bike, neçar bitmîne ku xwe li ber darbeyên xerîb bigire û sereguhiya li derdorî xwe ji dest bide. Herwiha wî bi şêlikî hest pê kir ku neweş bû zewq û tevgerên xwe yên dema nesaxiyê ji bîr bike pişti ku xwe ango destebirayê sosret, ê ku wî pê re bi saetan hem ji dûr û ji nêz ve suhbet kiribû dema lê dinerî ku belem û keşîkan ava deryayê dişeqand, nasîbû. Tam mîna hest bike ku di wî de evînek nû, evînek hê nenas li hember jînwarê wî biwelide mîna di ke-sek hê ciwan de yê ku li welatê şaş bûbe û ji nû welatê xwe binase, wî jî bêriya miri-nê û penaberîya herherî, ya ku hest kiribû ku ber bi wê de bi rê ketibû jî, dikir.

Wî ramanek pêşkêş kir, û Jean Galéas, ku dizanî ew sax bûye, bi tundî li dij der-ker û henekên xwe pê kirin. Jinbiraya wî, ya ku her spêde û her êvar dihat seredana wî, ev du roj bûn nehatibû. Ev yek êdî ji hedê wî der bû! Wî hê ji mêj de nîrê jiyanê ji bîr kiribû û êdî nedixwest wî hilbigire ser milên xwe. Jiyanê bi çekên xwe yên xweşik xwe nedîavêt hemêza wî. Hêz û şîyanên wî dîsan lê vegeşbûn û bi wan re hemû xwestekên jiyanê jî: ew derdiket, dîsan dest bi jiyanê kir û carek din jî di xwe de mir. Mehek dû re eş û janêñ wî dîsan lê vegeşîn. Hêdî hêdî, mîna cara berê jî, dîsan livîn jê re dijwar û dû re jî negengaz hat daku ew dîsan ber bi mirinê de vebi-gere. Di vê nûbûna nesaxiyê de hema ew sûde jî tine bû ku ew ji jiyanê vebiqete, ne daku wê wek rastîn bibîne lê daku wek tabloyekê lê binere. Berevajî wê carê, ni-ha ew her xweperesttir û xeyidîtir dibû dema bêriya wan kêfweşîyan, ên ku êdî

nedikarî para xwe zewqê jê bistîne, dikir.

Tenê jinbirayê, ya ku wî bi dilnermî jê hez dikir, hin geşî dida dawiya jiyana wî dema bi Alexis re her roj çendin caran dihat seredana wî.

Danê êvarekê, dema jinbira dicû nik wî, bi rê ve hespên erebeya wê ziçikîn; ew bi tundî dafirî erdê, û siwarek bi çargavî di ber re borî jî pê lê kir, û serşkestî û bêhiş-bûyî ew hat gîhandin cem Baldassare.

Ajovanê wê yê neselixî ji bûyerê sitirî zû banga qezayê gîhand cîgirê kont ê ku çavên wî di cî de spî bûn. Didanên wî çîtrikîn, çavên wî biriqîn û perçivîn, û di qeh-rek erjeng de ew li ajovan arizî; lê wisan dixwiya mîna ku qehra wî hawara wî ya bijan diniximand lê vê hawarê di nav gurmijêن qehra wî de bi dengnizmî deng vedi-dan. Tam wisan dixwiya mîna ku kesek nesax li rex wî yê hêrsbûyî binale. Piştî kurtedemekê nalînek lawaz qîrînêن qehrê fetisandin, û cîgirê kont bi kinkinkî şe-wişî ser kursiyê.

Pâşî wî xwest rûyê xwe bide şûştin daku jinbiraya wî ji ber şopêن xemgîniya wî xeman nexwe. Xizmetkar bi xemgînî serê xwe hejand: qurbana qezayê nehatibû ser hişen xwe. Cîgirê kont du şev û du rojêن bêhêvî li ber doşeka jinbiraya xwe boran-din. Wê dikarî hema ci gava hebe jiyana xwe ji dest bide. Şeva duyem emeliyatki-rin hat ceribandin. Spêdeya roja sêyem êdî ta daketibû û ya nesax li Baldassare, yê ku nedikarî rondikêن xwe bigire û ji kêfan her digirî, dibişirî. Dema jiyana hêdîka hatibû mîvaniya wî, wî nedixwest bibîne lê niha bi xwe bûbû pêrewê mirinê. Bi gefa li hember kesa ji wî re herî hezkirî, mirinê mîrik erjengandibû; wî jî ji mirinê lava kiribû û ew li daxwaza xwe tewandibû.

Wî xwe aza, bihêz û serbilind hîs dikir dema hest pê dikir ku jiyana wî bi xwe ne bi qasî ya jinbiraya wî ji wî re bihagiran bû û ku çava li ber jiyana wê diket ewqas ji jiyana xwe bênírx didît. Wî niha fedikir rûyê mirinê û li şanoya dorberî mirina xwe nedinerî. Wî dixwest heta dawiyê wisan be û êdî radestî derewê nebe ya ku ji wî re bi lidarxistina berxwedanek bedew û navdar li hember mirinê bêşermî û rûreşiyê hilbide gupik û lütkeya wan û mîna ku çawa nehînêن jiyana wî jê şelandibûn, ne-hînêن jiyana wî jî biherimîne.

IV

Sibê, sibê û sibê,
Wiha roj bi roj dem dikûse

Ta kîteya dawîn a jiyanê
 Ü her rojekê bi xwe re qeşmer
 Birine gorên tarî. Vebimirîne, vebimirîne şemalê!
 Jiyan tenê siberek gerok e, lîstikvanek reben e
 Ku dema xwe li ser sehneyê ye
 Lê paşî kesê hay jê namîne: Jiyan çîrokek e
 Tirredînekî vegotkiye, tijî deng û pêjn e
 Lê bêwate ye.

Shakespeare, Macbeth

Hest û westîna ji ber nesaxiya jinbirayê nexweşîya Baldassare bi xwe jî lezandibû. Ew anîha ji cem qeşê vegeşibû ku ji bo xerifandina guneyên xwe çûbû cem ûbihîstibû ku êdî tenê bi qasî mehekê dema jiyana wî mabû; demjimîr dehî spêdeyê bû, û şirrik baran dibarî. Hin erebe li ber derê kelê sekinîn. Ew duçes Oliviane bû. Baldassare diponijî ku bûyera mirina xwe bike awazek biaheng.

"... Bûyer dê li êvarek sayî biqewimiya. Roj dê biçûya ava, û deryaya di nav dar-sêvan re dibitiqî dê rengşîn bûya. Ewrikên şin û sor sivik mîna destegulên rewşen ên hişkbûyî nerm dê li qeraxa esman hilbisfirîna..."

Ü li dehî spêdeyê, li jêr esmanê beropizdanêن xwe nizmkirî û qirêj, di nav şirrik-baranê de duçes Oliviane hat serdena wî; û ji ber ku Baldassare bi nexweşîyê kerixîbû, xwe radestî nirxên berztir kiribû û êdî başa xwe nedida efsûniya tişt û kesen payablebilind, şirîniya ava jiyanê û şan û şoretê, wî tika kir ku ji duçesê re bê gotin ku nesaxiya wî ew pitî lawaz kiriye. Duçesê kir û nekir, cîgirê kont nexwest wê pêşwazî bike. Jixwe erk û vatiniyek wî jî tine bû: jinikê êdî nirxek xwe li nik wî nemabû. Mirinê bi nermî ew bend û girêk, ên ku berî çend hefteyan tirsa koletiya xwe xistibû dilê wî, piçandibûn. Baldassare dixwest li ser jinikê birame lê tiştek nedihat ber çavêñ giyana wî: çavêñ xeyal û bêweciyêñ wî miçibûn.

Bi qasî hefteyekê ji berî mirina wî jê re basa govend û şahiyen dotmîra Bohemiyê hat kirin û hat ragihandin ku di wan şahîyan de Pia dê bi Castruccioyê roja din ji wir biçe Danîmarkayê re serçemka govendê bi rê ve bibe, û vê yekê Baldassare pirr çavnebar kir û qehirand. Wî bang kir ku Pia bê cem wî. Jinbiraya wî li dij vê yekê derket lê wî fikir kir ku asteng li ber hevdîtina wî û Piayê têñ danîn û derder dixwazin ku bêsebeb wî hêrs bikin loma xeyidî. Daku ew zêde zivêr nebe, bangî Piayê hat kirin.

Dema Pia hat, mîrik tam aram lê keserkûr bû. Wî jinik kişand ber doşeka xwe û

serdanser basa şahiya dotmîra Bohemiyê jê re kir:

– Em ne xizmên hev in û hûn ê tazî û şîniyan bo min nedeynin lê dixwazim ji we lava bikim; soz bidin min ku hûn ê neçin wan şahîyan.

Wan fekir hev û di awirêن xwe de giyanêن xwe, giyanêن kovan lê bicoş, ên ku mirinê nikarîbû bigihîne hev, peyitandin.

Baldassare tê giha ku jinik di sozdana xwe de biguman bû, wî devê xwe xwar kir girnijek bijan û got:

– Na! Sozê nedin! Soza mîrê li ber sekeratê li erdê nedin. Heke hûn ne piştarst bin, sozê nedin.

– Nikarim sozê bidim we: ev du meh in ku min ew zelam nedîtiye û belkî êdî qet nebînim; ez ê hemû jiyana xwe poşman bim heke neçim wan şahîyan.

– Hûn rast dibêjin çîmkî hûn ji wî hez dîkin, çîmkî her hin mirov dê bimirin... û hûn ê bi hemû hêzdiariya xwe bijîn... Lê tiştekî ji bo dilê min bikin: bi qasî wan bîskan, ên ku we dê li vir şîna min bîkira, ji şahîye vebiqetînin û li derveyî şahîye bin. Bangî giyana min bikin bila bîskekê bi we re bikeve bîranînan, piçekî li ser min biramin.

– Bawer nakim bikarim wê sozê jî bidim, şahî pîrr kurt e. Tevî ku li kîleka wî mîrî bim jî, bi zor bigihim lê binerim. Ez ê ji her rojek din bîskekê bidim we.

– Hûn nikarin, hûn ê min ji bîr bikin; lê heke pişti salek din, mixabin! Heke pişti demek dirêtir, pirtûkek xemgîn, bûyerék mirinê, êvarek nixte û baranî we li ser min bide fikirandin, ax ê ji min re çi dilovaniyek be! Ez ê êdî ticaran, ticaran we nebînim... ji bilî di giyana xwe de loma divê em di heman demê de hevdu bi bîr bînin. Hûn ê herdem li bîra min bin daku giyana min vekirî be dema hûn bîxwazin bikevinê. Lê jina vexwendî mirov pîrr dide rawestandin û pandin! Baranên sermawezê dê kulîlkên gora min rizandibin jî, pûşperê dê ew sotandibin jî lê hê jî giyana min dê ji ber bêsebriya xwe bigirî. Ax çiqas hêvî dikim ku hê carekê bîranînêkê, salveger û roşanekê yan herikek ramanêن we hûn bianîna raserî dilnermiya min; hingê min ê hûn bibihîstina, hûn ê bidîtana, herder dê ji bo pêşwazîkirina we bi efsûni bîbîkîviya û kulîlk bidana. Li yê miñ biramin. Lê ax! Ma dikarim hêvî bikim ku mirin û bîskek we ya jidil tiştek wisan bi dest bixin ku jiyanê, dildariyêن wê û rondikêن me û kîfa me û lêvîn me nikarîne bi cî bînin.

Nîha şkest dilê cewer... Şevbaş,
 Kurmîrê çeleng! Komên firşteyan
 Bila te bistrînin axa aram!

Shakespeare, Hamlet

Tayêñ dijwar bela xwe ji cîgirê kont venedikir; doşeka wî hatibû raguhezandin odayek gilover û mezin ku Alexis di rojbûna sêzdehsaliya xwe de jî ew pîrr kîfîxwêş tê ve dîtibû, û ku tê ve yê nesax dikarî di heman demê li deryayê, pêlşkîna strînge-hê û ji hêla din ve jî li mîrg û daristanokan binere. Carinan ew dipeyivî jî lê di gotinêñ wî de êdî şopek jî ji ramanê berz, ên ku hefteya berî wê ew cewerandibû, ti-ne bû. Wî bi dijwarî kesek nedihat dîtin dinifirand çimkî qaşo wî kesî henekêñ xwe bi yê nesax dikirin; wî her xwe wek baştırin muzîkjenê sedsalê û jêhatîtîrin esilzadeyê cîhanê radigihand. Paşî geh ew dihedinî û ji ajovanê xwe tika dikir ku bibe meyxaneyekê yan jî hespan ji bo neçîre kurtan bike. Wî kaxezêñ nameyê xwestin daku hemû sertacêñ Ewropayê ji bo bûy û dîlana xwe ya bi xwişka dukê Parmayê re vebixwîne; dema ji ber deynê xwe yê nedayî yê qumarê ji tırsan dilerizî, kîrek kaxezkî ji ser maseya xwe ya şevî radigirt destê xwe û, mîna ku demance be di destan de, tev digerî. Wî xizmetkar şandin daku peyamê jê re bînin ka qaşo polî-sê wî şeva berî hingê pelixandî miribû yan na, wî stranê xeberreş û çêrî bi kenki bo jinekê, ya ku qaşo destê wê di destê wî de bû, digotin. Fîrişteyêñ kuştinê, yêñ ku wek Şîyan û Viyan têñ nasîn, ne amade bûn ku cinêñ wî yêñ xerab û xwiyabû-nêñ bênirox ên bîranînêñ wî biqewirînîn û bipengizînîn. Pişti sê rojan, li derdorî demjîmîr pêncî şevê ew, mîna ku ji xewek xerab, a ku mirov jê ne berpirs e lê bi şêlî û nezelalî bi bir tîne, be, şiyar bû. Ew pîrsî ka xizm û lêzim li hızûrê bûn dema wî bênixtîrîn, necistîrîn, genîtîrîn û fistewîtîrîn para di xwe de derbiribû, û ji ber dîsanhatina teb û cinêñ xwe, wî tika kir ku xizm û lêzim dîsan bêñ ji wir detxistin ta ew dîsan bê ser hişen xwe.

Wî çavêñ xwe li derdorêñ xwe yêñ odayê gerandin û bi rûkenî li pisîka xwe ya teş, a ku li ser guldanka çînî bi gula krîsantem dilîzî, nerî. Wî fermand ku hemû mîvan û yêñ hatî seredanê derbikevin û demek dirêj bi qeşeyê li ber doşeka wî çav-dêr re suhbet kir. Lê dîsan jî xwexefirandin red kir û bangî bijîşk kir ji qeşê re bibê-je ku zikê wî êdî nikare xwe li ber nanê xwexefirandinê bigire. Pişti bîskekê wî fer-

mand ku jinbiraya wî û Jean Galéas bêñ hindir. Wî got:

– Min xwe radestî mirinê kiriye, bextiyar im ku niha bimirim û bikarim bi bal Yezdan ve biçim.

Hewa wisan nerm bû ku hat karîn pencereyên bi çavkorî li deryayê dinerîn bêñ vekirin û pencereyên hêla din, ên ku mîrg û darîstan li ber belav dibûn, ji ber bayê pihêt û tund girtî hatin hiştin.

Baldassare nivîna xwe da raguhezandin ber pencereyên vekirî. Keştiyek, a ku der-yavanian ji pêşkînê bi werîsan dikişand firetiya deryayê, bi rî diket. Kurikek keştiyê yê keşxe yê dorî panzdehsalî di ser hêlek keştiyê re xwe dadiçemand; wer dixwiya ku ew ê li ber her pêlê bikeve avê lê ew bi çelengî li ser lingên xwe yên xurt radîwestî. Wî bi torrê masî vedikişandin, û di nav lêvén wî yên ba sûrkirî de qelûnek dûkêldar şorr dibû. Ü bayê bawan û babirek diperçivandin lezî gep û alekêñ Baldassare hêñ bike û pîrikek kaxezê di odayê ve bi xwe re rafirand. Baldassare serê xwe zivirand daku êdî hew wê dîmena bextiyar ji zewqan bibîne ku wî bi şeydayî jê hez dikir lê êdî nedibû tam bikiyê. Wî berê xwe da strîngehê: keştiyek bibawan a sêdirekî xwe ji bo çûnê amade dikir.

– Ew keşti dê biçe Hindistanê, Jean Galéas got.

Baldassare kesen li pêhnik û guverteyê, yên ku destmalên xwe dihejandin, baş nedisehirandin lê texmîn kir ku bêrîkirina xerîbiyê çavêñ wan şêlandibûn; wan hê pîrr derfet ji bo jînê, hevnaşînê û pêhesînê hebû. Singê keştiyê hat hilkişandin, qîrînek hilket, û keştiyê berê xwe da rojavayê ya ku lê ronahiyê belem û ewr têkilî mijâ wê ya zêrîn dikirin û sozên bêwêne û nedîyar dipistandin guhêñ rêvingan.

Baldassare tika kir ku pencereyên aliyê deryayê bêñ girtin û yên aliyê mîrg û da-ristanokan bêñ vekirin. Wî berê xwe dida zeviyan lê hê ji qîrîna xatinwaziyê ya ji keştiya sêdirekî di guhêñ wî de dişingî û didît ku kurikê keştiyê, qelûn di nav didanan re, torr vedikişandin.

